Arşîva Bîra Kurdan: Ji Christiane More "Kurdistan: Pirsgirêkeke bêhempa" û ji François Georgeon "Lêgerîna dîplomasîyeke herêmî" (1987) ▶ R. 12

LE MONDE diplomatique kurdî

Tebax 2011 - Hejmar 21 www.lemonde-kurdi.com • info@lemonde-kurdi.com 24 Rûpel

Alain Gresh
Li Sûrîyeyê gel doza hilweşîna rejîmê an reforman dike? Kîjan hêz pêşengîya xwepêşandanan dike? Guleyên rejîmê teqandî tirsa gel kuşt? Gel çima dibêje 'an azadî an goristan?'
▶ R. 5

A. Popelard - P. Vannier
Marakeş: Li alîyekî kerwanserayên kêfûxweşîyê û li alîyê din kevîtaxên kavil û şerpezekirî yên bajarekî 'esrarengîz û bi sir'. Du rûyên Marakeş a ku xewnên ewropîyan dixemiland...
▶ R. 8

Olivier Cyran
Keskên Alman ên pragmatîk ku li tevahîya welêt serkeftinan bi dest dixin û şûr simbêlên wan nabire, ji coş û heyecanê bêpar, li hember pirsgirêkên civakî jî sersar û xemsar in…
▶ R. 16

Laurent Bonelli
Hêzên rojavayî piştî 11ê îlonê li dijî terorîzmê dest bi şerekî stratejîk kirin. Gelo di navbera tevnên El-Qaîde û têkoşînên çekdarî yên serxwebûnxwaz de çi tiştê hevpar heye?
▶ R. 18

R.W. McChesney - J. Nichols
Li Amerîkayê bi herifîna rojnamegerîya serbixwe û rexnegir, hêza siyasî ya pereyan her ku diçe xurttir dibe. Skandala şirketa Murdoch gelek têkilîyên gemarî raxist ber çavan…
▶ R. 20

"Bihara ereban" û Sûrîye

Dr. Kemal Sîdo *

Bûyerên pêşnedîtî yên ku halê hazir cîhana ereb dihejînin û kirin ku rejîmên li Tûnis û Misirê hilweşin û bi îhtîmaleke mezin wê bibin dawîya rejîma eşîra Qedafî li Lîbyayê jî, dikin ku raya giştî a cîhanê berê xwe bide dewletên din ên ereb.

Êdî pêla protestoyan gihîşte Sûrîyeyê jî

Ka gelo pêla protestoyan û raperîn wê bibin sedema hilweşîna rejîmê, niha nediyar e. Di derbarê vê mijarê de fikrên bisporan hev nagirin. Alîyek guhertineke mîna ya li Tûnis û Misirê mumkin û realîst dibîne, alîyê din hişyar dike ku tirsa gelê Sûrîyeyê ji destê zorê yê rêxistinên îstîxbaratê, pir zêde ye. Bi her halî, desthilatdarên li Sûrîyeyê her hişyar û di alarmê de ne û li her deverê bi awayekî hişk û xedar dest wer didin. Ji destpêka xwêpêşandanan ango ji nîvê adara 2011ê ve di protestoyan de ku para bêtir aştîyane ne, 1.500 xwepêşandêr hatin kuştin û qederê 10.000 xwepêşandêr jî birîndar bûn. Bêhtirî 10.000 kesên muxalif hatin girtin û qederê 11.000 welatîyên Sûrîyeyê ye yên din jî qismî di bin gulebaranê de ji sînoran derbas bûn û reviyan Tirkiyê yan jî Libnanê.

Hebûna eskerî ya hêza desthilatdar a dewletê ya xurtkirî, li bajaran hewaya tirsê yê ku jixwe her hebû, kûrtir dike. Di derbarê vê pirsê de ka gelo desthilatdarên Sûrîyeyê wê di xwêpêşandanên di warê hejmarê de mezintir yên li Şam û Helebê bi rengekî çawa tevbigerin, mînakên ji rabihurîyê fikrekê bi mirov re çêdikin, ev mînak nîşan didin ka desthilatdar çawa bi muxalefeta siyasî re muamele dike. Darae, Hums, Banyas yan jî Cisr el-Şuxur bi tenê çend mînakên hefte û mehên bihurî ne.

Serhildana ***Birayên Misilman*** ku muaxalifên desthilatdarîyê ne, sala 1982yê bi awayekî hovane hat şikandin. Di wê bûyerê de ku jê re *Komkujîya Hamayê* tê gotin, qederê 30.000 mirov hatin kuştin. Birayên Misilman jî ji sedan êrişan berpirsîyar bûn. Sala 2002 û 2003yê xwepêşandanên kurdan li Şamê bi awayekî hovane hatin şikandin. Di adara 2004ê de di navbera alîgirên tîmên futbolê yên kurd û ereb de li herêmên kurd ên Sûrîyeyê de pevçûnan rûda, ku paşê ji Qamişloya li rojhilata welêt heta bi Efrîna li serê rojavayê welat belav bûn. Sedema bûyeran ew bû ku alîgirên tîmê ereb bi gotina sloganên ji bo Sedam Huseyn bi sîlehan êriş birin ser alîgirên kurd. Hingê li bajarên mezin jî cih cihan bûyeran rû da. Xwepêşandan û protesto ji alîyê artêş, polîs û partîya ***Baas***ê ve bi rijandina xwînê hatin tepisandin. Di encamê de bi dehan kes hatin qetil kirin, bi sedan kes birîndar bûn, gelek kes hatin wenda kirin û bêhtirî 3000 kes jî hatin girtin. Gelek xwendekarên kurd ji bo heta hetayê ji zanîngehê hatin dûr xistin.

Yek ji rejîmên herî zordest

Rejîma Sûrîyeyê yek ji rejîmên herî hov û zordest ên tevahîya cîhana ereb e. Mafên mirovan ên sereke li vir di nav 50 salên dawîyê de her hatin bin pê kirin. Parêzvanên mafê mirovan û muxalif tên wenda kirin, girtin û êşkence li wan tê kirin. Di rabihurîyê de û herweha di van demên dawîyê de di encama êşkenceyê de li zindan û girtîgehên Sûrîyeyê de bêhejmar mirov mirin. Halê hazir nêzîkî 13000 girtîyên siyasî hene. Di girtîgeh û zindanan de rewşa paqijîyê kambax û bobelat e, xizmeta tibî û tenduristî bixwe, bi tevahî ne têrker e. Li girtîgehan û qereqolên polîsan êşkence weke adet be, tê bi kar anîn. Mexdûrên van êrişan gelek caran bi tevahîya jîyana xwe dikevin bin bandoreke fizîkî yan jî derûnî ya vê şidetê. Mexdûrên ku di encama şideta fizîkî de dimirin jî kêm nînin.

Li Sûrîyeyê ne azadîya çapemenîyê, ne jî ya derbirînê heye. Tevahîya dezgehên çapemenîyê di destê hukûmetê de ne û bi awayekî hişk tên kontrol kirin. Hem tevahîya kanalên radyo û televizyonê û hem jî medayaya çapê jî dikevin berê. Azadîya damezirandina yekîtî û komeleyan ji alîyê hukûmetê ve pir tê bi sînor kirin. Azadîya kombûn, civîn

▶ R. 4

Konsepta "kurahîya stratejîk" ya Wezîrê Karê Derve Ahmet Davutoglu

Berdewamî yan jî veguherîna siyaseta derve ya tirkan?

Dr. Gülistan Gürbey *

Siyaseta derve ya hikûmeta AKPê li hundir û li derveyê welêt bi awayekî bi îxtîlaf tê gotûbêj kirin. Li navenda vê nîqaşê ev pirs heye: Ka gelo rêkenûdana ber xwe ya esasî yan jî berdewamîya vê siyasetê dîyar dikin? Gotara li ber destê we elaqedarî vê gotûbêjê ye û giranîya xwe dide ser konsepta Wezîrê Karê Derve yê tirk **Ahmet Davutoglu** ya bi navê "kurahîya stratejîk" ku pê stratejîya xwe ya siyaseta derve derdibire: Berê xwe ji siyaseteke têra xwe pasîf, yekalî vediguhere û dide yeke dînamîk û piralî.

Pirsa sereke ev e, gelo maneya konsepta **Davutoglu** nûbûneke esasî ye, bi maneya jêgerîna bingehên rêûresmî, yan jî maneya vê konseptê hê bêhtir berdewamîyek e di siyaseta derve ya Tirkiyeyê de.

Piştî alozîya Rojhilat-Rojava çalakgerîya siyaseta derve

Piştî ku dawî li alozîya Rojhilat-Rojava hat, siyaseta derve ya Tirkiyeyê kete bin zexteke xwe guncînê, lewra derdora herêmî û navneteweyî xwe diguhert. Encameke vê yekê firehbûna çapa siyaseta derve ya Tirkiyeyê bû: Hatina cem hev ya rewşên nû yên xwedî maneya siyaseta derve û siyaseta ewlekarîyê, bûn sedema ji nû ve birêkûpêkkirina têkilîyên li herêma Derya Reş, Qafqasan, Asya Navîn, Rojhilata Navîn û li Balkanan. Çalakgerîyeke nû ya siyaseta derve bi serdema **Turgut Ozal** (1983-1993) dest pê kiribû. Hingê, siyaseta derve ya Tirkiyeyê ya adetî pasîf û yekalî, ber bi xeta siyaseteke derve ya çalak û piralî ve hate veguherandin. Di destpêkê de aborî û hevkarîya aborî serê vê siyasetê dikişand û armanca wê ew bû di derdora herêmî ya tirk de hevkarîyên aborî yên dualî û piralî pêk bîne. Bêguman, pêşekîya siyasetên peymanên hevgirtinê û hevkarîyên stratejîk ên bi rojava re



Fehmî Balayî: **4 Kevok**, Boyaxa rûnî li ser tuwalê, 100 x 80 cm

dihat parastin. Siyaseta derve ya nû ku armanca wê roleke pêşeng a Tirkiyeyê di siyaseta herêmî û navneteweyî de bû, ji hingê ve weke oryantasyona alternatîf a siyaseta derve ma û hukûmetên piştî Ozal jî bi hin qutbûnên şidet û hêza wan guhertî, ev siyaset dewam kirin.

Erê, doktrîna siyaseta derve û siyaseta ewlekarîyê ya kemalîst weke bingehê îdeolojîk heta îro hê dîyarker e: Li navenda vê têgihiştinê ferz û fermana misogerkirina bingehên erd û civakî yên komara tirk yên piştî 1923yê heye. Tevahîya hewldanên siyaseta ewlekarîyê di bin vê ferz û fermanê re ne û ji bo parastina destkevtîyên komarê hatine bi cih kirin. Belê, herî dereng ji dawîya

▶ R. 3

Almanya: 4,50 €
Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda: 5,00 €
Brîtanya: 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK,
Swêd: 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Tirkiye:** 7 TL

4 1 9 1 7 6 4 2 0 4 5 0 9 2 1

arşîvakurdi.org

Şantaja li Waşîngtonê

Serge Halimi

Gengeşîya li ser kêmkirina deynê Amerîkayê yê ku serok **Barack Obama** û piranîya komarxwazên Kongreyê tîne hemberî hev, mijara bingehîn vedişêre: Obamayê ku nema karî li hemberî dijberên xwe, xwe ragire, bi carekê paş de gav avêt û qebûl kir ku zêdetirî sê çarîkên çavkanîyên butçeya deh salên pêşîya me, ango 3 000 mîlyar dolar, bi rêya kêmkirina butçeyên civakî, bên bi dest xistin. Dihat payîn ku rasta amerîkî wê bi vê serkevtinê têr û kêfxweş bibûya, lê belê ew hertim zêdetir dixwaze. Ew her tiştî dixwaze.

Di kanûna 2010ê de dema cara pêşî li himberî vê zexta rasta amerîkî serî tewand, serokê Dewletên Yekbûyî kêmkirinên bacan ên pir bêedalet ên ku biryara wan ji alîyê selefê wî **George W. Bush** ve hatibû wergirtin, ji bo du salan dirêj kiribû. Çar meh bi şûn de, Obama vê carê jî weke **Ronald Reagan** axivî û ji ber *"kêmbûna salane ya lêçûnên herî girîng a dîroka me"* kêfxweşîya xwe derbirî. Wî dûre hevdîtin û muzakereyên li gel parlamenterên komarxwaz dan pey hev û da zanîn: *"Bila ez bigihîjim encamekê, ez amade me ji alîyê partîya xwe ve bêm rexnekirin"*. Encam: Paşdegavavêtinên nû yên Qesra Spî …

Rasta amerîkî dijber e li himberî her şiklê kêmkirina deynê dewletê ya ku bi bilindkirina bacê pêk were.

Ev helwêsta ku li welatekî ku şapeya îmtîyazên bacî ya bi ser dewlemendan ve diherike, weke hewldaneke vala xuya dike, dike ku asta global a bacan ti caran ew çend kêm nebûbe di pêncî salên dawî de. Lê belê, li wêdetirî serhişkîya ku tenê lêçûnan ji xwe re dike armanc, komarxwaz di eslê xwe de dixwazin *"heywanan birçî bihêlin"* –ango, eger bi îfadeya yek ji stratejîstên wan were gotin, ew dixwazin *"hêza dewletê lawaz bikin ku mirov karibe wê di kuvetekê de bixeniqîne"*.

Baş e, hilpekîna berî çendekê ya deynê gelemperî ya amerîkayê divê bi çi were îzah kirin? Berî her tiştî bi buhrana aborî, ku bêhtir encama bêserûberiya diravî ya deh salên dawîyê ye.

Dûre di encama berdewamkirina birêkûpêk a kêmkirinên bacan yên di 2001ê de bi dengdanê hatine qebûl kirin (2 000 milyar dolar kêmtir ji qezenca bacê dihat hêvî kirin). Nîhayet, bi şerên piştî 11ê îlonê li Afganistan û Iraqê (1 300 milyar dolar). Partîya **Reagen** û **Bush** li gel vê yekê jî îdîa dike ku wê hem kesên herî dewlemend ku wan weke *"afirînerên kar"* bi nav dike û hem jî butçeya Pentagonê ya ku (bi rastî jî weha bû) di deh salan de ji sedî 67 zêde bû, parastine.

5ê nîsana dawî, serokê komîsyona butçeyî ya Meclîsa Nûneran, **Paul Ryan** jî projeyên komarxwazan ên ji bo çend deh salên bên, hûrûkûr rave kirine. Li gor plana wî lêçûnên gelemperî yên vê gavê bi qasî ji sedî 24ê hilberîna hundirîn a brut in, wê di 2050yê de êdî negihîjîn raserî ji sedî 14.75ê hilberîna hundirîn a gelemperî. Rêjeya bacstandinê ya herî bilind jî wê ji sedî 35ê dakeve ji sedî 25ê (asta herî kêm ji sala 1931ê ve). Hemû qul û qewarên bacî yên kesên xwedî îmtiyaz tên dagirtin, lê belê tenzîmat û lêçûnên tenduristîya ixtîyar û xizanan tên cemidandin.

Eger **Obam**a bi vî awayî reva xwe ya ji têkoşînê bidomîne, wezîfeyên civakî yên dewleta amerîkî dibe ku di demeke nêz de bişibin cenazeyekî di kuvetekê de.

Wergera ji fransî: Baran Nebar



JI ÇAPEMENÎYÊ



Standarda dualî ya cîhanê: Filistînî û Kurd

Bi çavê îsraîlîyan xweserîya kurdan

Ragihandina xweserîyê ya *Kongreya Civaka Demokratîk* a 14ê tîrmehê di ber sîya pevçûna navbera artêşa tirk û gêrîlayên PKKyê ya li Farqîna Amedê de ma û ne li cem raya giştî ya navneteweyî, ne jî li cem çapemenîya cîhanê deng veda. Rojnameya Îsraîlî **Jerusalem Post** di 23ê tîrmehê de gotarek sebaret bi vê bêdengîyê weşand. Gotara ku bi îmzeya edîtoryal hatiye weşandin dibêje *"Ragihandina yekalî ya xweserîya kurdan a li Tirkîyeyê bi bêdengîya mirinê hat pêşwazî kirin. Dinyayê ev yek paşguh kir."*

Rojname bi bîr dixe ku xweserî ji alîyê 850 şandeyan ve hatiye ragihandin û Ankara li hember vê yekê bi hêrs ketîye û xweserîya kurdan ne di xema cîhanê de ye. Gotar herweha dibêje digel jihevketina Împaratorîya Osmanî ya piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn kurd ne ku bi tenê hatine ji bîr kirin, lê belê herweha li Rojhilata Navîn di nav çar dewletan de hatine par ve kirin, ku dudu ji wan dewletan bi destê Brîtanya û Fransayê hatibûn damezirandin in.

Derbarê mafê çarenûsê de ***Jerusalem Post*** herweha kurdan û filistîyan dide ber hev û weha dinivîsîne: *"Li gor mîtolojîya berbelav, civaka navneteweyî mafê self-determînasyonê wekî mafê xwezayî ya her neteweyî dibîne û nabe ku ev maf ji wan were stendin. Lê belê ew rewş, bi tenê, wekî hinceta teşqele û hawara cîhanî ya ji bo dewleteke filistînî weha ye."*

Rewşa kurdan nîşaneya standardeke dualî ye

Gotar sebaret bi rewşa kurdan weha berdewam dike: *"Gelheya kurdan dora 30 yan 35 mîlyonan e û ji ya filistînîyan gelekî zêdetir e. Ew bi çand û zimanê xwe yê resen neteweyekî serbixwe pêk tînin. Dema ku ereban navê filistînîyan hîna nebihistibûn, an ku di sedsala 19emîn de, kurd ji bo azadîyê têdikoşîyan. Wê demê neteweperestîya ereban jî hîna derneketibû. Heta kurdan di 1927ê de Komara Araratê damezirand, lê belê piştî demekê hat hilweşandin. Him Tirkîye, him jî Îranê bi zordarî gelek serhildanên kurdan tepisandin. Kurd hîna jî ji bo azadîya xwe têdikoşin."*

Rojnameya Îsraîlî hevdem dibêje nakokîya navbera kurdan û filistînîyan nikaribû aşkeretir bûbûya, ji ber ku filistînî bi piştgirîya navneteweyî ser xwe re çûne û alîkarîya malî jî distînin. Gotar herweha lê zêde dike ku sala 1947ê de filistînîyan pêşnîyara dewleteke filistînê red kiriye. Di warê helwêsta cîhanê ya li hember ragihandina xweserîyê, ***Jerusalem Post*** weha dinivîsîne: *"Lê belê ragihandin yekalî ya xweserîya kurdan li Tirkîyeyê bi bêdengîyeke mirîyan hat pêşwazî kirin. Dinya ev yek paşguh kir. Dinya pesnê pêngava neteweperwerîya kurdî nade, alîkarîya dîplomatîk nade wan, wan di çapemenîyê de sempatîk nîşan nade û alîkarîya malî jî nade cudaxwazan. Dinya tevgera wan wekî terorîst bi nav dike û li hember zordestîya wan dewletan a li ser kurdan, dengê xwe nake."*

Gotar wekî din îddîa dike ku kurd ji filistînî û ji bermahîyên mêtîngerîya rojavayî ya kevnbûyî bêhtir pêşmercên self-determînasyonê bi cih tînin, lê belê neheqî li wan tê kirin, lê dîsa jî li gor filistînîyan nikarin ji cîhanê hevdilî werbigirin. Rojname dirêjahî pê dide: *"Lê belê dîsa jî derfetên nû li pêşîya kurdan e. Wan li Îraqê nîv-xweserî bi dest xistiye (herçend piştî ku Amerîka ji Îraqê derkeve, dahatîya wan ne dîyar e), Sûriye niha bi nebûna seqemgîrîyê diheje û hin pêşveçûnên li Şamê wêrekîyê dide kurdên Tirkiye û Îranê."*

Rojname hevdem hin pêşnîyaran pêşkêşî karbidestên Îsraîlî dike û dibêje: *"Dibe ku niha dem dema siyaseteke wêrektir a Îsraîlê ye, nemaze di demeke weha de ku Tirkiye dijberîya Îsraîlê dike. Tiştê ku em ê wenda bikin nîne, nemaze jî hevalbendîya Tirkîyeyê. Tu sedem nîne ku Îsraîl piştgirîyeke bêdawî nîşanî mafê self-determînasyonê ya kurdan neke- wekî ku da Başûrê Sudanê. Ev yek ne tenê ji bo bersivdana helwêsta Tirkîyeyê ya li hember Îsraîlê ye, lê belê ji ber wê yekê ye ku kurd self-determînasyonê heq dikin."*

Bi çavê Başûrê Kurdistanê xweserîya kurdên li Bakur

Rojnameya **Rûdaw**ê di 23ê tîrmehê de nihêrînên nûnerên partîyên li *Kurdistana Başûr* weşandin. Nûçeya ku ji alîyê **Hêmin Xoşnaw** ve hatiye nivîsandin, dîyar dike ku di warê xweserîyê de di nav partîyên Herêma Kurdistanê de nihêrînên cuda hene.

Endamê mekteba miyasî ya *Yekîtîya Nîştîmanî ya Kurdistanê* (YNK) **Ferîd Eseserd** dibêje herçend ev mafê kurdan be jî, ragihandina xweserîyê bêyî lihevhatineke Enqereyê dê têkilîya navbera Enqere û kurdan xera bike û rê lê veke ku hikûmeta tirk hin gavan biavêje ku ne li gor berjewendîyên kurdan be.
Endamê Civata Serokatîyê ya Partîya Demokrat a Kurdistanê (PDK) **Elî Ewnî** jî rahigandinê erênî dibîne, lê belê dibêje nabe ku xweserî bi tenê di çarçoveya sê xalan de an ku ziman, nasname û desthilatdarîya navçeyan de were sînordar kirin û divê kurd doza mafên wekhev ên gelê tirk bike. **Ewnî** wekî din diyar dike ku divê kurdên li Tirkîyeyê mînakên *Qibris* û Herêma Kurdistanê deynin ber xwe û divê derîyê dîyalogê digel dewleta tirk her tim vekirî bihêlin.

Endamê Mekteba Sîyasî ya Komeleya Îslamî ya Kurdistanê **Nazim Ebdulla** jî dibêje xweserî mafekî xwezayî ya kurdên li Bakurê Kurdistanê ye, lê belê diviya ku piştî lihevhatineke digel dewleta tirk bihataya ragihandin; ji ber ku tirk û kurd hevparên dewletê ne. **Ebdullah** dîsa jî bang li civaka navneteweyî dike ku guh bidin banga kurdên li Tirkîyeyê.

Nûnerê Tevgera ***Goran*** (Guherîn) **Şêrko Osman** di warê xweserîya kurdên li Tirkîyeyê de got ku Herêma Kurdistanê dikare di vî warî de roleke erênî bilîze û kurdên li Tirkîyeyê jî dikarin ji mînaka Kurdistana Başûr sûdê werbigirin.

Endamê Mekteba Sîyasî ya Yekgirtina Îslamî ya Kurdistanê **Ebûbekir Elî** piştgirîya xwe ya ji bo xweserîyê radgihîne, lê belê di heman demê rexne li *BDP* digire ku ew wekî ku divê hevkêşîyê naparêzin. **Elî** wekî din dibêje divê karbidestên kurd ên Bakurê Kurdistanê asta daxwazên xwe bilind bikin, lê belê di heman demê de hişyar bibin ku rê nedin nîjadperestîya tirk xurt bibe. Nûnerê Yekgirtîya Îslamî hevdem bang li Hikûmeta Herêmî jî dike ku têkilîyên xwe yên digel hikûmeta tirk xurt bike ku bikaribe rola aramîyê bilîze.

Le Monde diplomatique kurdî
Ji aliyê Independent
Kurdish Media Group GmbH
ve tê weşandin

INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH

Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

Lijneya Weşanê
Murad Satik
Riza Dînç

Le Monde diplomatique kurdî

Redaksiyona Zimanî
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

Alîkarên vê hejmarê
Yado Ciwan
Semra Polat
Ergün Yetkiner
Celîl Kaya
Nedîm Baran

Revîzyona Wergeran
Feryal Guladawiya
Luqman Guldivê

Berpirsê Hunerî
Hasan Huseyîn Devecî

Designer
Fabio Biasio

Web Developer
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

ABONETÎ
Independent Kurdish
Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000
2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

Abonetiya Salane:
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

Le Monde diplomatique

Damezrîner
Hubert Beuve-Méry

Birêveberê giştî
Serge Halimi

Sernivîskar
Maurice Lemoine

Cîgirên Sernivîskarî
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

Redaksiyon
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

Birêveberê hunerî
Alice Barzilay

Dokumantasyon
Olivier Pironet

Sekreter
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

www.kurdishmedia.com

Berdewamî yan jî veguherîna siyaseta derve ya tirkan? (Dewama rûpela 1)

alozîya Rojhilat-Rojava ve di eskerî, dadgerî û burokrasîyê de du pêkhênerên nû yên îdeolojîk weke hêzên dijber ên elîtên rêûresmî yên neteweperest-kemalîst, qebqebûyê dikin û nav li xwe didin: Meylên pan-tirkîzm û "neo-osmanî" (girêdana bi "mîrata" cografî, dîrokî û dînî ya osmanîyan ve) ji berê bi hêztir xwe didin der –û armanca wê ew e, qada bandora siyaseta derve û ya ewlekarîyê ya Tirkiyeyê li Qafqasan, Asyaya Navîn û Rojhilata Navîn fireh bike û Tirkiyeyê bike hêzeke pêşeng a hegemonyal. Meylên "neo-osmanî" hê di serdema **Ozal** de jî tesîr li siyaseta derve dikir. Dema ku alîyê dîrokî, ango nasnameya misilman û rabihurîya osmanî ji bo siyaseta derve ya îro derdixe pêş, hukûmeta AKPê jî pêkhênerên "neo-osmanî" ji bo xwe bi kar tîne. Ew hewl dide bandora tirkan li herêmên berê osmanî bûn, fireh bike û Tirkiyeyê bike hêzeke herêmî ya pêşeng.

"Kûrahîya Stratejîk": Konsept, Armanc û Prensîp

Konsepta "kûrahîya stratejîk" serkêşiya siyaseta derve ya hukûmeta AKPê dike. Wezîrê Karê Derve **Davutoglu** dema ku li zanîngehê profesor bû ev konsept bi pêş xistibû û di pirtûka xwe ya bi navê "'Kûrahîya stratejîk': Cihê Tirkiyeyê yê navneteweyî" (1) de ew dida nasîn. Di vê de Davutoglu konsepteke jeo-stratejîk disêwirîne ku ji bo oryantasyoneke proaktîf û piralî ya siyaseta derve ya tirk, bingeh pêktîne. Elaqedarî Tirkiyeyê "kûrahîya stratejîk" maneyên cografî, dîrokî û çandî îfade dike. Nexasim jî du pêkhêner girîng in: *Ya pêşî* ew e, di navbera cografya, dîrok, nasname û siyaseta reel de girêdaneke ji nêz ve wê were çêkirin. Davutoglu siyaseta xwe ya derve li ser hîmê têgihiştineke nû ya cografî bi pêş dixe ku bi rabihurîya dîroka osmanî re pêwendîdar e. Li gor Davutoglu divê Tirkiye li "nasnameya xwe ya dîrokî û cografî" vegere, kok û rîşên xwe yên dîrokî û çandî li herêmên cîran qebûl bike û "pêwendîyeke hevaheng bi aktorên global û herêmî re" armanca wê be. Di warê cografî de Tirkiye li herêma Afro-Ewro-Asyayî weke *welatê navendî* tê dîtin. Ev rewşa bêmînak û bêhemta ya Tirkiyeyê dike ku Tirkiye bibe xwedîya pir nasnameyên herêmî yên weke welatê ewropî, rojhilata navînî, asyayî û ev yek jî rê li ber vedike ku Tirkiye di heman demê de li gelek herêman çalak be. Davutoglu di encama gihiştiyê de dibêje, nabe ku nasnameya Tirkiyeyê weke yeke bi tenê werê kêm kirin. Ji bo vê jî konsepta wî tewazûnekê navbera têkilîyên bi rojava û herêmên cîran re pêş dibîne. Ango, Tirkiye yekalî divê xwe bi peymanên hevgirtinê yên bi DYA û YEyê re sînordar neke, berevajî, divê armanca wê têkilîyên bi tevahîya dewletên herêmê re be. Di rastîyê de têkilîyên bi herêmên cîran re girêdanên rêûresmî yên bi Rojava re temam dikin û wan naxin ber lêpirsînê.

Ya duyem, di navbera veguherîna siyaseta hundir û siyaseta derve de pêwendîyeke ji nêz ve tê afirandin. Siyaseta hundir dibe *şertê bivênevê* yê danûstendineke siyaseta derve ya serketî: Heke veguherîna siyaseta hundir nebe, siyaseta serketî ya derve nabe –û çiqas îstîqrara siyaseta hundir hebe, hingê ewqasî derfet û şans hene ku bi xeteke siyaseta derve ya jixwerazî bikevin nav înteraksîyonên dualî yan jî piralî. Li gor vê, Davutoglu di vê konseptê de xalekê derdixe pêş, ew jî weha ye; ferz e ku di navbera demokrasî û ewlekarîyê de nisbeteke hevaheng hebe da ku siyaseta derve ji bandora girêdana bi têgihanên tehlûkeyê yên siyaseta hundir rizgar bike. Li gor wî, gelek demokrasî wê gelek ewlekarîyê bîne pê û qada siyaseta hundir jî her diçe bêhtir ji serdestiya her dewam dike ya ewlekarîyê rizgar bike. Bi ya wî, ev rewş dikare bi tevahî bandoreke erênî li siyaseta derve bike û jêhatîbûna manevrakirinê ya siyaseta derve jî pir zêde bike.

Di konsepta "kûrahîya stratejîk" de pênc prensîp hene:

Ya pêşî prensîpa helwesteke siyaseta derve ya berfirehtir e, ku li ser bingeha *nasnameyên pirhejmar ên herêmî* pirsgirêkên piralî yên siyaseta derve yên Tirkiyeyê li ber çavan bigire, tu herêman paşguh neke û li ser yek pêşekîya bi tenê bist nebe. Divê weke pêvajoyeke ji perspektîfa demdirêjtir li siyaseta derve were nêrîn, ku çalakgerîya li tevahîya herêman a li ser hîmê hîyerarşîya pêşekîyan û ne ya pêşekîyeke bi tenê wê bi rê ve dibe. Li gor Davutoglu ev pêdivîyeke destjênabe ye da ku mirov karibe bi awayekî aktîv bersivê bide bûyerên diqewimin. Mohra berdewamîya di hevkarîya bi rojava re û kûrkirina têkilîyên bi herêmên cîran û yên ji wan û wê de re li ser nêzîkatîya siyaseta derve ya entegrekirî ya Davutoglu heye.

Ya duyem, xetên siyaseta derve ya proaktîf û piralî prensîpa duyemîn in; divê bi dîplomasiyeke rîtmîk yan jî proaktîf mirov destekê bide van xetan. Prensîpa herî jor a vê nêzîkatîyê tişta jê re "*prensîpa sifir pirsgirêkê*" *(zero problem policy)* tê gotin û "*xeta entegrasyona herî zêde*" *(maximum integration policy)* ne - weke ku Davutoglu bi xwe nav lê dike.

Ya sêyem, jêhatîbûna daîmî bi înîsîyatîfên siyasî amadebûn e, da ku bandorê li bûyer û qewmînên li derdora herêmî bike (weke mînak çareskirina alozî û pirsgirêkan, birêvebirina krîzan).

Ya çarem, siyaseta ekuwîdîstansê [dûrahîya wekhev] ya ku tevahîya aktorên pêwendîdar li ber çavan digire, ekuwdîstansekê beramberî tevahîya aktoran diparêze û xwe ji alîgirîyê bi rêya dîplomasîyeke nerm û pirdîqet a Tirkiyeyê dûr digire.

Ya pêncem, têgihaneke siyaseta derve ye ku civaka sîvîl û aborîyê weke beşek ji siyaseta derve têdigihe, desteka wan seferber dike û wan di pêvajoya dîyarkirina siyaseta derve de bi cih dike.

"*Kûrahîya stratejîk*" a siyaseta herêmî

Di pratîkê de bikaranîna "kûrahîya stratejîk" bi awayekî berbiçav li herêmên yekser cîranê Tirkiyeyê ne, pêk tê. Mirov divê berîya her tiştî van hêmanan weke hêmanên ajoker ên çalakgerîya siyaseta derve li Rojhilata Navîn bi nav bike: Şerê Iraqê (vî şerî rewşên siyasî yên herêmî guherandin û bandor li Tirkiyeyê jî kir) û kêşeya kurd (li gor pîvanên kemalîst ên komarê ji yekparebûna erdên Tirkiyeyê û ewlekarîya herêmî re weke tehlûke tê dîtin û di formulasyona siyaseta ewlekarîyê ya herêmî ya Tirkiyeyê de jî hêmana sereke ye). Hukûmeta AKPê di vê çarçoveyê de "*prensîpeke sifir pirsgirêkê*" û herweha "*xeta entegrasyona herî zêde*" (bi razandina li hevkarîyan, weke mînak bi peyman û lihevkirinên dualî û piralî, afirandina bihevgirêdayîbûnan) bi welatên cîran re dimeşîne. Ev welat demeke dirêj weke niyet "dijmin" dihatin dîtin –welatên weke Sûrîye, Iraq û Hukûmeta Herêmî ya Kurdistanê. Bi Sûrîyeyê re sala 1999ê piştî girtina serokê PKKê **Abdullah Ocalan** siyaseteke nêzîkbûnê hate dest pê kirin. Hukûmeta AKPê ev têkilî berfirehtir kirin: Di van salên dawîyê de rêzek peymanên derbarê hevkarîya eskerî-stratejîk û aborî de hatin mohr kirin.

Bi Iraqê re di çirîya pêşî ya 2009ê de gelek peyman û lihevkirin hatin mohr kirin, ku hevkarîyeke xurt a siyaseta ewlekarî û aborîyê pêş dibînin. Beramberî Hukûmeta Herêmî ya Kurd jî hukûmeta AKPyê siyaseteke pêşîlêvekirinê dimeşîne ku bi vî reng û firehîyê nû ye. Armanca hevkarîya ji nêz ve ya aborî û siyaseta ewlekarîyê ew e, ku li dewleta federe ya Kurdistanê û Iraqê bibe xwedî bandor, desteka Hukûmeta Herêmî ya Kurd û Iraqê di şerê li dijî PKKê de misoger bike û pêşîyê li avabûna dewleteke kurd bigire.

Encam: Guherîn ya berdewamî di siyaseta derve ya Tirkiyeyê de?

Ji analîzê encamên ku derdikevin ev in:

Ya pêşî: bi siyaseta "kûrahîya stratejîk" di siyaseta derve ya Tirkiyeyê de guherîneke esasî bi maneya berêxweguhertina ji girêdanên xwe yên bi rojava ve yên ku rêûresmê wê ne, pêk nehatiye. Lê belê di pêşekîyên siyaseta derve de xalên li pêş guherîn, nexasim jî di derdora herêmî de derxistina pêş a siyaseta derve a Tirkiyeyê. Erka li pêş a siyaseta derve a tirk êdî ew e ku cihê Tirkiyeyê weke aktora herêmî zexm û xurt bike. Belê, divê ev jî weke temamkera têkilîyên bi rojava re were dîtin. Heta niha tu nîşanên zelal nînin ku bibêjin derxistina pêş a siyaseta derve ya herêmî (nexasim Rojhilata Navîn) zirarê li oryantasyona ber bi rojava ve dike. AKP hê bêhtir hewl dide rola Tirkiyeyê weke pira di navbera rojhilat û rojava de xurt bike, û bi vî rengî xwe weke hêmana hêzê ya herêmî bi sazî bike.

Di heman demê de divê were tesbît kirin ku pêvajoya endametîya YEyê ya ku di salên dawîyê de li ser ajandaya siyaseta hundir û derve de erkeke li pêş bû, niha di hîyerarşîya siyaseta derve de bi giştî ber bi paş ve çûye. Maneya vê ew e ku întegrasyona bi YEyê re êdî ne cihê herî li pêş e, dîsa jî weke yek ji armancan tê parastin. "Kûrahîya stratejîk" endametîyeke tam a YEyê li der xwe nahêle, dîsa jî ew ji bo li derdora herêmî pêkanîneke biserketî ya siyasetê ne xwedîya roleke bingehîn e. Têkilîyên bi YEyê re ne *parçeyê* herî li pêş, belê *yek* ji parçeyên herî li pêş ên "kûrahîya stratejîk" e. Ji ber wê jî, mirov nikare bibêje qutbûnek heye, bi maneya rûbadaneke ji binî ve ya Tirkiyê ji rêûresmên wê yên siyasî sebaret bi têkilîyên wê yên bi YEyê re. Dîsa jî weha xuya ye ku mirov nikare bi tevahî li derveyî îhtîmalan bigire ku xirabûna siyaseta derve û ya hundir wê di nav hîyerarşîya pêşekîyên siyaseta derve de bandora neyînî bikin û dibe ku pêvajoyeke silbûna siyasî ya dualî di navbera Bruksel û Enqerê de dest pê bike.

Stratejîya siyaseta derve ya **Davutoglu** û li derdora herêmî derxistina pêş a siyaseta derve ya tirkîyeyê, maneya wan ne ew e ku li Rojhilata Navîn împeryalîzmeke tirk tê ava kirin, lê belê avakirina roleke pêşeng di siyaseta heremî û navneteweyî de. Ew di heman demê de hêmanên neo-osmanî jî bi kar tîne, bêyî ku bi awayekî eşkere girêdana bi rojava ve ya adet e, bixe ber lêpirsînê. Derxistina pêş a rabihurîya osmanî û nasnameya misilman bi kêr tên ku esasên kemalîst-îdeolojîk ên siyaseta derve ya heta roja me ya îro û zêde behskirina nasnameya rojavayî ya Tirkiyeyê werin teraz kirin. Herdu hêman jî –rabihurîya osmanî û nasnameya misilman– tên bi kar anîn ji bo firehkirina jeopolîtîkê û hizirîna li ser menzîla cografî ya çalakîya siyaseta derve.

Ya duyem: Stratejya siyaseta derve ya **Davutoglu** dewama çalakgerîya siyaseta derve ya Tirkiyeyê ya piştî dawîlêhatina alozîya Rojhilat-Rojava ye. Stratejîya **Davutoglu** bi pêşketina qonax bi qonax ya siyaseteke derve ya proaktîf û pir alî ya serdema **Turgut Ozal** ve girêdayî ye, lê belê ji hingê ve her xwe bi pêş dixe. Weke siyaseta derve ya **Ozal**, konsepta "kûrahîya stratejîk jî" hewl dide Tirkiyeyê di siyaseta herêmî û navneteweyî de bike aktoreke girîng a stratejîk û destjênabe û wê weke navenda aborî û enerjîyê bi sazî bike.

"Kûrahîya stratejîk" –weke siyaseta derve ya **Ozal**– di xeta lîberal a siyaseta reel de asê ye. Weke *soft power* Tirkiye divê bi navgînên siyasî, aborî, dîplomatîk û çandî li herêmên berê osmanî bibe xwedî bandor. Ji bo Tirkiyeyê ev herêm xwedî girîngîyeke stratejîk û neteweyî ne, û Tirkiye bi xwe navenda wan e.

Ji niha ve mirov dikare tesbît bike ku serdema siyaseta derve ya **Davutoglu** wê daxilbûna Tirkiyê ya nav siyasetên herêmî kûr bike. Pêkanîneke serketî ya stratejîya wî bi xwe wê berîya her tiştî girêdayî sê hêmanan be:

Ya pêşî, hewldanên çêkirina tewazûnekê di navbera siyaseta hundir û derve de û bi wî rengî bi rê ve birina siyaseta derve ya Tirkiyeyê ku bandorên mijarên pir nazik û hesas yên mîna Qibris, bakûrê Îraqê ya kurd, Ermenîstan û Filistînê li ser siyaseta hundir sînordar bin. Di vê çarçoveyê de veguherîna siyaseta hundir *şertê bivênevê* yê bi serketî pêkanîna hedefên siyaseta derve yên **Davutoglu** ne.

Ya duyem, ew jêhatîbûn e ku karibe bi birêveberîya eskerî ya tirk re li hev bike ku ew jî otorîteyeke dîyarker e di siyaseta derve û hundir de. Lewra birêveberîya eskerî wê timî hingê bikeve nav tevgerê yan jî dest têwerdanê, dema ku li gor dixwegihiştina xwe û fonksîyona xwe ew vê yekê hewce bibîne.

Ya sêyem, ew jêhatîbûn e, ku karibe berjewendîyên herêmî û navneteweyî yên ku di navbera Tirkiye, DYA û YEyê de nêzîkî hev dibin, wisa bi kar bîne ku ji bo hemû alîyan rewşeke *win-win* [herkes feyde dike] pêk were.

Di dawîyê de jî bi awayekî esasî ev pirs xwe dide der: Ka gelo stratejîyeke siyaseta derve ya weke ya wezîr Davutoglu, ya hewl dide çalakgerîya siyaseta derve li gelek herêman û herweha nisbeteke bitewazûn bi tevahîya aktorên global û herêmî re pêk bîne, çawa dikare di nav şert û mercên siyaseta reel de pêk were û heke pêk hat, heta kîjan radeyê. Lewma ji niha ve di pêkanîna vê stratejîyê de pirsgirêk derdikevin holê; weke mînak yên bi Îsraîlê re.

* PD Dr. Zanîngeha FU Berlin

1 Li ber bigire, *Ahmet Davutoglu*: Stratejik Derinlik. Türkiye'nin Uluslararası Konumu. (Kurahiya Stratejîk. Rewşa Tirkiyê ya di qada navnetewî de. Istanbul, çile 2007 (çapa 21)

Wergera ji almanî: Luqman Guldivê



Fehmî Balayî: **Abstrakt I**, Boyaxa rûnî li ser tuwalê, 30 x 20 cm

www.rojhilat.info

"Bihara ereban" û Sûrîye (Dewama rûpela 1)

û muxalefeteke bi awayekî qanûnî birêxistin bûyî, nînin. Bi îşaretpêkirina qanûnên Sûrî û bi bahaneya zirarê li îtîbara dewletê dikin, her kesên "nerehet" tên girtin. Her meh mirov têne wenda kirin, cihê ku lê têne girtin nayê zanîn. Her û her mirov bi mehan têne girtin, bêyî ku doz li wan were vekirin.

Dîktatorîya serokdewlet û ya partîyê

Hêza rêjîma Sûrîyeyê di destê serokdewlet de kom bûye; partîya hukûmetê ***Baas*** û herweha hêz û rêxistinên cihê yên polîs û îstîxbaratê stûna sereke ya rejîmê pêk tînin. Îdeolojîya *Partîya Vejîna Erebî* ango ***Baas*** ya ku ji sala 1963yê ve *de facto* partîya dewletê ye, weke îfadeya herî girîng a neteweperestîya ereb tê dîtin, ji gelek nifşan û vir ve reng û şêlê dide dewleta Sûrîyeyê û civaka wê. Sîsik û navenda îdeolojîyê pan-erebîzm e, ku netewe weke taybetmendîya hevpar a nasnamediyarker di ser cihêwazîyên etnîk û dînî re digire. Bi vî rengî cihêwazîyên di nav civakê de di nav prensîpên sereke yên destûra partîyê de weke "talî" û "şaş" hatine bi nav kirin. Dema ku zimanê erebî weke zimanê fermî yê dewletê û gel, yekane zimanê perwerdeyê tesbît dike û dibêje her kesê ku li ser erdên ereban dijî ereb e û zimanê wan erebî ye, bernameya partîyê gelê Sûrîyeyê dike ereb. Hêzeke milîs a partîyê ku ji sedhezar kesan pêk tê, heye. Ev hêza milîs baskê eskerî yê rêxistinê ye û bi rêxistinên girseyî yên weke rêxistina ciwanan *Pêşengên Baasê* dikeve nav tevahîya şaneyên civakê.

Rêxistinên îstîxbaratê nexasim di dema desthilatdarîya **Hafiz el-Esed** de bi zanîn hatin pêş de birin û weke pir bikêrhatî têne dîtin. Ji ber qanûna *Rewşa Awarte ya Şer* ku ji sala 1963yê ve di meriyetê de ye, baskên cihê yê avahîya Hêzên Ewlekarîyê ji hev serbixwe tevdigerin û qismî hevdu kontrol dikin. Rêxistina herî mezin a nepenî Midûriyeta Ewlekarîyê ye ku bi hezaran ajanên wê jîyana rojane ya welatîyên Sûrîyeyê kontrol dikin. Yên di hedefa rêxistinê de berîya her tiştî muxalifên siyasî, bîyanî û çapemenî ne. Rêxistina Îstîxbarata Eskerî girêdayî Wezareta Parastinê ye. Ev rêxistin li gor agahîyên rojavayî destekê dide komên terorîst. Dadgehkirina girtîyên siyasî erk û wezîfeya Dadgeha Ewlekarîya Dewletê ye. Dozên wê bi piranî di bin standartên navneteweyî de ne.

Hindikahîyên ne-ereb bi awayekî xedar têne tepisandin

Ji bilî hêzên muxalif, bi awayekî giştî nexasim endamên hindikahîyên dînî û etnîk mexdûrên zor û zexta dewletê ne, para bêtir jî kurd. Serjimara Sûrîyeyê nêzî 20.4 milyonan e, û piranîya wan ereb in. Bi hejmara xwe ya qederê du milyonan kurd ji sedî dehê nufûsa welêt pêk tînin û bi vê jî hindikahîya etnîk a herî mezin a welêt in. Kurd herî zêde li ***Çîyayê Kurmanc***, herêma ***Kobanî*** (bi erebî *Eyn el-Ereb*), herdu cih jî li bakur-rojavayê Helebê ne û herweha li bakurê wilayeta Cezîre (bi erebî *El-Hesekê*) diminîn. Ji bilî kurdan, ermenî, turkmen û çerkez jî li welêt dijîn. Mirov dikare bêje azadîya bawerîyê li Sûrîyeyê bi awayekî esasî heye. Ji bilî piranîya sunî (% 71), li vir alewî (% 12), xirîstîyan (% 10), durzî (% 4), şîî (% 2), herweha îsmaîlî, cihû, asûrî-aramî û êzdî jî hene. Helbet cihû û êzdî li derveyî azadîya bawerîyê tên hiştin. Endamên van bawerîyan qismî bi awayekî eşkere tên dîskrîmîne kirin. Mafê sereke li wan tên qedexe kirin.

Rewşa kurdan

Rewşa kurdên li Sûrîyeyê ji bo tepisandina tevahîya gelên ne-ereb û hindikahîyên dînî yên li welêt mînakek e. Dîroka bindestkirin û tepisandinê şaxê xwe pir berdide jêr. Yek ji delîlên destpêkê yên şidet û zora li dijî kurdan bûyereke sala 1957ê ye, ku tê de dusedûpêncî zarokên kurd di sînemeyeke li Amûdê de ya ku bi qest hatibû şewitandin, mirin. Nexasim ji dema ku rejîma Baas bû desthilatdar ango ji 1963yê û vir ve pir zordestî li kurdên li Sûrîyeyê tê kirin û bi awayekî sîstematîk mafên wan ên mirovan tên bin pê kirin. Ji alîyê fermî ve hebûna kurdan bi dehan salan hat înkar kirin. Hewl tê dayîn ku "pirsgirêka kurd" bi siyaseteke êrişkar a asîmîlasyonê û siyaseteke erebkirinê ya hişk û nijadperest were çareser kirin. Tu temsîla siyasî ya kurdan a qanûnî nîne. Ji ber ku li gor destûra bingehîn a Sûrîyeyê partîyên dînî û etnîk qedexe ne, bi awayekî *de facto* partîyên kurd qedexe ne.

Di 23yê tebaxa 1962yê de hukûmeta Sûrîyeyê bi biryarnameya hejmara 93 biryar da ku li wilayeta ***El-Hesekê*** serjimareke neasayî pêk bîne. Di çirîya pêşî ya sala 1962yê de ev serjimar pêk hat. Di encama vê serjimarê de hevwelatîtîya 120.000 kurdan hat betal kirin. Ev mirovên ji welatîtîya Sûrîyeyê hatî derxistin û paşîyên wan, li welatê xwe veguherîn bîyanîyan. Bi awayê fermî ew yan "bîyanî" yan jî "ne-qeydkirî" ne. Di vê navberê de hejmara kesên ku mexdûrên vê pêkanînê ne, gihîşte 300.000an. Betalkirina welatîbûnê ji bo kesên mafên wan ên welatîbûnê tên asteng kirin, encamên pir fireh derxistin holê. Weke mînak mirovên welatîtîya wan nîne, mafê wan ên milkdarîyê, yê perwerdeyê, yê zewacên fermî, yê hilbijartinê (ne aktîf û ne jî pasîf) û yê memûrtîyê jî nîne. Adara 2011ê **Esed** soz da kurdan ku wan ji nû ve bike welatî. Gelo kurdên hemwelatîtîya wan nîne hemû wê bi lez û bêyî astengên burokratîk ji nû ve bibin welatî? Ji bo em bi vê zanibin, divê em li benda kirinên rejîmê bin.

Bi biryarqanûna 49ê re hukûmeta Sûrîyeyê ji sala 2009ê ve qedexe kir ku mirovên welatîtîya wan a sûrî nîne, êdî di sektora taybet de jî kar bikin. Yê ku li ber vê biryarê rabe, mumkin e bi cezayekî pereyan ê heta bi 100.000 lîreyên sûrî (1609 euro) werin ceza kirin, yan jî ji şeş mehan heta duwanzdeh mehan cezayê girtîgehê dibe ku li wan were birîn. Kesên mexdûr bi tevahî ji mafan hatine bêpar kirin, derîyên perwerdeyê li wan girtî ne û bi vî rengî paşê jî neçarê bêkarîyê ne. Di bin van şert û mercan de jîyaneke hêjayî mirovan ne mumkin e. Ji ber vê yekê gelek kurd dema ku ji wan were, direvin derveyî welatê xwe.

Sala 1965ê destpêka siyaseta erebkirinê ya li dijî kurdan bû ku nijadperestî sedema wê bû û heta îro jî dewam dike. Wê salê fikrê siyaseta herêma ***Kembera Ereb*** kemilî, ku diviyabû li herêmên kurdan di navbera Sûrî û Tirkiyê û Sûrî û Iraqê de bihata ava kirin. Armanca Kembera Ereb ew e; demografîya li bakurê welêt ji binî ve biguhere, serûbinî hev bike. Ji piranîya kurd a li deverê çêkirina hindikahîyekê armanc e. Ji sala 1975ê û pê ve bi awayekî plankirî û li gor armancê bicihkirina erebên bedewî li herêmên kurdan dest pê kir. Heta îro bêhtirî 50 cîhûwarên şên ên ereb, li van deveran hatine ava kirin. Milkên xwedîyê erdan ên kurd –para bêtir mirovên ku debara xwe bi çandinîyê dikin– bi piranî bê tezmînat ji wan tên stendin. Ew bixwe êdî bi tevahî xizan û hejar li kevîyên bajarên mezin dimînin û ji ber ku bingehê debara xwe disipartinê ji wan hatiye stendin, divê debara xwe û malbatên xwe bi emeletîyê bikin. Armanca siyaseta erebkirinê tinekirina nasnameya neteweyî û çandî ya kurdan e. Bi vî rengî li şûna navên dîrokî yên bi kurdî yên bajar, çîya, gelî û erdnîgarîyê navên erebî hatin bi cih kirin. Zimanê kurdî qedexe ye. Bikaranîna zimanê kurdî ya di qada gelemperîyê de, li cem xwe hewandina berhemên wêjeyî û çapemenîyê yên bi kurdî yên bi her rengî bi awayekî hişk têne ceza kirin. Heta îro qeydkirina navên bi kurdî gelek caran tê red kirin. Bi awayekî fermî sala 1992yê giştînameyeke Wezareta Karê Hundir hate weşandin û ev giştîname qedexe dikir navên kurdî li zarokan bên dayin. Ji ber qedexeya zimên hejmara nexwendeyan di nav kurdan de zêde bû. Ji ber ku erebî yekane zimanê perwerdeyê ye, gelek mirovên ku hîç bi zimanê erebî nizanin, ji xizmeta perwerdeyê nikarin sûdê wergirin. Dersdayîna bi zimanê kurdî û pêkanîna çand û folklora kurdî qedexe ne. Sala 1994ê fermaneke walîyê el-Hesekê der çû ku ferz dikir tevahîya dikanên navê wan ne bi erebî di siberojê de navekî bi erebî li xwe bikin. Armanca van tedbîran ew e ku rastî û xisletên nasnameyî yên neteweyî û çandî yên di pêvajoya dîrokê de pêk hatî, berevajî bikin. Pir eşkere ye ku hewl tê dayîn, kurdan bi zor û şidetê asîmîle bikin û mîrateya wan a dîrokî û çandî –nasnameya wan– tune bikin.

Raperîna li Sûrîyeyê û kurd

Ji destpêka nîsana 2011ê ve kurd hema hema her roja înê weke tevahîya welêt dadikevin kolanan û li dijî rejîmê xwepêşandanan li dar dixin. Daxwazên kurdan azadî û demokrasî ne. Her weha bang tê kirin ku rejîm were hilweşandin, lê belê ne weke li herêmên sunî-ereb ên weke Hamayê. Sedemên vê yekê diyar in: Kurd naxwazin bibin qurban û mexdûr, ew li rewşê dinihêrin. Rejîm jî di tepisandina xwepêşandanên kurdan de bi tedbîr e.

Mirov dikare vê helwesta rejîmê çawa rave bike? Meşal Temo di hevpeyvînekê de weha bersiv da vê pirsê:

"Tecrûbeya rejîmê bi me re heye. Dema ku sala 2004ê li herêmên kurdan gule li xwepêşandêran reşandin, bi sedhezaran kurdên li Şam û Helebê jî daketin qadan. Kuştina kesên rejîmê protesto dikin, mirovan bêhtir nêzî hev dike, bi hev dikelîne. Hukûmet baş pê dizane: Heke kurdek di xwepêşandanên li herêmên kurd de were kuştin, bi sedhezaran kurd wê dakevin qad û kolanan. Komên siyasî çiqasî di nav xwe de nelihev û lawaz jî bin, rewşên wisa kurdan dikin yek û dikin kurd hev bigirin. Ev yek ji wan sedeman e ku dike hêzên ewlekarîyê li herêmên kurdan dest wernedin xwepêşandanan. Ew dizanin, heke vê bikin, ev ê bibe sedem ku kurdên li Şam û Helebê jî xwepêşandanan li dar bixin. Ew dixwazin bi her halî pêşîyê li vê yekê bigirin." (1)

Divê mirov li gotinên Temo zêde bike û bibêje, rejîm hê hesabê xwe li ser vê yekê dike ku wê karibe kurdan bike alîgirên xwe. Vekişîna kurdan ji Konferansa Stenbolê ya Tîrmeha 2011ê, rejîm di vê fikra wê de piştrast kir.

Li gor me, rejîm jî di pirsgirêka kurdî de li cihekî "rast" ê ku xwe lê bi cih bike, digere. Lê belê ew di navbera Xelo û Celo de maye: Heke Şam tawîzan bide kurdan, hingê Enqere wê tevî rojava zexta li ser Sûrîyeyê zêde bike. Lê belê heke rejîm xurtir û xedartir bi ser kurdan de biçe, hingê jî ev yek wê bi leztir rê li ber raperîneke gelî a kurdan veke, çawa ku sala 2004ê qewimîbû.

Protestoyên kurdan hê bi rojên diyar ên hefteyê û hin cihan sînordar in. Di warê cografî de li gor Efrîn û Helebê, li el-Cezîre, Qamişlo, Amûdê û hwd. bêtir xwepêşandan rû didin.

Herçî helwesta kurdan beramberî muxalefeta ereb e, her diçe bêtir kurd bi awayekî rexnegir fikra xwe der barê siyaseta muxalefeta ereb a Sûrî de îfade dikin. Kurd bawerîyê nexasim bi ***Birayên Misilman*** û konferansên wan ên li ser erdên Tirkiyê nayînin. (2)

Dewra Tirkiyê û hukûmeta **Erdogan** mixabin divê weke pir neerênî were nirxandin. Tirkiye li ser alaya xwe neyekser jî be, hê jî, kêm û zêde, weha dinivîse: *"Em ê li seranserê dinyayê li dijî hewldanên kurdan ên cudaxwazîyê şer bikin"*. Ji ber vê yekê nabe ku kurd kêlîyeke bi tenê jî vê dewra xiraker û hilweşîner a Enqerê piçûk û kêm bibînin. Maneya vê yeke helbet ne ew e ku mirov bi Tirkiyê re li hev neke –Tirkiye cîraneke girîng e û wê wisa jî bimîne. Lê belê her dilsafîtî, nexasim jî di siyaseta dinyayê de, dikare ji bo kesên pêwendîdar bibe sedema encamên felaket û bobelatê.
Di vê çarçoveyê de ez hez dikim behsa mînakekê bikim: Di 20ê tîrmehê de min hevpeyvînek bi **Meşal Temo** re xwend. Temo demekê di girtîgehê de mabû.

GfbV (Gesellschaft für bedrohte Völker) ji bo wî kampanyayeke navneteweyî dabû dest pê kirin û vê yekê jî kiribû Temo were berdan. Di vê hevpeyvîna xwe de bi min weha xuya bû ku Temo ev dewra dijminane ya Tirkiyê ji bo deqîqeyekê ji bîr kiriye. (3) Cihê kêfxweşîyê ye, min saetekê paşê xwend ku hevalê me **Meşal Temo** daxuyanîyek daye û vekişîna rêxistina xwe ji "Konferansa Stenbolê" ragihandiye. (4)

Em dibînin ku siyasetvanên kurd der barê pirsa hevkarîyeke din a bi Birayên Misilman re, guftûgoyeke piralî dimeşînin. Li vir a girîng ew e ku kurd bi hevgirtî derkevin meydanê. Ji hev parçebûneke kurdan li dijî doza kurdan e û divê ev yek di nav kurdan fikra hevpar be. Ji tecrûbeya başûr û bakurê Kurdistanê divê ders werin girtin. (5)

Yek yek kurdên li surgûnê timî inîsîyatîfê digirin dest û komên nû yên siyasî dadimezrînin. Divê timî bi awayekî erênî li vê were nêrîn. Ku komên kurd xwedî fikrên cihê bin, ev yek pêşveçûneke erênî ye. Lê belê divê ev kom li dijî hev *"ji bo man û nemanê"* şer nekin. (6) Dibe ku muxalefeta ereb karibe ji bin barekî bi vî rengî rabe, lê kurd nikarin. Kurd hê li destpêka rêya xwe ne, ew dixwazin ji xwe re li Sûrî statûyekê bi destûra bingehîn misoger bikin. Ereban ev yek jixwe bi dest xistiye.

Di 14ê gulana 2011ê de rêxistinên kurdan hevgirtinek ava kir. (7) Hema hema tevahîya partîyên kurdan cihê xwe di vê hevgirtinê de girtin. Lê belê mixabin hevgirtin bi tenê li ser kaxetê ma. Dîsa jî ev hevgirtin li ser rêya rast gavek bû. Daxwazên wan jî para bêtir ji alîyê kurdan jî dihatin qebûl kirin û destek kirin. Rêxistinên kurd heke xebatên vê hevgirtinê ji nû ve çalak bikin, wê karekî baş bikin.

Destpêka raperîna li Sûrîyeyê kurd bi awayekî vekirî ji raya giştî re, daxwazên xwe îfade kiribûn:

1 Tavilê destberdana ji şideta li dijî xwepêşandêran û destûrdana xwepêşandanên aştîyane;

2 Pêkanîna qanûna nîsana 2011ê ya ku rewşa awarte ya ji sala 1963yê ve bi dawî dikir; betalkirina tevahîya dadgeh û qanûnên taybet; berdana tevahîya girtîyên siyasî;

3 Dawîlêanîna tevahîya tedbîrên diskrîmînasyona kurdan û betalkirina tevahîya giştîname û fermanên nepenî yên der barê kurdan de; li gor di adara 2011ê de hat ragihandin, bi lez û bez pêkanîna welatîkirina qederê 300.000 ne-welatîyên qeydkirî (ecnebî) û herweha ne-welatîyên neqeydkirî (maktumîn); dawîlêanîna paşvehiştina herêmên kurdan û wekhevkirina bi herêmên din re;

4 Pêkanîna konferanseke neteweyî ji bo sêwirandina destûreke bingehîn a nû ku wê ji bo erêkirinê bikeve dengdana gelê Sûrîyeyê. Ev destûr divê mafên neteweyî yên kurdan, herweha mafên çandî yên hindikahîyên etnîk û dînî yên weke asûrî-aramîyên li Sûrîyeyê û azadîya bawerîyan a bêkêmasî misoger bike.

Di dema xwepêşandanên girseyî de ku hema hema her hefte roja înê pêk tên, rejîm li herêmên ereb ên welêt bi xedarîyeke mezin bi ser xwepêşandarên dijberên rejîmê de diçe. Li herêmên kurd ên li bakurê welêt seranserî sînorê bi Tirkiyê re, rejîm bi qasî ku mirovan matmayî bihêle, bi tedbîr e û dest tê wernade. Tevî ku her hefte xwepêşandanên protestoyî hene, li herêmên kurdan heta niha hema hema tu zirar û mexdûrîyeta kurdan çênebûye.
Çawa ku berê jî hate gotin, rejîma Beşar el-Esed hezîrana 2011ê hin tawîz dan kurdên li bakurê welêt, Meşal Temo û Mustafa Îsmaîl jî di nav de hin siyasetvanên kurd jî destpêka hezîranê ve tên berdan.

Bi berdana siyasetvanên kurd, rejîma Şamê dixwaze bi awayekî zelal kurd û erebên muxalif ji hev veqetîne. Hukûmeta Sûrîyeyê dîyalogek jî pêşniyarî kurdan kir. Lê belê ev pêşniyar ji alîyê kurdan ve bi yek dengî hate red kirin. Rêxistinên kurdan di daxuyanîyeke di 14ê gulana 2011ê de didin zanîn ku berîya dîyalogekê divê rejîm muameleya xwe ya bêeman a bi xwepêşandarên aştîyane re bi dawî bike.

Meşal Temo di tebaxa 2008ê de li bajarê bakurê Sûrîyeyê Eyn el-Erebê ji alîyê dewrîyeyeke rêxistina îstîxbaratê ve hatibû revandin. Der barê cihê lê de bi hefteyan tu agahî nedan xizmên wî. Piştî ku **GfbV** (Gesellschaft für bedrohte Völker) bi tika û ricayê serî li sefaretên dewletên demokratîk ên li Şamê da, rayedarên Sûrî hê nû eşkere kirin ka parêzvanê mafê mirovan li ku girtî ye. Demeke kurt paşê ew derxistin pêşberî dadgehê û bi bahaneya qaşo "ruhê netewe lawaz kiriye" sê sal û nîv ceza lê hate birîn.

Piştî ku hêzên ewlekarîyê ew 12ê kanûna 2009ê li Helebê girtin, parêzerê kurd **Mustefa Îsmaîl** diviyabû sal û nîvê di girtîgehê de bimîne. Temo û Îsmaîl piştî berdana xwe bi rêya telefonê şexsî malavahîya **GfbV** (Gesellschaft für bedrohte Völker) û her kesê din kirin ên ku di van salên dawîyê de ji bo berdana wan xebitîne.

Di 25ê çileyê 2011ê de stranbêjê kurd **Bavê Salih** hat girtin. Stranbêjê ku bi awayekî birêkûpêk di çalakîyên girseyî de derdikete ser dikê, ne endamê rêxistin û partîyeke siyasî ye. Hunermend bi salan e bi rêya komkirin û qeydkirina stranên gelêrî yên kurdan, ji bo parastin û pêşdebirina zimanê kurdî dixebite. Piştî kampanyayeke li seranserê dinyayê, ya ku GfbV daye dest pê kirin, Bavê Salih di 5ê adara 2011ê de hat berdan.

www.kurdishdiplo.org

"Guleyan tirs kuşt"

Li Sûrîyeyê rojên dijwar

Alain Gresh *

Pevçûnên navbera sunî û elewiyan li Humisê tengezariyên olî û rîskên şerekî navxweyî raxistin pêş çavan. Li gel vê yekê jî, piraniya xwepêşandanan rê nadin van tiştan û demokrasiyê dixwazin. Desthilat piştrast dike ku ew reformên kûr dixwaze lê belê îtîbara wê ji ber dijwariya zextan pir daketiye.

Di tebaxa 2010ê de çalakvanê mafê mirovan ê elman-sûriyeyî **Îsmaîl Ebdî** hat girtin. Wî tevî malbata xwe betlanê li Sûrîyeyê derbas kiribû û dixwest ji welêt derkeve. Gelek mehan xizmên wî pê nizanîbûn ka ew li ku girtî ye. Dihat xwestin ku li gor xalên 287 û 278 ên qanûna ceza ya Sûrîyeyê ceza lê were birîn. Di vê navberê de Ebdî hat berdan, lê belê nikare Sûrîyeyê biterikîne.

Asûrî-Aramîyên xirîstîyan jî mexdûr in

Di 20ê gulana 2011ê, piştî xwepêşandaneke aştîyane ya li bajarê Qamişloyê ku tevahîya şênîyên bajêr ên asûrî (suryoyê), kurd û ereb tevlî bûn, komeke ji Midûriyeta Ewlekarîyê ya bajêr ku ji 20 zilamên bi sîlehan baş pêçayî pêk dihat, êriş bire ser buroya Rêxistina Asûrîyan a Demokratîk (RAD). Di encamê de bi hênceta endamekî ciwan ê vê rêxistinê tevlî vê xwepêşandanê bûye, di nav de çar endamên birêveber jî 13 endamên rêxistinê hatin girtin. Piştî ku endamên rêxistinê bi devereke nediyar ve birin, yekîneyên polîsan vegeriyan buroya navendî ya rêxistinê ya li taxa "El-Wasta"yê û careke din bi ser buroyê de girtin û beşeke mezin a malzemeyên li buroyê texrîb û desteser kirin. Asûrîyên girtî çend roj paşê hatin berdan.

Di îlona 2010ê de jî du ciwanên xirîstîyan ên asûrî/aramî **Gabrîyel Îsa Îskender** û **Nahir Henna** ji ber ku di konserekê de ala asûrî li ba kirine û bi vê jî qaşo xala 307ê ya qanûna ceza ya Sûrîyeyê binpê kirine (sorkirina kîna etnîk û dînî), ji alîyê Rêxistina Îstîxbaratê ya Sûrî ve hatin girtin. Ev îdîa absurd xuya dike, lewra li gor huqûqa Sûrîyeyê, sembolên neteweyî yên asûrî-aramî li Sûrîyeyê ne qedexe ne. Tevî ku endamê Neteweyên Yekbûyî ye jî, Sûrîye rêzê ji Danezana Mafê Mirovan re nagire. Hukûmeta welêt sereqet û misêwa peymanên navneteweyî bin pê dike, yên weke Peymana li Dijî Êşkencê ya Neteweyên Yekbûyî ku parlemana Sûrîyeyê sala 2004ê erê kiribû. Ne mafên li gor peymana navneteweyî yên welatî û siyasî, ne jî mafên li gor peymana navneteweyî yên aborî, civakî û çandî yên welatîyên Sûrîyeyê nayên dayîn.

Encam

Kurd, alewî, asûrî-aramî, ermenî, durzî, îsmaîlî, demokratên ereb, mislimanên rohnîbûyî, kurdên êzdî divê ji niha ve hevgirtineke xurt pêk bînin. Bêyî vê hevgirtinê, bi alîkarîya Erebistana Suûdî, Tirkiyê û mumkin e bi ya Îran û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Birayên Misilman ên tundrew bibin desthilatdar û ew ê bixwazin ku êdî tu caran desthilatdarîyê ji dest nedin. Îhtîmal e ku hevgirtineke kirêt û nepîroz pêk were nexasim jî li dijî kurdan. Ji ber vê yekê divê kurd û demokrat tev, kirinên Tirkiyê yên li Sûrîyeyê ji nêz ve bişopînin. Tecrûbe û ezmûnên li Afganistan û Îranê baş nîşan didin ku rojava pir bi lez dikare bi îslamîstan re li hev bike. Tiştekî bi vî rengî wê ji bo hindikahîyan û demokrasîya li Sûrîyeyê bibe metirsîyeke kujer.

* Raportorê Rojhilata Nêzîk ê *Civaka ji bo Gelên di Tehlûkeyê de* - Gesellschaft für bedrohte Völker (GfbV)

1 http://www.kurdwatch.org/newsletter/newsletter_de_200711.html, bi elmanî ye

2 Zara Misto: http://www.gemyakurda.net/modules.php?name=News&file=article&sid=47046, bi elmanî ye

3 Kurdwach, 20.07.11, bi elmanî ye

4 http://www.kurdwatch.org/index?aid=1804, bi elmanî ye

5 Yahya Silo: http://www.efrin.net/cms/erebi/index.php?option=com_content&task=view&id=8154&Itemid=29, bi erebî ye

6 http://www.pdpks.com/ppp/?p=9254, bi erebî ye

7 Kurdwach, 20. Juni 2011, bi elmanî ye

Wergera ji almanî: Luqman Guldivê

Hema ne Sûrîye hemû ye. Ev bajarê ku pênc sed hezar nişstecîyên wî hene, ji serxwebûna 1946ê heta niha serî dananîye, piştî serîhildana ***Birayên Misilman*** a di 1982yê de di bin bomban de pelixî, ji wê demê de vederkirî, ji dema serîhildanên di adarê de bûye navenda bala giştî. Serokwezîrê tirk **Recep Tayyip Erdogan** ji bo tevkujîyeke weke ya 1982yê dubare nebe çavê xwe ji Şamê naniqîne. Hemî medyayên navneteweyî li pey paşgotinên ku qet nayên hişê mirov dibezin –û bêyî ku piştrast bikin, li ser vî bajarê ku bûye sembol radighînin û belav dikin.

Gîhaştina bajarê ku bi 200 kîlometreyan dûrî Şamê ye û li bakurê wê dikeve, bi otorîyeke baş parastî û lêxwedîderketî, ji texmîna me hîn jî hêsantir bû. Nuqteyeke bitenê ya kontrolê ya artêşê ketina bajarê diparêze. Li taxên derûdorê, nîvduzîne zirxpoş li ser piyarêyan veşartî ne.

Hama vala bûye. Çend taksî bi malbatên ku bajar bi cî dihiştin, barkirî ne. Tirimbêla me diviya wek yên pêşbazîyê di navbera astengên li serê her riyekê kom bûbûn de biçûna û bihatana: Kevirên piyarêkan, gulîyên daran, baqoqên keviran, gelaş... Li vir, otobusek şewitîye; li wê, skeleta erebeyekê. Ev barîkadên jihevdeketî bi mebesta astengkirina ketineke nepayî ya hêzên artêşê ya nav vî bajarê *"azadkirî"* hatine çê kirin. Li ser rûyê nivînan sloganên bikurtebirî hatine nivîsîn diqîrin: *"Gel doza hilweşîna rejîmê dike!", "Dê 1982 dubare nebe!"* û hwd.

Tirimbêla me hate rawestandin û divê em derdê xwe ji xortên ku derbasbûnê kontrol dikin re bêjin. Yek ji wan xwe digihîne me ji bo ku di labîrentên kolan û kolanokan de rêberîya me bike û astengên li pêşîya me bide alî. Rawesta yekê: Em dan rûniştin, li dora me kom bûn, bersiva pirsên me didin. Bi dehan mirov dikevin nav xeberdanê, pirsan ji me dikin. Hin ji wan wêneyên ''şehîdan'' (yê birayekî, pismamekî, dostekî) tînin an jî sehneyên li ser telefonên xwe tomarkirî nîşan didin; zehmet e ku dilê mirov xwe li hin ji wan ragire –mêjîyê belavkirî, serîyê pelixandî... Li gor mirovekî wêneyek du termên ji alîyê tankekê ve pelçiqî nîşan dide. Lê yê tenîşta wî dibêje: "*Na, na, ji alîyê tirimbêleke mezin ve: Li şopa wê binêrin*".

Gel doza hilweşîna rejîmê dike!

Gelo çima rê vala ne? Ji xeynî rojên xwepêşandanan, ango roja înê, her kes li mala xwe rûdinê, kesek ji hundir dernakeve. Ji bo mêran, dora nobetê heye, hinek bi şevê radizên, hinek bi rojê. Ji jinan, weke gelek nişstecîyên ku ji dubarebûneke wek ya 1982yê ditirsin, hinan malên xwe bi cî hiştine, çûne. Û ev otobusa şewitî çi ye? *"hêzên asayişê agir pê xistine û dixwazin berpirsiyarîya wê bixin stûyê me. Îdia dikin ku em dixwazin mîrekîyeke îslamî ava bikin; ji bo me tawanbar bikin li riyekê digerin ku çekan di mizgevtan de veşêrin".*

"Şoreşa me silmî [aşitî] ye": Çeka herî baş ya xwepêşanderan, ji Misrê heta Bahreynê û ji wê jî heta bigihê Yemenê ew e. Ger ev darê qeşmerîyê jî nebûna, tu kesekî ku em li wan rast hatin ne çekdar bû. Herçend li hin herêmên din, komên çekdar ên neheqîyê dikin, ji alî "şervanên ereb" ên ji Libnanê yan Iraqê ve hatî, yan ji ber kîna herêmî ya li dijî zabit û leşkeran tê zanîn, bên teqwîye kirin jî, tiştên wiha zêde naqewimin. Belavokeke ku di 1ê hezîranê de li ***Hama***yê hatiye belav kirin, talîmatên deqîq dide xwepêşanderan: Xwe ji her cûre tevlîhevîyê biparêzin; rêza avayîyên giştî bigirin; xwe ragirin, çêrî hêzên asayişê mekin û wan tehrîk mekin. "*Em li dijî zilm û zorê derdikevin, em naxwazin zilm û zorê li kesî bikin*".

Kî ne kesên ku li dora me kom bûne? Yek xwedî dîploma fîlozofîyê, yê din doktor û yê sêyê jî endazyar e. Hemî jî piştrast dikin ku hatina rejimeke "medenî" dixwazin û berîya her tiştî, dawîlêanîna kêyfiyetê û heqaretê, herwiha jî rêza heysiyet û rûmeta (kerema) xwe dixwazin. "*Dikarin her tiştê me ji me bistînin, lê* kerema *me na*". Tecrûbeya girtinan, li gel para miameleya nebaş û êşkencê, bîranîneke trawmatîzeker li pey xwe hiştiye. Yek ji wan diqîre, "*me biryara xwe daye ku em ê careke din piyê xwe navêjin zindanê. Li ber me bitenê tercîha di navbera goristanê û azadîyê de maye*". Bi sedan zindanîyên siyasî li Hemayê hene, jimara wan a seranserê welatî di navbera deh ta panzdeh hezaran de ye. Tevî ku gotûbêja me ya dûvdirêj berdewam dikir jî, du xortan ji dil û rizaya xwe ji kolanan gelaş berhev dikirin.

Yek ji berpirsan hinekî şahidî û gilîyên pir ên di ser hev re difirîyan, rêkûpêk kir, xiste rêze; ew li vir, ji destpêka rûdanên li Suriyê li pey tevgera bûyeran e. Hîn jî ji ber xeyaleta 1982yê tevizî û behitiye, berîya ku xwe bigihîne tevgerê, **Hama**yê gelekî wextê wî stend. Di dawîya nîsanê de, xwepêşandanên destpêkê, mirinên pêşîn; lê dîsa jî ji bo wî gotûbêj mimkun e. "*Delegasyonek ji bajêr, di 11ê gulanê de, bi serok **Bişar Esed** re hevdîtinek pêk anî. Wî soz da me ku dê berpirsên kuştinan bên dadgeh kirin û dê artêş nekeve nav bajêr. Lê piştî wê, bûyera 3yê hezîranê pêk hat*".

Ji ber germîyeke li dora 45 derecan, em li ber siyekê rûniştine, li şahidîyên, ku carinan di kitekitan de ji hev cihê dibin, lê di bingehê xwe de dîsa digihin hev guhdarî dikin. Di 3yê hezîranê de, "roja zarokên azadîyê", bi hezaran xwepêşanderên aşitîxwaz dadikevin kolanê, çekên wan kulîlk in ku dixwazin diyarî leşker û zabitan bikin. Gule bersiva kulîlkan didin. Di navbera 150 û 230ê de kuştî tên jimartin. "*Tevî vê jî, mixetabê me gotina xwe didomîne, piştî sê rojan me qebûl kir ku em serok bîbînin. Careke din soz da me ku dê tawanbaran ceza bike û berpirsê hêzên serkutkirinê, **Muhamed Muflih**, ji bo lêpirsîne vexwend Şamê*".

Vegotinên kîndar ên ji aliyê pêşengan ve hatine berteref kirin

Piştî vê bûyerê, bi vekişiyana hêzên çekdar kurtedemek aram derbas bû. Heta xwepêşandana pir mezin a îna 1ê tîrmehê –heyştsed hezar, li gor hin medyayan (car û nîvekê li jimara nifûsa bajêr!), bêgûman ya rastir dused hezar e; li gor îfadeya rojnamevanekî nêzîkî desthilatê jimara xwepêşanderan heftê hezar bû. Rejim şerpeze bû, walîyê alîgirê îdareyeke aşitîyane **Ahmed Ebdilezîz** ji kar avêt, û li şûna wî piştî ku ew terfî kir zabitê eskerî **Muflih** wezîfedar kir. Gava ku 4ê tîrmehê roja duşemê û 5ê wê, roja sêşemê, hêzên asayîşê xwestin bikevin nav bajêr, bi dehan mirov girtin û çar ji wan kuştin, her kes li benda êrişeke giştî bû. "Me ew bi şûn de vegerandin. Di 7ê tîrmehê de, hatina balyozên amerîkî û fransî jî alîkarîya me kir ku em lîstika wan xera bikin". Êdî bawerîya me nema bi rejimê tê. "Serok, du caran di axavtinên xwe de, piştrastkir ku artêş dê guleyan bera xelkê nede. Walîyê bi tenê yê ku fermanên wî cîbicî dikir, ji kar hate avêtin! Ji niha û pê ve, em hilweşina rejimê dixwazin".

Çariyaneke din, hevdîtinên din, bi heman çîrokên erjeng ku pirçûnekan bi canê mirov dixin, heman banga ku rayagiştî ya navneteweyî ji binî ve dihejîne –û heman reda her cûre midaxeleya eskerî ya bîyanî–, heman mêvanperwerî: Em zûka ji ser tabûreyên xwe radibin ku li ser qoltixên xwe bi cîh bibin, vexwarinê, sandewîçan û heta kulîlkan pêşkêşî me dikin. *"Em ne salafîstên tûnd û tuj in, yek ji mêvandarê me dibêje, em alîgirên îslameke "tam di nîvî de" ne".*

Helbet, bajar pir mihafezekar e, lê em piştrast dikin ku em vekirî ne, bi taybetî jî beramber hindikahîya xiristîyan. "*Em weke tilîyên yek destî bitenê ne*". Xiristîyanekî şifêrê kamyonê dibêje: "*Xortên ku hûn dibînin weke zarokên min in, ew ji min re dibêjin apo*". Lê helwêsta hîyerarşîyê piştgirîya birêvebiran dikin? "*Mirovên dîndar li ser tiştên dînî xwedî otorîte ne, ne li ser siyasetê. Di malbata min de gelek meylên siyasî yên cihê bi hev re dijîn û ev ne karê dêrê ye ku vê pirsê çareser bike*".

Ev nêrin hinekî jî saf û utopîk e; gotarên kîndar weke darê bin ebê li navê diçin û tên, bi taybetî jî li dijî elewîyan (piranîya birêvebiran ji hindikahîya mezhebê şiî derketine), lê ew bi belavokên koordînasyonê hatine îxbar kirin, li vir ji wan re, tensîqiyat dibêjin.

Roja berê, li taxa xiristîyanan ***Bab Tûma*** ya li Şamê, ji bo piştgirîya serok **Bişar Esed** bi hezaran kes li dora sahneyekê û komeke muzîkê civiyan. Gelek xort, keç û law tevlîhev, tîşortên resmê wî li ser, alaya sûrî li xwe pêçayî distiran, govend digirtin û diqîriyan. Xiristîyanên, ku bi sed hezaran hevayînên xwe yên iraqî ku xwe avêtin bextê Sûrîyeyê dîtin, ji siberoja xwe tirsiyan. Flamayeke ji alî mirovekî karmend ve hatibû dîyarî kirin, "derewên El-Cezîre, El-Erebîye û hevkarên wan" rûreş dikir. Ev her du kanalên ezmanî ku yek ji alîyê Qeterê ve û ya din jî ji alîyê Erebistana Siûdî ve tên fînanse kirin, bi belavkirina nûçeyên alîgir, nepiştrastkirî û xwe kirina aletê hilweşandina rejimê tên tawanbar kirin. Ev nêrîn bi tevayî ne şaş e, lê rêlibergirtina agahdarîyê ya ku Şamê li ser rojnamevanên bîyanî ferz kiriye, belavbûna hemî kurtepistan hêsan dike. Rejimê heta rojnameya libnanî ***El-Exbar*** qedexe kiriye, ku wê her dem piştgirîya Şamê û Hizbûlahê li hember Îsraîlê dikir, lê wê kuştin rûreş dikirin.

Pêşîya Gara Hîcazê tîne bîra mirov ku, di 1908ê de, Împaratorîya Osmanî xeteke riya hesinî di navbera ***Şam*** û ***Medîne***yê de ava kiriye. Li pêşîya vê avahîyê, bihezaran kes seredana balyozê amerîkî ya ***Hama***yê, midaxeleya rojavayîyan a karê navxwe yê Sûrîyeyê protesto dikin. Vê roja bêhnvedanê, ev xort ne karmend, ne jî xwendekarên ku ji bo xwepeşandanê zor li wan hatibe kirin in. Her çend ji hev belav bibin jî, lê xwiya ye dîsa jî piştgirên rejimê hene (1): Beşek ji hindikahîyan; burjuwa, sunîyên ku bi dehan salan bi saya rêlibervekirina aborî dewlemend bûne jî di nav de, ditirsin ku desthilat bikeve destê îslamîyan. Heta niha, ne Şamê (ku xwepêşandan bêtir li taxên dorûberên wê pir dibin), ne jî Helebê birastî xwe tev dane. Bi awayekî paradoksî, herêmên hejar in, ku mirov li wan seferber dibin: Dera yek ji wan e, –Partîya Baas a li ser desthilatê hêza xwe di salên 1960 û 1970yê de ji herêmên weke wê digirt– ku ji ber îhmalkarîya deh salên dawîn rabû ser piryan.

Şam hatiye guhertin. Bi sedan dezgeh li ser peyarêkan bi cîh bûne, û kesek newêre wan ji cîyên wan rake, tirimbêl bi xîj û xar derbas dibin, sînorê bezê derbas dikin; avayî bêdestûr bilind dibin. Polîs ji xwe re karê din dike û ji ber tirsa ku dê heq û hiqûq nemîne –kampanyayeke reklamê gazî hevwelatîyan dike: *"Çi Mezin û çi biçûk, ez rêza qanûnê digrim" "çi xweşbîn û çi reşbîn, ez rêza qanûnê digrim".*

Yek ji mixetabên me dibêje: ***"Guleyan tirs kuşt".*** Êvara "roja giran", bêyî ku ji kesên li dora xwe fikarê bikin, şeş heft mixalif li dora maseyekê dicivin û xeber didin. Her yek ji wan dizane ku sibê dikarin bên girtin, lê her weke partîyên qedexekirî, êdî rewşenbîr jî bêtirs û serbest tevdigerin. Gelo divê ku mirov beşdarî gotûbêja neteweyî ya ku dê sibê dest pê bike û biryara wê ji alî hikûmetê ve hatiye dayin, bibe? Piranîya wan bi awayekî vekirî li dij in, lê yek ji wan dixwaze beşdar bibe, "*ji bo dengê xwe bighînim wan*". Yekî din dipirse; "*Heke di fîliyatê de tiştek neguhere, gotûbêja li ser qanûna nû dê bi kêrî çi bê? Gelo bi rastî jî pêdivî bi mewzûatekeke nû heye, ku ji niha ve, rê bide tevgera azad a partîyan an ji kesên serbixwe bixwazin ku yek ji her sê rojnameyên "fermî" bi rê ve bibin?*" (2) Yê sêyem pirsa efûyê tîne rojevê: *"Ez hatim zindan kirin, tevî qanûna yekê ya efûyê û tevî ku tawanbarîya min a serekî dana daxuyanîyekê ji bo televizyoneke bîyanî bû jî, ez nehatim berdan. Destûr êşkencê qedexe dike, lê tevî vê jî bi awayekî giştî û rojane êşkence tê kirin".*

"Kolan" hêmana esasî ya şoreşa me ye

Gotûbêja neteweyî ya ku ji alî hemî mixalefetê ve hatibû boykot kirin, bi awayekî zindî ji alî televizyona dewletê ve hate weşandin. Cara yekê bû ku di televizyona fermî de, sûrîyeyîyan didît gelek kes gilîyê "tercîhên ewlekarîyê", û ji bo suistimalkirina vatinîyên xwe gilîyê polîs û milîsên ***Şabîha*** dikin, ku ya dawîn bi piranî ji tawanbaran pêk tê û tirsê dixin dilê xelkê. Rejim bi îdiaya komployeke bîyanî, dixwaze xwe pak bike. Heke mirov ne saf be, dê zanibe ku lawazkirin an jî hilweşandina rejimê yek ji armancên Dewletên Yekbûyî, Îsraîl, Erebîstana Siûdî û hêzên rastgir ên Libnanê ye jî. (3) Lê krîz berî ya giştî ya navxweyî ye û çareserîyeke navxweyî dixwaze.

Ji bo **Michel Kilo**, mixalifê demeke dirêj ê ku gelek salên xwe di zindanê de derbas kirine, derbasbûnek xwe li ser me ferz dike, ku bitenê dikare bi du mercan dest pê bike: *"Rawestandina pêkutîyê bi awayekî fîilî, beşdarîya **kolanê,** koordînasyonên ku li her taxekê û bajarekî berxwedanê bi rêk dixin. **Kolan** aktora rasteqîn a şoreşa me ye, lê partîyên mixalefetê yan kesayetî êdî nema nûnerayetîya xelkê dikin".*

Ka em niha gazî **Ferîda**yê bikin. Ew hîn ciwan e, xwedî dîplome ye jî, tevî vê jî hinekî esebî ye –polîs lê digere–, lê hêvîya wê ji siberojê heye. Ew beşdarî birêvebirîya giştî ya koordînasyonan dibe, ku helwêst û kiryarên xwe bi hev re, bi saya Înternetê organîze dikin. "*Em naxwazin bibine partîyeke siyasî. Rola me ew e ku em li qada têkoşînê amade bin, sloganan û nêrînan bikin yek, xebata agahdarîyê pêş bixin. Em bi xebata bi hev re, ji pêşhukman wê de hîn dibin ku hev nas bikin. Her kes bi awayekî metirsî hêvîyên xwe rave dike. Yek ji birayên misilman, yek laîk, yekî din neteweperestê ereb e, lê hemî jî heman tiştî dixwazin: Dewleteke sîvîl. Û hemî jî, şidetê red dikin*". Xanim axaftina xwe wiha bidawî tîne: *"Meha tebaxê, remezan e, meha herî pîroz e ji bo misilmanan. Û bi dirêjîya vê mehê, her êvar diayên giştî hene, her roj dê bibe în".*

* Peyamnêrê Le Monde diplomatique

1 Şirovekirina herî baş a krîza Sûrîyeyê û aktorên wê yên cuda di du raporan de ku, di tîrmeha 2011ê de, ji alîyê *Koma Krîzê ya Navneteweyî* ve hatiye çap kirin, digihin hev "The Syrian people's slow motion revolution" et "The Syrian regime's slow-motion suicide", http://www.crisisgroup.org

2 El-Baas, rojnameya partîya ***Baas***ê, rojnameya ***Tişrîn*** ya hikûmetê ye û ***El-Sewre***. Rojnameyeke din, ***El-Weten***, ya **Ramî Mexlûf**, pismamê serok, yek ji merivên herî dewlemend û herî kîndar ê welêt e

3 Bi awayekî paradoks, partîyeke rastgir a xiristîyan metirsîya gelek xiristîyanên suriyeyî par vedike û êrişkirina ser rejima **Şam**ê red dike

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

Peyvên Întîfadaya Sûrîyeyê

Zénobie *

Eynî weke berxwedanên neteweyî yên ereb li Sûrîyeyê yên pêvajoya sedsala XXemîn, îro jî rola mizgeftan a livandina civakê, rola motor a ciwanan, rola derdorên civakî yên ji alîyê aborî ve şerpeze û yên dûrî paytext û ya beşdarîya jinan mora xwe li serhildanê didin.

Şênîyên ***Deraa***yê di 18ê adara îsal de bi taybetî bi slogana *"Mafî xewf baad el-yewm!"* [*Ji îro şûn de tirs tune!*], dengên xwe bilind dikirin. Li demeke ku zextûzor dijwartir dibû, xwepêşandêran zincîrên tirsê dişikandin: Li gelek bajaran, digotin ku ew ji bo mirinê jî amade ne: *"Hêê Banias xweragire,* (1) *azadî hêjayî* [jîyana] *mirovan e"*; *"Bi milyonan şehîd wê biçin buhuştê"*; *"Ji Xwedê pêve xwedayekî din tuneye û şehîd ezîz in ji bo Xwedê"*. Mijara şehîd careke din dikeve rojeva hemû herêman û di vê diruşmeya navdar a ***Rojhilata Navîn*** de xwe dide der: *"Bi can, bi xwîn em ê xwe ji bo te feda bikin ey şehîd" ("Bi-ruh bi-dem, nafdîk ya şehîd")*. Ev form herwiha bi armanca destnîşankirina piştevanîya ji bo bajarekî ku tê de bi sedan kes jîyana xwe ji dest dan jî, dikare were bi kar anîn, mesela: *"Bi can, bi xwîn em ê xwe ji bo te feda bikin ey Deraa"*.

Ji 15ê adarê ve, daxwaza azadîyê di her xwepêşandanê de xwe dide der û diruşmeyeke rejîmê vediguherîne: *"Xwedê, Sûrîyeyê, Beşar û ne tiştekî din"* dibe *"Xwedê, Sûrîyeyê, azadî û ne tiştekî din!"*. Li welatekî ku ji 1963yê ve di nav rewşa awarte de dijî, azadî bi demokrasîya siyasî re têkildar e: *"Em azadîyê û hilbijartinên demokratîk dixwazin"*. Azadî cudahîyên mezhebî jî li pey xwe dihêle: *"Azadî, azadî, çi misilman an jî xiristîyan ji bo herkesî!"*; *"Em alîgirên azadî û aştîyê ne"*.

"Bi aştîyane, bi aştîyane, misilman û xiristîyan, bi aştîyane, bi aştîyane, na, na ji mezhepgirîyê re na!"

Diruşmeya dawî ya nivîskî derbarê rûmeta mirov û hemwelatî de ye. Dengekî bi hêrs berbelav dibe: *"Nabe ku heqaret li gelê sûrî were kirin". ("El şaab el sûrî ma byandhal")*. Şehîd dawî li piçûkxistinan tîne û mirov careke din digihîje fezîletên mirovî û bawermendîyê, mirov digihîje fazîletên bi awayekî dîrokî li perestgehên lehengên neteweyî yên sûrî û yên kesên pîroz bicih bûne: *"Xwezî bi mirinê, ne bi jîyaneke rezîlî" ("El mewt we lâ-l-madhalleh")*. Di destpêka Întîfadayê, di dema şevbiwêrkên malbatî an jî nas û dostan de ne kêm caran dihat bihîstin ku alîgirên dijberîyê bi van gotinan silav didan her kesekî ku ji ***Deraa***yê an jî ji wê herêmê dihat: *"We serê me careke din ji ber me rakir"* –ango: *"We rûmeta me li me vegerand" ("Rafa'tu-l-na ra'sna")*. Kolan herwiha bersivê dide tawanbarîyên parçekarîyê, şidetê û komployê. Kolan dilbijîna xwe ya ji bo aştîyê, yekîtîyê û dijberîya xwe ya li hemberî mezhepgirîyê tîne ziman: *"Yek, yek, gelê Suriyê yek e!"*; *"Bi aştîyane, bi aştîyane, misilman û xiristîyan, bi aştîyane, bi aştîyane, na, na ji mezhepgirîyê re na!"*; *"Na ji şidetê re, na ji xwînrêjîyê re!"*. Li herêmên ku provokasyonên navxweyî rû dan, diruşme û pankart vê bersivê didin: *"Sunî, kurd, elewî, em giş dixwazin yekîtîya neteweyî" ("Sunnî we kurdî we 'elawiyye, bidne wahdeh wetaniyyeh")*. Tirsa ku deshilat dixwaze li nav hindikahîyan (xirîstîyan, elewî û herwekî din) berbelav bike, xwe dispêre sûcbarîya ku li gor wê ev serhildan ji alîyê îslamîstan ve hatiye sor kirin.

Lê belê xwepêşandêr vê îdîayê jî bê bersiv nahêlin: *"Ne salafîst, ne Birayên* [misilman], *bijî mirovên wêrek!"*; *"Ereb û kurd bûne yek li dijî salafîzmê"*; *"Serhildana me serhildana ciwanan e, ne ya salafîzm, ne jî ya terorîzmê ye"*; *"Ne Amerîka, ne Îran, bihêlin em bi hev re di nav aştîyê de bijîn"*. Eger gotin li cih be, mirov herwiha hin bersivên sentez jî dibihîze: *"Em ne Birayên* [misilman] *in, ne ajanên bîyanî ne, em hemû ji Sûrîyeyê ne, em misilman, elewî, durzî û xiristîyan in" ("Nahna ma 'anna ikhwân wa lâ aydî kharijiyya, nahna kullna suriyya, islam wa 'alawiyya, durziyya wa masihiyya")*. Li rojên pêşî yên serhildanê, xwepêşandêr û çalakgeran bi daxwazkirina reforman û dawîlêanîna rewşa awarte xwe sînordar dikirin. Serok **Beşar El Esed** hê jî ji hinek sempatîya ji bo xwe, sûd werdigirt.(2) Sûriyeyî yên ku ji şerê sîvîl ên panzdeh salan ên li *Lubnana* cîran û herî dawî jî ên li *Îraqê* dersên xurt wergirtî, hertim xwe averê dikirin ji şerûpevçûneke dirêj û xwînrij a ku di navê de wê xetereya pevçûneke mezhebî jî hebûya. Lê belê rejîma *Baas* li *Deraa*yê zêde xwîn rijand û **El Esed** di gotara xwe ya pêşî ya ji bo netew a –pir dihat payîn– 30ê adara 2011ê de xwepêşandêr û çalakger piçûk xistin. Ji wir û şûn ve, slogana şoreşên tûnisî û misirî, *"Gel hilweşîna rejîmê dixwaze" ("El-şaab yûrid isqat el-nîzam")*, êdî li kolanan deng veda.

Ji ber terora berbelavbûyî ya polîsên deshilata *Baas* û dîsa ji ber kuştina hejmareke mezin a welatîyan, dengê kolanê bilindtir bû : *"Em ji te hez nakin, em ji te hez nakin, biqeştin herin, tu û partîya xwe"*. Nîsanê, diruşmeyeke din dîsa bi yekdengîyê li ser hemû zimanan bû: *"Xayîn ew kes e ku li gel dide". "Zenga, zenga, dar, dar, badna nchîlak ya Bachâr" – "Kolan bi kolan, mal bi mal, Beşar, em ê giş peyder pey xwe ji te rizgar bikin"*. Piştî êrişa hêzên ewlekarîyê ya li dijî mizgefta ***El Omerî***, ya şeva ku 16ê adarê bi 17ê adarê ve girê dida, qetilkirina dayîkekê û nevîya wê û revandina birîndarên penaber ên di avahîyeke olî de, cara pêşîyê ji ***Deraa***yê sloganên li dijî serok **Beşar** bilind bûn; hem jî berîya ku ev ê dawîyê dest bi axaftina xwe bike. Formula ku sloganê vedike *("Zenga, zenga, dar, dar")* bi awayekî îronîk balê dikşîne ser beşeke axaftineke serokê Lîbyayê **Muammer Qadafî**, a ji jenerîka kanala *El Cezîre* wergirtî, û ev axaftin bû eynî weke agirekî tu berdî barûdê, li hemû cîhana ereb berbelav bû... Axaftina duyem a **El Esed** a 16ê nîsanê, zêde dereng hat ji bo ku karibe bendê deyne ber pêlên serhildanên mezin, pêşî ji ber sedemê bêdengîya wî –ya li ser xala 8 a destûrnameya ku piştrast dike ku ***Baas*** partîya rêvebir e û ya li ser mijara azadkirina girtîyên siyasî.

Li alîyê din, dawîlêanîna rewşa awarte tu tişt neguhert. Dîsa bi awayekî kêfî bi hezaran kes hatin bin çav kirin û girtin û artêşê bi tankên bi zirx êrişên dijwar birin ser xwepêşandêran: *"Zordarî ji bo wan bûye weke kevneşopîyeke adetî, bi wê çendeyê ku ew vê yekê weke rêûresmekî dinirxînin"*, *"Wan ne bi tenê rûmeta me ji me stand, ew herwiha berdêla sextekarîyên xwe jî ji berîka me dertînin"*. Sûriyeyî tevî vê yekê, ji berê du qat zêdetir girêdana xwe ya bi "niştimana mezin" –(*"Bijî Sûriye û Bimre Beşar El Esed"*) û bi hevgirtina xwe ya xwecihî ve ("welatê piçûk") ve dest nîşan dikin. Her bajar bangî nîştecîyên xwe dike; eynî mîna kevneşopîya şerên mezin ên bedewîyan, li ser navê mêrxasîyê *(al-roujoula)*, li ser nirxê cewherî –bi fezîletê– bang li her têkoşerê ereb tê kirin: *"Tu li ku yî Deiri* [kesê ji Deir-ez-Zor]*? Tu li ku yî? Rabe ser xwe û çavên xwe kil ke"* – ji ber ku şervanên eşîran berîya diçûn şer çavên xwe kil dikirin. *"Hêê Barzeh,* (3) *em in xweşmêrên te, Xwedê vedinase xayînên te"*; *"Ev in xweşmêrên te, hêê Daraya* [bajarê li başûr-rojavayê Şamê]*"*.

Imtiyaz heta niha bi tenê dibûn para Partîya Baas an jî hin derdorên mezhebî, bi taybetî jî mezhepgirên elewî

Xwepêşandêrê ku ji bo welatê xwe mirinê bêminet dike, xwe feda dike û bajar û gundê xwe serbilind dike. Ev bajar û gund wê paşî bi hejmara "wêrekên" xwe, cihê xwe yê di dîroka welêt de bipîvin û tesbît bikin. Ev serhildan ne tenê siyasî ye; Ew di heman demê de şahidîya rewşeke aborî û civakî ya rizîyayî dike, ji ber ku xwepêşandêr bi koka xwe bi piranî kesên ji derdorên halnexweş û xizan in.

Dema li dijî sextekarî û rizînê helwêst tê danîn, li dijî tevnên nêzî rejîmê jî dijberî bi pêş dikeve. Daxwaza parvekirineke adiltir a dewlemendîyan û herwiha ya kar û wezîfeyan jî derdikeve pêş. Ev karûbar û rewşên bi imtiyaz heta niha bi tenê dibûn para Partîya Baas an jî hin derdorên mezhebî, bi taybetî jî mezhepgirên elewî û heta radeyekê jî dibûn para xiristîyanan. Rayedarekî fermî yê nexwest navê xwe bide, lê belê pir naskirî ji alîyê kesên ku ji her du kategorîyên bi îmtiyaz di yekê de jî cih nagirin, wiha dibêje: *"Wan hêk û qaşilên wê tev de xwarin û em hiştin li ser hesîra ji kayê" ("Akalu al-bayda wa-l-ta'shira wa khalluna 'ala al-hasira")*. Pismamê Beşer El Esed, Rami Makhlouf, rasterast an jî nerasterast hemû derdorên halxweş ên aborîyê kontrol dike (şaxê banka Libnanê Babylos yê Sûrîyeyê, şirketên xanîyên bi kirê û çêkirina avahîyan, du şirketên balafiran, gelek otêl, gumruka li ser sînoran, Syriatel –telefonên mobîl– û pareke mezin a MTN – şirketeke din a telefonên veguhêzbar– û bi dehan şirket û dezgehên din.) Ji ber vê yekê xwepêşandêrên Deraa û Laziqiyê agir berdan buroyên Syriatel ên li bajarên xwe… Jinişkêvebûna vê Întîfadayê divê ne cihêrengîyên navbera bajar û gundewarîyê, ne jî yên navbera Şam, Helep û deverên din ên welêt bi mirov bide ji bîr kirin.

Dudilîya bajarên mezin a ji bo gavavêtina bo nav serhildanê, ne diyardeyeke nû ye: ***Heleb***, tevî ku di dema ***Serhildana Bakur*** de (1919-1921) wextekê depoya çekên *Împaretorîya Osmanî* bû, li dijî dagirkerîya fransîyan qet xwe nelivandibû, wekî din Şamê jî di dema Serhildana Mezin a sûrî ya 1925-1926ê de li dijî wesayeta fransîyan serî hilnedabû. Ji ber vê yekê, zêde ne surprîzek e ku înîsîyatîfa serhildana dawî li ***Deraa***yê, li wargeha gundewar û başûrê welêt dest pê kiribe. Xwepêşandêran hêvî dikir ku çirisînên pêşî yên li ***Şam***ê yên di 15 û 16ê adarê de, wê vî paytextê ku dilê deshilatê ye, bixin nav livûtevgerên pir mezintir. Ev der taxên (eynî weke di 1925ê de) û derbajêrên ji aborîyê bêparmayî ne û ew bûn rizgarkerên rûmetê. Lê belê ***Heleb***ê jî, piştî dudilîyeke demdirêj, bi çend sed xwendekarên xwe neçar ma di erdnîgarîya serhildanê de cihê xwe bigire. Û ev yek bû sedem ku di 29ê nîsanê de cîrana wê, ***Hama***, bi van gotinan hinek yarî û tinazê xwe pê bike: *"Roj baş, Heleb!" ("Sah al-nawm yâ Halab!")*. Ev slogan û diruşme giş dibin îfadeya veqetîneke berbiçav ji îdeolojîya partîyên siyasî yên Rojhilata Navîn ên sedsala XXemîn: Di diruşmeyan de, ne neteweperestîya ereb, ne jî oldarîya îslamî derdikeve pêş. Lê belê tirsa ji oldarîyê û nexasim jî ya ji salafîsmê bi zanebûn tê sorkirin bi rêya îdîa û paşgotinîyên weke 'bi azadkirina girtîyên siyasî ya ku **Beşar El Esed** di 30yê vê adarê de biryara wê da, berî herkesî mîlîtanên rêxistina *Birayên Misilman* an jî kesên wisa tên zanîn jî wê azad bibin (li tenişt girtîyên edlî). Li alîyekî ev tirs ji hêla deshilatê ve tê bi kar anîn, lê li hêla din divê em di heman demê de balê bikşînin ser îhtîmama nûner û lîderên dezgehên xiristîyan ên ku qirkirina sîvîlan jî şermezar nekirin. Întîfadaya Sûrîyeyê qutkirina benê xwe yê ji raborîya siyasî ya welêt didome û ew sembol û nûnerîyên ku di livûtevgerên sedsala XXemîn de jî xwedî rol bûn, ji nû ve dertîne pêş: Cihê mizgeftê di qada bajarî de; mizgefta-xwelêgir (cihê ku birîndar û qaçax dikarin xwe lê bigirin); Çanda îslamî di diruşmeyan de ("Allahû Ekber"); fîgurê mîlîtanê sentezê ji yên leheng û şehîdên berê pêk tê, xwe dispêre du nirxên pir girîng: Mêranî û fezîlet, ev her du nirx mohra xwe li niştimanekî didin…

Întîfadaya Sûrîyeyê di heman demê de fêkîyê barûdoxên herêmî û veguherînên navxweyî ye. Ew bi kûrahî gelêrî û welatperwer e, welatperwerîyeke ku, bi awayekî nakok, li dibistana gelemperî ya ***Baas*** hatiye dawerivandin û çandin, hinek dişibe îmaja ku ***Komara 3emîn a Fransayê*** bi cih kiribû. Paşeroja serhildana ji desteka derve, herêmî û navneteweyî bêparmayî, dimîne li ser kapasîteya wê ya livûtevgerê û parametreyên şîlo: Parçebûnên di nav artêşê de, hevgirtina lîderên olî, kesayetîyan an jî gundên civakên hindikahî. Xwepêşandêr vê yekê baş dizanin û li ser navê yekîtîya neteweyî, banga li hindikahîyên durzî, xirîstîyan û elewî tê kirin, her tim li kolanan deng vedide. Bangên li artêşê tên kirin hê jî pir hindik in: *"Artêşa sûrî, ey hêza pir xurt, Deraayê ji dorpêçkirinê biparêze" ("Al-jaych al-suri yâ jabbâr radduw 'an Der'â al-hisâr")*. Ev artêşa han, ango parêzvana qedîm a siyasî ya ku nîşanên xwe yên serbilindî rûmetê di şerê dij-kolonyalîst de bi dest xistin û dûre hate bêîtîbar kirin —û ji têkçûnên wê yên li himberî Îsraîlê bêhtir ji ber pêkanînên xirab ên deshilatê—, eger bergehên din ên realîst peyde nebin, dikare bi awayekî nakok be jî, bibe hêvîya bingehîn a Întîfadayê…

*Rojnamevan

1 Bajarekî benderî yê bakur-rojava

2 Binêrin li nivîsa Patrick Seale, ya bi sernavê "Çavkorîya kambax a malbata El-Esed li Suriyê", *Le Monde diplomatique*, gulan 2011

3 Taxeke Şamê

Wegera ji fransî: Baran Nebar



Fehmî Balayî: **Peymana 1975**, Boyaxa rûnî li ser tuwalê , 80 x 60 cm

Paytexta xewar a herêmê

Kalkûta xeyal dike zêdetir bibiriqe

Cédric Gouverneur *



Fehmî Balayî: **Li benda seferê**, Boyaxa rûnî li ser tuwalê, 80 x 40 cm

Herêma mezin a Bengalê li gor Delhî an jî Bombayê ji geşbûna ekonomîk hindiktir îstifade kir. Kêmbûna dînamîzma wê, rê li ber bilindbûna çînên navincî girt. Taxên wê yên xizan hê jî bi xurtî gundîyan ber bi xwe ve dikişîne. Ev hestê rûxîna îzafî têkçûna hilbijartinê ya komunîstan, gulana bihurî, îzah dike, komunîstên ku ji alîyê desthilatdarîya xwe ya zêdeyî sîh salan hatibûn bêzar kirin.

Balefirgeha ***Kalkûta***yê li gor wan ên ku van salên dawîyê bi temamî ji cam û pola hatine çêkirin, gelek kambax xuya dike; li ***Delhî*** û li ***Heyderabad***ê, heta li ***Bangalor*** jî ku herêmên pêşveçûnê yên *Shining India* (Hinda ku diçirise) ne. Li salona balafirgehê, bi bîrxistina romana **Dominique Lapierre** (1), panoyek bang dike: *"Welcome to the City of joy" (Bi xêr hatin bajarê bextewarîyê)*. **Lapierre** di telephone de dibêje ku di romana xwe de bi sernavê *"cesaret, berxwedan, dînamîzm"* behsa jîyana rojane ya pir zehmet a xelkê taxên xizan dike. Herwiha rojnameya ***Dantevan*** tarîfeke wisa dikir: *"Wekî Rabindranath Tagore* (2) *ev tişt digot, fikra reqabetkirinê xurt e, lê mirov hê xurtir e"*. Ji sisê yek a 4.5 milyon xelkên ***Kalkûta***yê (nifûsa bajêr 13.2 milyon e) di *sluman* (taxên xizan) de dijîn. Ev rêje li ***Bombay***ê digihîje heta %55ê, tevî ku Bombay dilê aborî ya welêt e… (3)

Hêzekêşa mirovî, dûrbihîstiya livbar û McDonald's

Yekane bajarê mezin ê tevahîya rojhilata Hindê, Kalkûta bi berdewamî gundîyên derdorê bi alîyê xwe de dikişîne û ev ji dawîya sedsala XVIIê, ji dema avabûna wê ya ji alîyê brîtanîyan ve wisa ye: Koçberên aborî, penaberên xelayê (1943) û yên şer (1947, 1971). **Lapierre** dibêje: *"Bajarekî ku dikare sê sed hezar mirovan hilgire, ji ber şer û karesatên hewayî bi milyonan mirov lê tepisîne û hemû kapasîteyên pêşwazîkirinê ji sînor derbas bûne. Carna mirov dinêre avrêjek, kanîyek dikeve para pênc şeş hezar kesan"*. Pêşketina aborî nekarî rê li ber vê koçberîyê bigire: Sazîya ne dewletî (SND - ONG) Samarîyan texmîn dike ku halî hazir her roj *"hezar koçberên nû"* tên li bajêr bi cih dibin. Gundî dixwazin ji sekanîya aborî ya gundan birevin, ji nebûna tu siberojê, ji giranîya kast û olê, carna jî ji şidetê – dubendîyên navbera malbatan, tevgerên kêfî yên giregirên civakê, gerîlayên naksal. (4) Hejmareke biçûk ji welatê cîran ji *Bangladeş*ê tê: Bi 3 000 rûpîyan (bi qasî 47 euro) sînor bi qaçaxî tê derbas kirin, ziman wekhev e û bexşîşek ji polîsan re rê li dersînorkirinê digire. Bajar, bi xilasbûna ji komformîzma civakî re sazkirina jîyan û kesayetîyeke nû pêkan dike. *"Li vê derê, tenê statuya civakî girîng e,* dibêje, **Patrick Ghose**, mamoste û çavdêrê baş ê bajarê xwe. *Ku hûn ji kasteke binî hatibin, hûn dikarin bi awayekî fermî navê xwe bi 700 rûpîyan [bi qasî 11 euro] biguherînin.* (5) *Îca herkes dikare li vê derê bi cih bibe û xwe wekî li mala xwe hîs bike"*.

Kalkûta ji alîyê rêjeyê ve ji Bombayê hindiktir xwedî taxên xizan e, lê bêguman xizanî li wir ji cihên din hê beloqtir e. Mînaka herî berbiçav: Ajokarên erebokên bimil. Tam li navenda bajêr, li kolana ***Dayîk Teresa*** (6) û ne dûrî restoranta *McDonald's,* kalekî pir hejar, qemer, pêxwas, erebokeke bimil dikişîne. Li ser erebokê, mirovekî ciwan î lihevhatî rûniştîye; bi cilûbergên rojavayî, tilîkên wî li ser tûşên *smartphone*ya wî digerin. Ev dîmen parçebûneke berbiçav a *Shining India* ye û kedxwarîya herî dilgivêş nîşan dide. Di salên 2000ê de, mercîyên destûrmend hewl da vî awayê debarê ya sedsala XIXemîn qedexe bikin. Lê çare nebû: Ji ber nebûna alternatîfan, bi hezaran ajokerên erebokên bimil bi sedema jiholêrabûna pîşeya wan, li dijî vê qedexeyê derketin.

Makranj, 42 salî, ji panzdeh salan û vir ve ajokarê erebokên bimil, dibêje ku ew berê li dewleta cîran ***Bihar***ê gundî bûye. Debar û derên xirab berê wî daye vê derê. Ereboka wî tune, lê ew erebokekê ji bo hefteyekê bi 150 rûpîyan (2.30 euro) kirê dike. Bi erebokê kişandina mirov û eşyayan, rojê 150-200 rûpî pê dide qezenc kirin. Ew tevî sê ajokarên din li odeyeke *"mala malbateke dewlemend"* dimîne. Ew kirêya odeyê nadin, lê paqijîya malê dikin, li bazarê pêwistîyên malê dikirin, li baxçeya malê miqate dibin. **Makranj** her meh 3-4 hezar rûpîyan kom dike û wî pereyî dişîne gund, ji jin û çar zarokên xwe re. Carna, polîs jê xeracê digirin, hin mişterî bi awayekî xirab li hemberî wî tevdigerin. Dîsa jî **Makranj** difikire ku *"şansê wî heye"*, ji ber ku kesên ji malbata wî ne li ser peyarêyeke bajarê mezin, lê li gund, di malekê de dijîn.

Hinek wêdetir, **Lakshmi** û malbata wî holika xwe danî ser peyarê. Piştî ku jinik ji mêrê xwe –yê serxweş– re got bêdeng be, qebûl kir ku behsa jîyana xwe ji me re bike. Jinik, rojê bi 100–200 rûpîyan, *"li malên dewlemendan"* karên paqijîyê dike. Zarokên wê yên hejar çopan berhev dikin û wan ji hev vediqetînin; kîloyek çop bi rûpîyekê ji nû ve tê firotin. Yek ji wan zarokan ji serê xwe seqet e. Birayê wê yê biçûk jî birîneke xedar heye di çav de. Gelek caran, polîs wan ji cihê wan diqewirînin û ew mecbûr dibin berê xwe bidin cihekî din. Ji 5500 taxên xizan ên ***Kalkûta***yê, zêdetirî 3500 tax derqanûnî ne. (7) Bêyî ku navê xwe bidin, hin mirovperwer bi dizîka eşkere dikin ku hin polîs şantaja dersînorkirinê dikin ji bo ku hin mirovan ji alîyê cinsî ve bi kar bînin.

Jîyana li kolanan her roj bi heman awayî diherike. Serê sibê, mirov li ber tulumbeyan dest û rûyê xwe dişon. Firoşkar û senhetkar, her yek li ser prîketeke rûniştî, malzemeyên wan di nav çenteyekî kendirîn de li ber pîyên wan, li benda mişterîyan in: Berber, solçêker, solboyaxker, necar, cilşo, perakendefiroş… Li gor texmîna sazîyên nedewletî (SND), 250 000 kes bi vî awayî li ser peyarêyan bicihbûyî ne. Zilamên baş traşkirî, gomlek utîkirî, li ber dikaneke kolanê firavînê dixwin. Dezgehdarên seyar dîyar dikin ku *"Li Kalkûtayê, mirov dikare bi 5 rûpîyan birinc û sebze, bi 16 rûpîyan jî masî bixwe. Li Delhî û Bombayê ev sê qat bihatir e"*. Dûre herkes diçe karê xwe. Piranîya xelkên taxên xizan, çi fermî çi ne fermî, di sazîyên biçûk de karê komkirina çopan dikin. Ji ber zêdebûna wan û ji ber erzanîya hilberînê, taxên xizan gelek caran têrî xwe dikin: hilberîn, xizmet û serfkarî ji alîyê xelkên taxên xizan ve tên pêk anîn. (8) Hêza pêwendîyên civakî û mirovî zehmetîya jîyanê nermtir dike. *"Li taxên xizan ên **Bronx**ê, li New Yorkê, min mirovên xizan, bêçand û pir bêhêvî dîtin,* dibêje, **Lapierre**. *Lê li Kalkûtayê, na. Xelk, tevî xizanîyê, ji hemû deverên din zêdetir tevlî cejn û pîrozbahîyan dibin"*.

Li ser tengerêyên geşedana aborî

Lê Kalkûta tenê bi xizanîyê nikare bê tarîf kirin. Çînên navincî û bijare xwe gelek aciz dikin li hemberî îmajeke biçûkkirî. Tevî vê yekê, li kolanên bajarê mezin ***Bengal***ê, gelek bîranînên Dayîka **Teresa** li dar in (wêne, tabelayên bihijmet, gotinên li ser mermeran…). Ev jî îmajeke xizan a vî bajarî xurt dike û îhtîmalê dide ku bajar xwe bi xwe karîkaturîze bike.

Aveek Sen, nivîskar û rojnamevanê çandî yê rojnameya *The Telegraph*, vê dipirse: *"Hûn* Oryantalîzma ***Edward Saïd*** *nas dikin?* (9) *Alîyekî Hindê heye ku xwe ber bi Rojava ve dibe, eynî bi terza ku rojavayî dixwazin wê bibînin"*. Bi hejmareke zêde bengalî ji komunîstan, ji desthilatdarîya li Kalkûtayê û ji dewleta Bengala Rojava ya ji 1977ê heta gulana 2011ê gazinan dikin, ji ber ku wan qet hewl nedaye îmaja bajêr di çavên cîhana derve de biguherînin. Ha ev e yek ji sedemên têkçûna wan a berî sê mehan (bi tarîxa vê nivîsê), li hemberî *Kongreya Trinamool* (KTM) a Xanim **Mamata Banerjee**: Bi bêtevgerîya xwe, hikûmeta komunîst bi awayekî destek daye rûxîna bajêr.

Kalkûta bi rastî jî bi qasî metropolên din ên hindî ji pêşketina aborî ya deh salane îstifade nekir. Gelek xanîyên wê yên ji dewra vîktoryayê hildiweşin –carna dikevin ser serê peyayan– û ev dîmeneke kambax dide bajêr. Karên kalîfîye êdî pir hindik in û li gor gotinên xebatkaran, ji cihên din hindiktir pere tê dayîn. Hunermendên hindî û navneteweyî êdî berê xwe didin ***Delhî*** û ***Bombay***ê û ***Kalkûta***ya ku demeke dirêj paytexta çandî ya Hindê bû, xwe terikandî dibîne. Çînên navincî yên perwerdebûyî yên bengalî ji vê nebûna dînamîzmê gazinan dikin, û pir caran çêtir dibînin ber bi metropolan ve koç bikin; yên ku zêdetir bersiva xeyalên wan didin.

Dîsa jî li Kalkûtayê metroyeke birêkûpêk heye, navendên bazirganîyê yên biklîma û navendên bazirganîyê hene ku tê de navendên jêveneger ên telefonê û şirketên endezyarîya kompîturê, sembolên mezin ên kapîtalîzma hindî, pir zû pêş dikevin. Ji bo **Lapierre**, ev pêşketina îzafî qet bi kêrî kesên herî dilnizim nayê: *"Modernkirina taxan wan pir bihatir dike ji bo xelkên lê dijîn, û ew mecbûr dibin koçî cihên din bikin. Metro? Pir biha ye. Navendên dêwasa yên bazirganîyê, tenê xerckirina wan a cereyanê ya ji bo hênikkirina hewayê, dibin sedem ku li hemû bajêr cereyan bê qutkirin"*. Di 1985ê de, gelek mirovên xweşhal ên Kalkûtayê digot ku haya wan ji rewşa taxên xizan nîne. Ev rewş pir neguherî. *"Sê sed û pêncî milyon hindî her êvar bi zikê nîvtêr radizin. Realîteyeke ku çînên navincî yên vê Hinda nû "ya diçirise" çêtir dibînin, xeman nexwin. Mirovên rewşkambax jî, bi taybetî bi saya televîzyonê, dizanin mirovên dewlemend çawa dijîn. Ez jî çêtir dibînim nefikirim ka wê çi biqewime roja ku lîderekî bi qasî **Gandî** mezin wan gazî serhildanekê bike"*.

* Nûçegihanê Le Monde diplomatique

1 Dominique Lapierre, *La Cité de la joie*, Robert Laffont, Parîs, 1985, derxistina ser ekranê di 1992yê de ji alîyê Roland Joffé. Bi saya mafên xwe yên niviskarîyê, Lapierre torek dîspanser, dibistan û nexweşxaneyên gerok ava kirin. (www.cityofjoyaid.org)

2 Rabrindranath Tagore (1861-1941), nivîskar, şanonivîsar, resam û filozofê bengalî. Xelata Nobelê ya wêjeyê 1913

3 Daneyên hilgirtî yên jimareyên 2001 û 2011, *Census of India*

4 Gerîlayên maoîst ên ku li herêmên gundewarî yên xizan bi hêz dikevin. Bixwînin "Expansion de la guérilla naxalite", *Le Monde diplomatique*, kanûn 2007

5 Li Hindê, paşnav pir caran kasta mirovan dest nîşan dike

6 Anjeze Gonxhe Bojaxhiu, dibêjin Dayîk Teresa (1910-1997). Oldareke hindî, ji koka xwe ve arnawûdî, ji 1948ê û pê ve ji bo mirovên pir xizan kar kir. Di 1979ê de Xelata Nobelê ya Aştîyê wergirt, di 2003yê de wek xoşewîst hatiye îlan kirin. Ji ber fedekarîya xwe tê pîroz kirin, lê belê tê rexne kirin jî, ji ber li dijderketina wê ya li hemberî kurtajê û ji ber ku nexweşxaneyên Kalkûtayê ji dermanan bêpar hatine hiştin

7 "The Case of Kalkûta", rapora Nitai Kundu, Institute of wetland management and ecological design, 2006

8 Kolpana Sharma, *Rediscovering Dharavi*, Penguin Books India, 2000. Analîza aborî ya taxên xizan ên Bombayê

9 Edward Saïd, *L'Orientalisme. L'Orient créé par l'Occident* (1978), Seuil, Parîs, 2005

Mamata Banerjee, dildara nû ya Kalkûtayê

Hikûmeta komunîst a ku ji 1977ê û vir ve li *Kalkûta* û li *Bengala Rojava* desthilat bû, piştî ku di hilbijartina 13ê gulana 2011ê de têk çû, bû mijara henekên medyaya lîberal. Tevî ku *Enîya Çepgir* êdî zêde jî ne marksîst-lenînîst bû: Bûbû nêzîkî deh salan ku vê koalîsyona partîyên wek çepgir etîketkirî programeke neolîberal dimeşand. Ev bû sedem ku Xanim **Mamata Banerjee** û *Kongreya Trinamool* (KTM) wek menfaetperwerên gel ên herî mezin derkevin holê.

Dengdarên wê berî her tiştî sîstemeke kevneperest red kir. *Partîya Komunîst a Hind* (Marksîst), an jî PKH(M), dema ku di 1977ê de hat hilbijartin, reformeke berfireh a çandinîyê da dest pê kirin û hişt ku bi mîlyonan gundî ji vê yekê îstifade bikin. Piştre hêdî hêdî ew ket nav demagojî, bertîlxurî û sextekarîyên hilbijartinan. Piştî dûrxistina biaqilane ya veberdêran, heta 2001ê, hikûmetê bi carekê xizmeta berjewendîyên wan kir. Bi vî rengî ji bo bicihkirina projeyên endustrîyî, wê bera gundîyan da. Di 14ê adara 2007ê de, çardeh xwepêşanderên ku li dijî herêmeke ekonomîk a taybet derdiketin, ji alîyê polîsan ve li gundê *Nandigram*ê hatin kuştin.

Têkoşerê mafên mirovan û endamê komîsyona hilbijartinê ya *Bengala Rojava* mîrza **Biplab Halim** dîyar dike ku *"Enîya Çepgir êdî tenê navek bû. Gel xwe xîyanetkirî hîs kir. Entelektuelên çepgir jî raya xwe ji bo Mamata bi kar anîbûn"*. Ew li ser veberdêran jî dibêje: *"Wan fam kir ku zordarîya Enîya Çepgir ew nedibirin tu cihî û herî baş ew bû ku ji bo parastina mafên xwe destekê bidin Mamata"*.

Jineke xwedî kesayetîyeke xurt, jixweber, dilxwazîparêz, ji nav gel derketî, bi dayîka xwe re tenê dijî, *"Mamata karî hilbijêrên herêmên cuda yên civaka bengalî li dora xwe bicivîne"*, şefê hilbijartîyên KTMê yên di meclîsa Bengala Rojava de, mîrza **Sobhandeb Chottopadhay** dîtina xwe bi kurtahî wisa tîne ziman. Ew Trinamool – beşa herêmî ya Partîya Kongreyê– wek *partîyeke navend-çep"* bi nav dike û dibêje: *"Mirovan guherînek dixwest û di Mamata de şexsa ku vê pêk bîne dîtin"*.

Afîş, al, stran: **Xanim Banerjee** bûye mijara kulteke rastîn. "Dîdî" (xwişk) serkevtinên medyatîk zêde dike: Ji dema hilbijartina xwe, *Chief minister* a Dewletê bêxeber diçe seredana nexweşxane û polîsxaneyan, çavdêrîya rêveberîya xirab a xizmetên gelemper dike, hin rêveberan ceza dike. Bengalîyên ku her roj bi mirîxaneya karmendên bertîlxwarî re rû bi rû dimînin, pesnê wê didin. Lê belê kêfxweşkirina hemû dengdarên welêt wê mecbûr dike li ser ben cambazîyê bike: Ji ber wê yekê wê piştgirî da – hin kes wê bibêjin li gor menfaeta xwe wisa kir– nerazîbûna gundîyan a li hemberî projeyên endustrîyî ku ji alîyê *Enîya Çepgir* ve bi awayekî xirab hatibû ferz kirin. Li hemberî îtiraza gundîyan ên ji alîyê KTMê ve birêvebirî, *Koma Tata* di dawîya 2008ê de dev ji sazkirina karxaneyeke li *Sengur*ê, ne dûrî *Kalkûtay*ê, berda. Îca siwareya erzan **Tata Nano** li Dewleta Gujarayê tê çêkirin. Bi saya vê bi qasî deh hezar karên rasterast û nerasterast pêk tên. Ev rê li ber "Dîdî" nagire îro soza *"cezbkirina veberdêran"* bide, û Kalkûtayê bike hemtaya *"Londra an jî Hong-Kongê"*.

C.G.

Wergera ji fransî: Aynur Bozkurt

www.kurdipedia.org

Kerwanserayên kêfûxweşîyê, kevîtaxên kavil û şerpezekirî

Herdû Marakeş

Allan Popelard û Paul Vannier *

Referandûma 1ê tîrmeha dawî ya der barê Destûrnameya marokî de bi kêrî qral Mohammed VI hat ji bo ku, qet nebe, karibe xwe weke ku bi demokratîkbûnê re mijûl dibe nîşan bide. Lê belê qedera Marakeş, bajarê ku jet-sosyeteya parîsî ew veguherandiye "Saint-Tropezeke nû" û ji rûniştevanên xwe yên alelade hatiye xalîkirin, bi awayekî pir beloq bêedaletî û newekheviyên ku civakê dikojin radixe pêş çavan.

Bi masafeyeke panzde kilometreyî ji başûrê Marakeşê, Tameslohte ji manzarayeke hişk û zuha vediqete. Wek hemû gund û bajarên der û dora paytexta turîzmê ya Fasê, van demên dawîn di nav deh salan de pêşveçûneke gelek bi lez pêk hatîye. Nufûsa gel çi bigire sê qat zêde bû, li hemû derên ku avahîyen nû lê tên dirûstkirin, li her alî, rengê cûn yê betona teze diyar e: *"Berê tenê çend aşên zeytê û atolyên rîsên tekstîlê hebûn."* Tameslohte tenê gundekî ziraatê bû, ev dem baş tên bîra Ahmed, ku îro bi karê tenduristîyê bilî dibe. *"Îro li gundê me, dermanxaneyek, gelek dikan, goştfiroş û çend qahwexane hene."*

Gelek kesên ku li vir bi cîh bûne, ji bo ku li Marakeşê karekî peyda bikin hatine. Piranîyên wan ji gundên başûr tên û her weha ji bajarên bakur wek Fes û Meknes û hemû li otêlan an jî di karê avahîyan de dixebitin. Koçberîya kesên feqîr û bicîhkirina wan, ev heremên deştî kirin bajar. *"Îro, Marakeş weke bajarekî ewrûpî ye,"* dibêje Marwan, ew bixwe li qahwexaneyeke di devê bajêr de, bajarê Tameslohtê kar dike. *"Hemû tişt gelek buha bûn. Berê ez li bajarê Medinayê rûdiniştim, ez mecbûr mam hatim vê derê ji ber ku tu qaweta min ya dayina kirê nemabû. Li Tameslohtê kirêya xanîyan ji %30 ji merkeza bajêr erzantire."*

Ev sîteya ji bo razana karkeran hatîye avakirin û tenê xeteke otobosê ku ji alî şîrketeke îspanyolî ve tê xebitandin di wir re derbas dibe û sîteyê bi merkeza paytexta herêmî ve girê dide. Zarok, ku her roj ji bo biçin dibistanê, xwendevanên kolej û lîseyê vê rêyê bi kar tînin û bi vî awayî haya wan ji jîyana li qeraxa bajêr çêdibe û pê heşir-neşir dibin, her weha dê û bavên wan jî, bi vî awayî bi halê xwe dihesin.

Di navbera **Marakeş** û **Tameslohtê** de, li ser bi dehan kilometre cî, şantîye her berdewam in. Vinç û operator li wir cîhên ji bo tûrizmê amade dikin. Li seranserê rê, reklam gazî muşterîya dikin. Li her derê, maketên ku xanîyên musteqîl dê bên avakirin şanî didin. Her der bi panoyên reklamên ji bo sîteyên avahîyên nû xemilîne. **"Warê Royal Palm Marakeş"** dê heta dawîya salê vîlayên di destê xwe de amade bike. Li gor broşura reklamê; ev war, li ser du prensîban hatîye damezirandin; ew jî ev in: ***"sîstemeke ekolojîk û zarafeta huner û zanîna jîyanê".*** Di vî warî de çi hene? Berî her tiştî li dora meydana golfê û li ser 230 hektar ku dor û dera wî ji alî dîwarekî sê metre bilind û bi şîşan hawirdor hatîye avakirin, di merkeza wî de oteleke luks peyda dibe û ji alî kamera û ekîbên dewrîyeyan ve tên parastin. Ji bo kesên ku îmkanên wan tuneye û nikarin vê kêfxweşîya warê vilayên ***Royal*** pêşnîyazî xwe bikin, dikarin li gor îmkanên xwe yên mutewazî di reklamên rojnameyên Fasê an jî li ser afîşên reklamên metroyên Parîsê, xanîyên mutewazî peyda bikin. Ev proje, ya avahîyên dor û dera Marakeşê, jîyanê dide banlîyoyeke tûrîstîk û îmkanan ji bo tatilzadeyan û kesên ku dixwazin xanîyên duwem yên ji bo isterehetê bikirin peyda dike. Ewrûpî ku li Fasê bi cîh dibin, li merkeza bajar an jî nêzî merkezê bi cîh dibin, karkerên fasî jî ji mecbûrî koçber dibin. Sektora şahîyê di vî warî de, cûdatî û neheqîyan di navbera gel de peyda dike. Sebebên vê jî, ji alîkî ve newekhevîyên di navbeyna gel de, yê din jî hatina kesên ji dervayî welat. Tahtilên di otêlên luks de û malîkxaneyên şahane, ji bo kesên ***show-biz***, siyasetmedar û karmendên fransî dibe cîhekî bilind yê kêfê ji bo oligarkên fransî. Di hezîrana 2007ê de, **Bernard- Henri Levy** û **Arielle Dombasle**, ji **Alain Delon** û **Mireille Darc**, malikxaneya ***Zahiya*** kirîn. Di oktobera 2001 de, çend metre wirdetir ji şato ya melîk ya nû û otela luks ***Mamounia***, ***Madam Anne Sinclair*** û **Dominique Strauss-Kahn** jî, Riyadek luks kirîn. (1) Ev mînak tenê bi serê xwe şanî dide ku civatên bilind çawa zû fêrî hev dibin û tên ba hev û dibin endamên yek *Civata Bilind*.

Cazîbeyên şerqî bi saeta Parîsê di sisêyê sibê de

Di dema tatilên Noelê de, bajar, bi temamî dibe cihê civîna biyanîyên zengîn: **Brice Hortefeux** et **Hervê Morin**, herdû jî li otelekê bi cîh bûn, li gor rojnama *L'Express* çileya 2011an. Nêzî van herdû wezîrên kevn (Thierry de Beaucé, Alain Carignon, Dominique Bussereau), wekilên Partîya li ser hukum UMP. (Ollivier Dassault), Wekîlên partîya Sosyalîst (Jerome Cahuzac û Jean- Christophe Cambadelis). Partiya merkezê; (François Sauvadet), ekolojist; (Jean-Vincent Placê.) Her weha, Bernard-Henri Levy, Pierre Bergé, Liliane Bettencourt û Albert Frère jî xwedî mal in. Di vî bajarî de, mirov dikare di eynî wextê de, rastî Jean Sarkozy, Yannick Noah, Alexandre Bompard, Jean-Renê Fourtou, Dominique Desseigne, Jean-Pierre Elkabbach, Guillaume Durand were. (2)

Di "bajarê sor" de, navê wî yê Marakeş yê duwem ku ji rengê dîwarên wî yê reng zersoreyî tê, "pratika kollektivist" (3) ya çîna serdest rengek taybetî digire. Nivîskar û weşanger, Jean Paul Enthoven, tatila xwe ya li mala hevalê xwe BHL derbaskiribû weha taswîr dikir: Di nav vê qesrê de, min derhal xwe wek li mala xwe hîs kir, min didît çawa roj di navbera derîyan û lavlavokan re dişemitî. Masor û dengbêjên wan dizanîn çawa me kêfxweş bikin û me rehet bikin. Konser, pirtûk, şiranîyên şerqî û vexwarinên xweş û bi tahm her dayim amadebûn, dema dilê me dixwest.

Li her der, ahîze û çirayên neqişkirî, cam û sûşeyên tirk û iranî û lembeyên renga reng bi zewqên şahane û mîrane çav diqerimandin û hewakî efsûnî belav dikirin. (4)

"Marakeş herdayim wek bajarê xewnê bû ji bo ewrûpîyan. Evder hem Afrîka bû, hem jî Rojhelata esrarengîz û bi sir" dibêje Elie Mouyal, mîmarê malên **Dominique Strauss Khan** û milyarderê belçîkî **Albert Frere**. Îro, tenê sê saet ji Parîsê, ev bajar hîna jî cazîbeya xwe ya şerqî şanî dide - dinyayek bi hisîyet, hesasîyet a erotîzma nivîskar û romannivîsên sedsala 19 û 20an, ku wê demê bi imajinera dagerkirîya leşkerî ve dibû yek û ew temam dikir.

Ev manzereya mîtîk û cografîya efsûnî ji çîna serdest re dibû sahneyeke hedonîsmê, yanî felsefeya nêrîna dinyayê li ser fikrên jîyana di nav zewq û şahîyê de. Ji rastîya rojane dûrketî, ji alî civakî ve ji xebatên afirandinên azad ev *"kerîyên kosmopolit di nav jiyaneke vala û bê ked û afirandin de diçêrin"* (5) û hemû îşaretên "çîna zewq û kêfê" şanî didin. Ev jî fikrê sosyologê amerîkî **Thorstein Veblen** e. Li cem van şexsan, *"hisîyetên bê hurmet ya ji bo karên afirandinê" û "rehetîya îmkanên bi destxistina peran û bi vê şêweyê berdewamîya jiyana kêf û zewqê, van kesan dike nav kategorîya kesên ku wext tenê ji bo tiştên bê afirandin derbas dikin".* (6)

Palmare, ku li dervayî merkeza kevn ya bajêr e û di bin hukmê dinastîya *Almoravid* de, di sedsalên 11 û 12ê de, maye, îro pêşketinên gelek balkêş li dar dixe. Ev herêm îro şexsîyetên bi nav û deng, prensên welatên golfê, sportifên fûtbolê wek **Zinedine Zidane** û **David Beckham** û herweha manken **Naomî Campbell** bi mêvan dike û bi cîh dike. Li seranserê dirêjîya rê, mirov dikare qesr û vilayên luks û şahane temaşe bike. Bi vê mezinbûn û giranbihayîya xwe, ev şato bi van halên xwe, yên gelek bi idia, carna mirov dikare bifikire ku ji bo qaîd û pereyan ev herêm çêbûne? (7) Bi gera xwe û çûn û hatinên xwe li ser van dîyarên der û dorê, van ahalîyên nû bi awayekî eşkere diyar dikin ku ew endamên civatek elît, xwedî jiyaneke di nav sefayê de ne. Li pêşiya malên wan seyare û erebeyên wan ên ***Porche***, kesên spora bazdanê dikin, kesên bi golfê dileyizin û li gel wan jî hêştirên ku derbas dibin, tam manzereya ***California***yê tîne bîra mirov.

Adetên arîstokrasîya Marakeşî ji destpêka salên protektora (di bin parastina) fransî de dest pê dike. Avakirina bajarê ***Mamounia*** di sala 1921ê de, destpêka pisporîya vî bajarî di warê tûrîzma luks de tê qebûlkirin, li gel ku berpirsiyarên kolonial dixwestin milet ber bi bajarê sayfîye yên li ber derya yê ve bişînîn; her wekî Kasablanka, Rabat, Agadîr. Li van deran hemû kompleksên tûrîzmê bi rêk û pêk in. **Hubert Lyautey**, generalê yekem ji arteşa Fransî bû, biryar da ku Marakeş bibe cîhê elita kolinial. (8)

Civata bûrjuwa, ku îro li gor rîtma her demsalê li her alîyên dunyayê cîh diguherin, "bajarê sor" weke cîhekî favorit yê ser rê hesab dikin. Herêmên zivistanî ku rêyên wan bi karakterê dûzkoşe û rêzanê hatine avakirin li ser fikrê mîmarîya avahîyên "sahfîye" yê



Fehmî Balayî: **Dîmenek**, Boyaxa rûnî li ser tuwalê, 50 x 70 cm

dema Imparatorîya duwem de hatîye avakirin. Herweha mina bajarên fransî: Cannes û Deauville, zivistan li der û dora gazinoyê, li dora tiyatroyê, li dora hotelên luks û baxçeyên tijî gul û kulîlk derbas dibe.

Ev fikir, bi serxwebûna Fasê re, di sala 1956 de, ji holê ranebû tam zidê wê her berdewame û bûye politikaya dewleta Fasê û şîrketên şexsî. Hotelên di kategorîyên bilind de ji pêwistîyê jî zêdetir in, Hotelên 4-5 strêrkî ji nîvê hejmara hotêlan zêdetir in. (9) Hotel-Restoranta yekem ya ***Grûba Lucien Barierre*** ku li dervayî Fransa cara yekem li Marakeş vebû, ev ne bê mahne ye û mezinbûn û qiymeta Marakeş şanî dide. Hotela, ***Hotel &Ryads Naoura Barierre*** di nav merkeza xwe de cîh dide restoranta meşhûr ya bi nav û deng ***"Fouquet's"*** ku ***"atmosfereke luks ferah û yekane ya li ser Champs Elyssées"*** diyarî mêvanên xwe dike û zarafeta nazikî û nazdarî û delalîya Parîsê pêşkêş dike. Li ser sîteya internetê ya hotelê mirov dikare bi vî awayî bixwîne.

Berpirsîyarê Fasî, di vî warî de bi ser ketin, kesên nas dawet kirin, li bajar bi cîh kirin bi vî awayî firotinên xanîyan zêdekirin û li gor bajarên din yên li qiraxa Derya Spi, cihê ***Marakeş***ê xurt kirin; Çend inisiyatifên balkêş wek, di sala 2001ê de, ***Festîvala Navneteweyî ya Marakeş***, ku her sal şexsîyetên bi nav û deng di ***Jury*** de cîh digrin û bi vî awayî bajar dikirin rêgeh û istasyoneke modayê.

Encama vî îşî: Çûn û hatina vî bajarî di nav deh salan de hema çi bigre du qat bû. Di sala 2001ê de, ji milyonek zîyaretvan derbasî milyonek û heşt sed hezarî bûn, di sala 2010ê de. Otelên ku di sala 1973yê de hejmara wan bist û pênc bû, îro hejmara wan gihaştîye sed û pêncî û diduyan. Birêz **Hamid Bentahar**, serokê meclisa herêmê ji bo tûrîzmê dibêje ku ev bajar, ji sedî sîyê kapasîteya turîzma welêt dide ser milê xwe. Guhertina sîstema aborî ya Fasê ya ber bi ***Sîstema Bazara Serbest*** ya kirîn û firotinên azad, di warê tûrîzmê de pêşketinên girîng li dar xistin û tewecuha navnetewî heq kirin. Vî tiştî fersend da Qralîyetê ku konferansa weziran li dar xe û ev konferans paşê, di sala 1995ê de, bi navê (OMS-Organisation Mondial du Commerce) bû ***Rêxistina Navnetewî ya Bazirganîyê.***

Di yek wextê de ku tûrîzm pêjde diçû, civandina "şexsîyetên delal" li vê herêmê fersend da naskirin û pêşketina bazar û sermayeya hunerî. Wek ku dibêje jeografê îngilîz ***David Harvey***: Qiymeta ticarî ya alavên hunerî di bêhempabûna wan de ye. (10) Dê tûrîzm bi serê xwe tu qiymeta wî tune ba, ger li her cîhekî tiştek taybetmendî peyda nebûya, ger xusûsîyetên karakerîstîk û balkêş tunebana, dê tu car bal û meraqa tûrîstan nekişanda. Ji ber ku li gelek cîyan standardizasyona tûrîzmê; wek avahîyên wek hev, zencîre-otêl, restorant, bazarên kincên hazir, tu taybetmendîyê ji turîzmê re nahêlin.

Ji bo ku mirov bikaribe ji vê çembera yek adetî derê, pêwist e "hunermendîya qezencê" bê avakirin, pêwist e ku bazara malzemeyên herêmî bê vekirin. Di rewşa Marakeşê de, kesên alaqadar, malzemeyên xwezayî û herêmî bi cîh kirin û qîymetên wan yên esasî berpêş kirin. Wek mînak: Stasyonên nû li çola Seherayê û li qontara çîyayê Atlasê hatin avakirin. Hêjayîyên dîrokî wek ***Medina-bajarê kevn û Meydana Jemaa- El-Fna*** ku wek hêjayîyên nemir ên insanîyetê ji alî UNESCO ve tên qebul kirin, bi şêweyeke li gor nirxên xwe yên tarîxî û tabii. (11) û herweha di nava vê xebatê de stûnên zêrîn jî hatin tamîrkirin. Hinek ji rojnameyên skandalan, ji rexneyên xwe dereng neman; û gotin: "Ev bajar, ne mecbûr bû ***Saint-Tropez***a(bajarê li başûrê Fransa) Fasê ava bike". (12)

Ev "hunera qezenca oligarşîk", li gor rojnameyên ***Gstaad*** (Swissre) û ***Courcheval*** (Fransa), ji çîna bûrjuwa mezin kes anîn vê derê û carna jî, tarîxa wan a bi şexsiyet û mêvanên bi nav û deng yên berê tevlî hev dibe, wek li gor **M. Mouyal** ***"Winston Churchill*** *di salên 1940ê de, di salên 1970yê de* ***Yves Saint Laurent û Rolling Stones*** *ku li van deran moda dest pê kirin".* Çîroka bajarbûna vê herêmê bi saya van "mirovên mezin" ji arîstokrasîya nû û hemdem re bû sebeb ku xwe bi xwe, xwe wek mîrasvanên van şexsîyetan şanî dunyayê bidin. Nigekî mirov li Marakeşê be, li gor van mirovan, wek

ku para mirov di vê sermaya mîrasê de hebe û xwe li ser yek xetê bibîne.

Çapemanîya aborî, ji bo çîna navîn ya bilind, ku wusa dizane ku mirov bi rehetî dikare bibe arîstokrat, dûr û dirêj behsa van tiştan dike. Di sala 1998ê de programeke televizyonê ya magasînê bi navê ***"Capital"*** li ser kanala **M6** weşanê dike, beşek taybetî ji bo **Ryad û Medîna** amade dike; bi vê babetê reklama jîyana ewrûpîyê ku li wê dere seray û qesrên bi qîmeteke gelek bê mahne stendine dike û pesnê wan dide. Vê weşanê sukseyeke mezin çêkir û hejmarek mezin yê muşteriyan bazdan wê derê û bi vî hawayî Medînayê guhertinên mezin çêkir.

Ber salên 60ê ve hejmara şênîyan gelek kêm bibû, ji ber ku elîtan ji wir bar kiribûn çûbûn taxa ***Gueliz*** ku berê avahîyên kolonîyan bûn, Medîna bibû cîhê pîremêr û pîrejinan, senetkar û gundî ku hatibûn bajêr bi hêvîya ku kar peyda bikin, lê tu kar tunebû, bûrjuwazî feqîr ketibû. Ji ber vê sebebê dilê tarîxî yê bajêr hêdî hêdî qîmeta xwe ya navendî winda dikir. Meslekên serbest, hêdî hêdî van kuçeyên teng, tarî û xwar û maro terk dikirin, her weha konsolosxana Fransî jî li gel wan.

Jiyana bi liv û tevger a bajêr di deh salan de du qat zêde bû

Ber bi dawîya salên 1990ê, Medîna dibe bajarek ku li ser ax û zevî û ersayên wî ewrûpî spekulasyonan çêdikin. Lîstikên li ser qîmetên xanîyan dibe sebebê ku gelê fasê mecbûr dimînin û koçberî derve dikin. Li gor **Ingrid Ernst**, ku li Unîversîteya Parîsê ya 10an doçent e û pisporê jîyana şaredarî û ji nûve amadekirina Medînayê ye: *"Bi taybetî kirêcîyên ku di xanîyên biçûk de dimînin, halê wan xirab in, ji ber ku xanî tên firotin, ev jî dibe sebeba bilindbûna kirê."*

Ji ber spekulasyonên van salên paşîn buhayê xanîyan teqîyan, wek mînak, *"xanîyek bi mezinbûna xwe wasat, di salên 2003-2004ê de, li gel tamîra xwe, buhayê wî 80 000 ewro bû, di sala 2006ê de, eynî avahî buhayê wî firîya 200 000 ewroyan."* Ev jî tecrûbeya **Valérie Bradat** e ku xwedîya ajansa ticareta avahîya ne. Ew bi xwe deh sal e li Marakeş bi cîh bûye.

*"Hêdî hêdî cografya sosyal ya Medînayê xwe ji hevdû cûda kirin, li dor û dera navenda bajêr, ji % 50yê zêdetir ewrûpî ne. Iro ferqîyeta di navbera civata ku bûye bûrjûwa û kesên ku roj bi roj feqîrtir dibin, roj bi roj mezintir dibe. (13) Getoya kevn ya yahûdîyan, taxa **Mellah** ji sala 1970yê û vir de, kesên bê pere û feqîr ên ji gund û ji bajarên din civandîye. Li vir kuçe teng û zirav in û ji xwelîyê pêk tên, avahîyên wan jî bi temamî xerab bûne. Ev tax her weha bûye cîhê fihûşa herî mezin û nifûsek gelek zêde li vir civîyaye, hejarî û feqîrî bê hed e. Nifûsa wê sê qat ji taxên din zêdetir e. Ji sedî 70 ji malbatan, mehê ji 1 000 dirhaman (90 ewro) kêmtir qezenc dikin".* (14)

*"Fonksîyonên sîstema Medînayê, hêdî hêdî ji hev dikeve. Li paş derîyê **El Khemis**, taxên **Sidî Ghalem û Hart es Sûra** gelek atolyeyên xeradan, hesinkaran û qaynaxçîyan hene. Di sûka **El Khemis** de, ne **papûç** ne jî xerdewat tiştek nemane: Tenê karkerên avahîyan tên li çimento û **planchan** digerin û bêkarên ku terîşkên qumaşan li hev dixin. Meydana **Jemaa El Fna** bi karakterên xwe yên kontrast a li hember bajarê berî kolonialîyê, mekaneke ji bo tûrîzmê ye."*

Xanima **Baradat** berdewam dike û dibêje; *"Îro herkes dixwaze bi erebe vegere heta mala xwe; dixwazin kuçe û rê hîn paktir bin"*. Xebatên şarezayî yên nû dest pê kirine herwekî kevirkirin û asfaltkirina rêyan û paqijkirina sîstema avê. Li seranserî vê taxê dikanên "***Kyrielle***" û dikanên ji bo tûrîstan "souvenir", cîhê firinan, nanpêjan, hemaman û etaran girtine, ev jî dengeya jîyana civakî ser û binê hev dike. Firotina hinek kuçan ku şexs dikirin, nahêle kuçe bi rêyên esasî ve bên girêdan û bi vî awayî carna şexsek hemû kolanekê bi serê xwe dikire û dibe xwedîyê hemû malan. Ev jî derdekî mezin ji nû ve belavkirina avahîyan re derdixe. *"Hinek ewrûpî dixwazin li jora xanîyên xwe, li ser banî, hawûzan çêkin, ev jî li hember qanûn û ededên şaredarî û edebên mehelî ne, cîran gelek caran ji van edetên nedîtî aciz in, ji ber ku jîyana hûndurî ya mehrem jî, tevlî hev dibe. Cîran ji nêrînên eşkere û bi meraq nerehet dibin."* Ev jî bawerîyên **Sdî Mûyal** in. *"Em li malên xwe dîwarekî radikin ji bo ku mitbaxê mezin bikin, lê ew jakûzîyên xwe dibin ser banê."*

Gelek ji milkdarên nû xanîyên xwe wek otêl bikartînin û heftane bi kirê didin tûrîstan. Îro nêzî pênc sed malên bi vî şêweyî li Medina yê peyda dibin. **Maurice de l'Arbre** ku bi eslê xwe ji Monacoyê ye, ***Ryada*** xwe ya yekem cara ewil pênc şeş sal berê stend, paşî jî çend malên din stend, hemû bi hev re kir malek mezin û bi kirê dide tûrîstan. Peyder pey ev camêr hema çi bigre hemû tax stend. Bazara vî karî xweş dimeşe, ji ber ku erzan e, buhayê kiriya di nava qesrekî de, buhayê ***Hotel Etap*** derbas nake. Dekorasyona şerqî aramîyekê ava dike, muşterî pê kêfxweş in, fisqîye û darên porteqalan di baxçe de, herweha ji bo çalakîyên sporê, makineyên nûtop û birqandî ji bo enerjîya mişterîyan amade ne. Her tişt hazir e ku **"Pierre Lotî"**yên nû, yên hefteyî ji halê xwe razî bin. Birêz **l'Arbre**, ku mîna keslanekî li ser dîwana xwe dirêjketî ye, li ser banê ***Ryada*** xwe û bawer e ku ev fikir di nav civata Fasî de baş tê qebûlkirin û têkilîyên civakî xurt dike.

Birêz **Hessen Korapî**, ku bixwe weznedarê *Konfederasyona Demokratik ya Karkeran* e, (CDT) bawerîyên wî cuda ne, *"ji % 90 ê karkeran di vê sektorê de bi maaşê herî kêm dixebitin, yanî mehê 2 200 dirhem (190 Ewro), bi serde jî mirov nizane çend saet û di nav çi mercan de kar dikin"*. Karên wan gelek caran reş e û ev rewş li otêlên mezin çêtir nîne. *"Karmend gelek caran qanûnên kar bi kar naynin û naxwazin ku sendîka nêzî van kesan bibin. Di sala 2007 de, me beşek xwe li **Club Med-Marakeş** bi cîh kir, mehek bi şûnde hemû endamên me sirgûnî Senegal, Misir û heta Tétouan, ku ji vir şeş sed kilometre dûr e, kirin!"*

*"Li Marakeş amadekirina mîtîngan gelek zahmet e, ji ber ku bajar **vitrîna Fasê** tê qebûlkirin*". Endustrîya tûrîzmê aramîyê dixwaze. Hilweşandina bazara tûrîzmê piştî şorêşên Tunis û Misrê vê yekê baş diyar dikin. Bo hemûyan aramî û ewlekarîya bajêr ji hemû tiştên din girîngtir e.

Li bajarekî, ku ji sisêya yek nufûsa wê ji vê sektorê kêm hindik nan dixwe, gelek ji wan di heyra ku karê xwe ji dest derxin de ne û bi vê tirsê dijîn. Ev kar tenê, çavkanîya wan a aborîyê ye. Tirsa windakirina kar gelek karkeran pasif dike û destên wan girê dide, karmend vê fersendê zor baş bi kar tînin. Her weha karmend, stajyerên nû jî li hember karkerên ku dixwazin meş çêkin bi kar tînin û carna jî wan êrişî ser meşan dikin, wek meşa ***21ê Sibata 2011ê***. Birêz **Sabbane** ji weha difikire, Ew bi xwe berpirsîyarê herêmî yê ***Partîya Sosyalista Yekbûyî*** ye û di eynî wextî de hem amadekarê vê çalakîyê ye, ew jî dibêje ku vê provakasyon darbeyeke mezin li tevgera me, ya yekîtîyê da.

Li ser meydana ***Jemaa–El-Fna***, şahîya ku karkeran li dar xistine ji serê sibehê heta êvarê berdewam e. Firoşvanên ava meyweyan li gel hemûyan karkerên fabrîqan ku bi perakende kar dikin û hemû rojên wan bi eynî jestan derbas dibe, civîyane, ji cîhê kincên folklorîk unîformayên kar yên şîn li xwe kirine. Herweha karkerên bûtîkên biçûk yên hemû bajêr ku ji mecbûrî, ji serê sibê heta êvarê eynî derew û gevezetîyan dikin ku dilê muşterîyan xweş bikin, her wekî teknîsyenên ku li merkezên firotinên bi telefonan pêktînin, kar dikin û rojê hezar car eynî pirsê tekrar dikin, weke zencîrekê. Di vî warê şaristanîyê de, di nav sergêjî û teqe-reqê de, di nav qareqar û barebara taciran de, mirov heta hestîyên xwe diweste.

Halbûkî li vî bajarî, ji ber pereyên ku ji derva tên, mirovên ku xanîyên xwe ji dest dane, ev tevgera şoreşger li dar ketîye. Vê tevgerê ji bo carekê be jî jîyana monoton û mekanîk belav kirîye, vê mudaxeleya demokratîk hinekî nefes da gelên ku sektora tûrîzmê ew kirine wek dekora rojane ya warê folklorîk. Bi xêra tevgera ***21ê sibatê*** (15), bajar îro, ne weke sîteyeke tûrîstîk, lê belê bûye weke bingeheke axa civateke politik.

* Rojnamevanên taybet yên Le Monde diplomatique. Paul Vannier: Li Unîversîteya Parîsa 8an li Enstîtuya Jeopolîtîk ya Fransî jeograf e.

1 Malên ji derva ve girtî lê jîyan li hewşê derbas dibe

2 "Dema sîyasetmedarên fransî dixwazin xwe bi derewan li Marakeş bidin ber tavê. L'Express, Paris, 13ê çile 2011

3 Expression conçue par les sociologues Michel Pinçon et Monique Pinçon-Charlot

4 Jean-Paul Enthoven, tiştê herî baş ku me bidest xistibû, Paris, 2008

5 Jean-Paul Enthoven, *heman berhem*

6 Thornstein Veblen, Teoriya çîna zewq û kêfxweşiyê, Gallimard, collection Tel, Paris, 1979

7 Kevnemîrên Afrîka Bakûr

8 Mohamed Sebti, Kesên Marakeşî. Jeo-Demografiya bajarê sor, Les éditions de l'INED, Paris, 2009

9 Mohamed Sebti, *heman berhem*

10 David Harvey, Jeografiya desthilatdariyê, Les Prairies ordinaires, Paris, 2008

11 Binêre Juan Goytisolo, " Jemaa-el-Fna, mîrasa devkî ya însaniyetê. ", *Le Monde diplomatique*, juin 1997, jêdera "Famkiriya şiyarbûna ereban ", *Manière de voir*, n° 117, Hezîran-Tîrmeh 2011

12 "Cewhera Rojava û Saint-Tropez a nû a fasî!", Gala, Paris, www.gala.fr

13 Prosesusa jinûve rêkûpêkkirina taxên navendeyên bêqîmet û gelêrî ji aliyê zengînan ve

14 Mohamed Sebti, *heman berhem*

15 ***Tevgera 20ê sibatê*** ku li ser Facebookê di dawiya meha çileya 2011ê de, di warê "Bihara Ereb" de. Şebekeyên civakî ku îmkana belavbûna berbanga ji bo çalakiyên 20 Sibata 2011ê, bi navê "ji bo demokrasî, wekhevî, edalet û jiyaneke bi rûmet". Paşiyê ev çalakî li gelek bajarên din ên esasî yên Fasê berdewam bûn. Tevger bangî boykota li hember referandumê kiribû, ku di 1ê Tîrmeha 2011an de li dar ketibû li ser projeya reforma qraliyetê ya ji bo qanûna esasî, ku kafî nedihat dîtin



Fehmî Balayî: **Xweza**
Boyaxa rûnî li ser tuwalê, 65 x 50 cm

Wergera ji fransî: Vehbi Aydin

Meseleya Karaçîyê: "Gendelîya li dilê Komarê"

Roselyne Rochereau

8ê gulana 2002yê, wesayîta ku wek hemû rojan karker û teknîsyenên Rêveberîya Şantîyeyên Deryayî [Direction des chantiers navals (DCN)] dibirin, diteqe, ku ew karker ji bo têkxistin û amadekirina sêyemîn noqava [keştîya binê deryayê] bi navê **Agosta** hatibûne Pakistanê: Yanzdeh kuştî û dwanzdeh birîndar. Heta kêmwextek berê, bi taybetî li nav derdorên herî bilind ên dewletê behskirina êrîşa Karaçîyê dibe mijareke hesas. Rojnamevan **Fabrice Arfi** û **Fabrice Lhomme** vekolînekê (1) pêşkêş dikin ku bi gelek şahidî û belgeyên nû hatiye qewî kirin. Mirov dikare kitêba wan wek romaneke sîxûrîyê ya pir aloz bixwîne. Lê, ferqa kitêba wan ji romaneke sîxûrîyê ew e ku kitêba wan fîksîyon an jî xeyalî nîne, belku pêdaçûneke rastî ye, bo nav alî û hûrdekarîyên krîmînalîya rêkxistî. *"Tirs û paranoya qaîde ne… Nediyarî, sir û sî xwedîyên rolên serekî ne li wir"*.

Pirsiyarên pêşî: Çima hakim **Jean-Louis Bruguière**ê ku yekser piştî êrîşê dest avête birêvebirina dozê, bala xwe bi tenê da ser ihtîmala ***El-Qaîde***yê? Lêkolîna van du rojnamevanan gelek zû îşaretê bi hindek nelihevî/nakokî û nihênîyan dike: Bo nimûne, negirtina çend şahîdan û windakirina delîlên wêneyî. Ji bo malbatan, mesele ketibû rêyeke bêderî û aloz heta ku hakim **Marc Trévidic** û parêzerekî nû hatine dest nîşan kirin û agahîyên taze ji layê çapemenîyê ve hatine ragihandin. *"Meseleya Karaçîyê"* piştî wê kêlîyê dikeve qonaxeke diyarker. Ihtîmala êrişeke terorîstî bi yekcarî tê berdan û ihtîmaleke *"zêde mentiqî"* şûna wê digire: Pêwendîya di navbera êrişê û rawestandina dana wan komîsyon û parên komîsyonan ku girêdayî peymanên çekfirotin/çekkirînê ne. **Jacques Chirac** her piştî ku bo serokatîya komarê hat hilbijartin, sala 1995ê, wî biryara rawestandina dana komîsyonan dabû.

Ew meblaxên amajekirî, di demekê de ku **Nicolas Sarkozy** wezîrê budceyê bû *"li hemû tebeqeyên wezareta bergîrî û darayîyê"* dihatine zanîn, mijareke xeternak û bi rîsk e. Rawestandina ji nişka ve ya dana wan meblaxan pêleke heyr û şokê rakir, bi taybetî ji bo *"navbeynkarên çavbirçî û têhnîyên pereyan"*.

Digel aşkerekirinên Rêveberîya Giştî ya Asayîşê, ji sala 2002ê ve (Direction générale de la sécurité - DGSE), bi destê **Claude Thévenet**yê berpirsê amadekirina raportên Nautilus yên Rêveberîya Şantîyeyên Deryayî (DCN), sala 2008ê û digel hindek ronkirinên nûtir ji kevne-wezîr **Charles Millon** û **François Léotard**, ev pêwendîya digel êrîşê hate piştrast kirin.

Di nav vê geremolê de, **Arfi** û **Lhomme** delîlên pêwendîya di navbera şidet, pere, siyaset, di navbera gendelîya navneteweyî û *"gendelîya di nav dilê Komarê de"* pêşkêş dikin. Bere bere parçeyên siyasî-darayî yên kêm digihînine hev: Sala 1995ê fînansekirina kampanyaya serokatîya **Edouard Balladur**, *"milyonên ji bo mîrên suûdî"*, firqateynên [kêstîyên şer] Taywanê, *"razên şirketa luksembûrgî Heineê, ku sala 1994ê bi pêşengîya Nicolas Sarkozy hate ava kirin"*, *"biheşta darayî* [devera ku bacê ji pere nastînin] *ya girava Manê"*, şirketa panamayî Mercor finances, *"mirovên sîberê"*: **Amir Lodhi, Abdul Rahman El-Assir, Ziad Takieddine**, ew karsazên ku bûne *"hevalên dilsoz ên Elyséeyê"*.

Her çi kesê ji bo peydakirina rastîyê hewl dide, tûşî hêrsa *"karbidestên herî berz ên dewletê"* dibe: bo numûne lijneya parlementoyê ya ***Berhevkirina Zanyarîyan*** ku **Bernard Cazeneuve** wek meseleyeke dadgehî bi rê ve dibir. Hezîrana 2009ê, qanûnekê çepera qedexeya li ser belgeyên senifandî û yên nihênî berfirehtir kir. Qenaeta nivîsaran hem bi pêşbînî ye û hem geşbîn e: Noqavek *wisa hatiye çêkirin ku bi xêra otonomîya xwe ya berfireh her çi zêdetir bikare di bin avê de bimîne jî, hergav di dawîyê de derdikeve ser avê"*.

Bi **Magali Drouet** û **Sandrine Leclerc** re versîyoneke hûr û jidil ya vê dramê heye. (2) Her yekê di êrîşê de bavek winda kir û bi du dengan, bê tawîz lê bi kerb, şîna ku ketiye ser sehneya giştî vedibêjin, anku malbatên ku têne tirsandin, gotinên ku têne veşartin. Şahîdên wan, bi şermokî û hunereke nimûneyî, berê veşartî yê *"manîpûlasyonên siyasî û xiyanetên mezin"* radixine pêş çavan. *"Me rastî divê, em dê wê bi dest xin, ji ber ku mentiqa dewletê di ferhenga me de nîne."*

1 Fabrice Arfi, Fabrice Lhomme, *Le Contrat. Karachi, l'affaire que Sarkozy voudrait oublier (Peyman. Karaçî, bûyera ku Sarkozy hez dikir ji bîr bike)*, Stock, coll. "Les documents", Parîs, 2010, 362 rûpel, 20,50 euro

2 Magali Drouet, Sandrine Leclerc, *On nous appelle "les Karachi" (Ji me re dibêjin "Karaçî")*, Fleuve Noir, Parîs, 2010, 253 rûpel, 17,50 euro

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

www.arsivakurd.com

Nakokîyên Şoreşa Bolîvyayê

Alvaro García Linera *

Hezîrana 2011ê, Fona Darayî ya Navneteweyî (IMF-International Monetary Fond) û Banka Cîhanî (World Bank) pesnê "rêvebirina muhkem a makro-ekonomîk" a hikûmeta Bolîvyayê dida. Çend mehan berî vê, cadeyên La Pazê bûbûn gorepana qêrînên xwepêşanderan ku doza bilindkirina meaşan dikirin. Hindek alîyan "vegera bo neo-lîberalîyê" ya di bin çavdêrîya serok Evo Morales de mehkûm dikir. Gelo dibe ku dawîya wê "vîraja çepê" ya latîn-amerîkan hatibe, ku hatina ser desthilatê ya vî sendîkagerê cotyar û binkî nîşaneya herî berçav a wê vîrajê bû?

Li Bolîvyayê gendelî û bertîl nehate binbir kirin; elîtên nû hindek ji xetayên selefên xwe careke din dubare dikin; dubendîyên civakî dem bi dem dîsa rû didin. Gelo digel vê hindê jî mirov dikare bêje ku rêveberîya Morales "xayîntî" kir? Ma ne kêşeyên li ber "şoreşa demokratîk û çandî" ya Bolîvyayê, heman nîşaneyên nerihetî û alozîyên hereketên veguherîna civakî ne? Ev nezera Alvaro García Linera ye, ku navbirî xwedanê cihekî taybet e di siyaseta latîn-amerîkan de.

Ew kevnegerîla, sosyolog, nivîskarê gelek berheman, di heman demê de cîgirê serokê Dewleta pir-neteweyî ya Bolîvyayê ye. Lewma, tehlîla wî li hember kêşe û dubendîyên ku ew dinirxîne, ne ya çavdêrekî objektîv e: Ew wek siyasetmedarekî ku xemxurê bergîrîkirina îmaj û kiryarên rêveberîya xwe ye, nirxandinên xwe pêşkêş dike. Lê belê, ev yek qîmeta şahidîya wî danaxe: Lewre kêm in ew rewşenbîrên ku bi zehmetîyan re yên ku rastî li ser teorîyên wan ferz dike, rûbirû dibin; bi heman rengî, kêm in ew rêveberên siyasî ku wate û encamên teorîk yên kiryarên xwe analîz dikin.

Bi eşkerekirina kêşeyên ku kolektîvîteyek –gelek, dewletek– tûşî wê dibe, nakokî lezê li peydabûna çareserîyan dikin. Bi rêya van alozîyan, civak bi pêş dikeve, di navbera komên civakî de îtifaq bi rêk dikevin û civak (qismen an jî bi temamî) xwe ji wan astengên li ber geşedana xwe rizgar dike.

Ji sala 2000ê, tarîxa seferberîyên ewil û berfireh ên li dijî taybetîkirina avê, heta 2009ê, tarîxa ji nû ve hilbijartina sendîkagerê cotyar **Evo Morales** bo serokdewletîyê bû (kronolojî û çarçoveya me ya bi navê *"Pênc qonaxên veguhartina dewletê"* bixwînin), Bolîvya di dubendîyeke bingehî re derbas bû ku gelê Bolîvyayê anî hember împeretorîya Amerîkayê û hevalbendên wê yên ji bûrjûwazîya lokal ku bi neolîberalîzmê ve girêdayî ne.

Hilbijartinên 2009ê, ku rêveberîya **Morales** bi rengekî bihêztir jê derket (1), ev gefên derekî lawaz xistin. Hingê, li ser awayê birêvebirina pêvajoya gorankarîyê, *di nav* bloka neteweyî-gelêrî bi xwe de nakokîyên taze peyda bûn, di navbera beşên cuda de ku pêvajoya gorankarîyê bi rê ve dibin. Çar ji van alozîyan, ku hemû jî duhemî ne, nisbet bi dubendîya bingehîn ya li dijî emperyalîzmê, di navenda pêvajoya şoreşger a Bolîvyayê de cih digirin: Li alîyekî, ew alozî li ber mayîn û berdewamîya şoreşê xeter in, li alîyê din, her ew alozî dihêlin ku amrazên ji derbasbûna bo qonaxa paştir bi dest bikevin.

"Hikûmeta me ji nûnerên rêxistinên civakî yên binkîyan, cotyaran, karkeran û feqîran pêk tê"

Ya yekem, derheq pêwendîya di navbera dewlet û hereketên civakî de ye. Xelk ji hikûmetê hêvîya fealiyetên bilez û praktîk dike, kiryarên ku bersivên berdest dabîn bikin ji bo pêdivîyên xwe yên maddî. Ji bo pêkhatina vê hêvîyê divê qonaxa biryargirtinê bi rengekî kêrhatî were navendî kirin, lê belê hikûmeta me ji nûnerên rêxistinên civakî yên binkîyan, cotyaran, karkeran û feqîran pêk tê, ku bêguman dînamîka wê bi xwe pêdivî bi "sebirkirin"ê heye. Dînamîkên guftûgoyê, danûstandinê û tehlîla pêşnîyarên cihêreng. Rengê karkirina van hereketan bi xwe tê wateya zêdekirina hejmara beşdaran di qonaxa biryargirtinê de. Hikûmeta serok Evo Morales *–"hikûmeteke hereketên civakî (2)"–* cihê wê hindê ye ku dînamîkên merkezîker û ademî-merkezîker ên biryargirtinê û dînamîkên monopolîzekirin, yên giştîkirina kiryarên rêveberîyê, di navbera lezgînîya encaman û giranîya muzakereyan de têne hember hev.



Fehmî Balayî: **Destana evîna kurdî I**, Boyaxa rûnî li ser tuwalê, 110 x 100 cm

Bi mebesta helkirina vê nakokîyê, me têgeha *"dewleta entegral"* pêş xist: Kêlîya ku tê de civak bere bere xwe dike xwedana pêvajoyên hekemîyê û bi vî rengî, dijberîya di navbera dewlet (wek makîneya navendîkirina biryaran) û bizava civakî (wek makîneya ademî-merkezîker û demokratîzeker) de ji ji holê radike.

Armanceke wisa, ji bo cîbicîkirina di demeke kurt de nayê pêş dîtin. Ew encama tevgereke dîrokî ye ku ji pêşketin, paşvekişandin û newekheviyan pêk tê. Ew jî, giraniya mêzînê geh dide vî alî, geh dide aliyê din. Bi vî rengî jî yan bikêriya hikumetê, yan jî demokratîzekirina biriyardanê dixe tehlûkê. Di wê demê de ku ji bo çareserkirina dîrokî ya vê nakokîyê pêwîst e, têkoşîn, bi tenê têkoşîn dikare bike ku hevsengîya di navbera wan du qutban de bê parastin.

Alozîya duyem a afirîner berfirehîya pêvajoya şoreşger –ku ji tevlîbûna zêdetir komên civakî yên cuda û ji lêgerîna îtifaqên mezin dizê– û pêdivîya sabîdkirina rêveberîya binkî, cotyar, karker û xelkê (ku ev yek garantîya meyla siyasî ye) tîne hemberî hev.

Serdestîya bloka neteweyî-şoreşger dike ku hevahengîya çînên karkeran wek şertekê xwe dasepîne. Di heman demê de tê maneya ku divê serokatî (ya tarîxî, maddî, pedagojîk û exlaqî) li ber çavên beşa mayî ya gel, weke rohniyarêber were ditîn da ku karibe piştgirtiya wê misoger bike.

Bêguman, beşek ji civakê berambera hegemonîya binkî û çînên nizim, dê timî nejidil û bifikar be, ku, kengî derfet hebe, wê weke pira veguhastina hêzên biyanî tevgere.
Lê belê, ji bo bi duristî saxlemkirina rêveberîya çînên nizim, şert e ku tevahîya civakê pê bihese ku gava çînên karker welatî bi rê ve dibin, rewşa civakê tev de berev başîyê ve diçe. Ev şert û ev pêdivî li ser desthilata çepgir ferz dike ku hesabê birek ji pêdivîyên reqîbên xwe jî bike.

Ji bo derketina ji vê rewşê ne reçeteyek ne jî modêlek heye: Bi tenê guftûgo û perwerde dikarin bihêlin ku ev nakokî tesîra xwe nîşan bide û her dîsa ev her du faktor dikarin wê veguherînin hêzeke motor a bingehê veguherîna civakî.

Xeleka fireh a çalakvanîyan ku sala 2000ê digel şerê li ser avê bi rê ket, ji bizaveke lokal dest pê kir

Sêyemîn alozîya afirîner a pêvajoya me ya guherînê, ev salek e gelek bi rengekî tîr xwe da der. Ew di hatina hemberî hev ya berjewendîya giştî û berjewendîya taybet a grupekê, beşekê an jî ya takekesekî de xuya dibe. Di navbera têkoşîna civakî, hevbeş û komunîst û destkeftên takekesî, sektorî û arizî de.

Xeleka fireh a çalakvanîyan ku sala 2000ê digel şerê li ser avê bi rê ket, ji bizaveke lokal dest pê kir. Lê belê, ev mesele xema tevahîya welatî bû, lewre welat bi xwe di bin gefa projeyên taybetîkirinan de bû. Piştre şerê gazê geş bû û herwiha têkoşîna ji bo meclisa avaker û verêkxistina demokrasîyeke pir-neteweyî bihêz bû: Ev hemû daxwaz û dawekarî beş bi beş ji alîyê gelên binkî û karkeran dihatine berz kirin, tevî ku ew daxwaz û dawekarî xema hemû bindestan, heta ya tevahîya miletê Bolîvyayê bûn.

Derhatina van dawekarîyan –ku li ser barîkatan, di hingama asêkirina cadeyan de, di xwepêşandanan de û di demên raperînên xelkê welatî de hatine dariştin– hişt ku bernameyeke bidestxistina îktîdarê bê saz kirin ku ew bername di heman demê de bikare piranîya xelkê Bolîvyayê bêxe nav bizavê û wan bigihîne hev. Piştî serkeftina sala 2005ê, hikûmetê hewla cîbicîkirina wê hizrê da. Berî her tiştî, *Meclisa Avaker* hate rêkxistin, ku bi vî awayî, bo cara yekê di tarîxê de, rê vebû ku *Destûra Siyasî ya Dewletê* bi destê nûnerên yekser ên hemû tex û çînên civakî yên welatî bê amade kirin. Paşê, me dest avête dewletîkirina şirketên mezin, ku bi vî rengî, derfeta wê yekê çêbû ku beşek ji dahata darayî ya zêdeyî bi rêya bernameya Juancito Pinto, *renta dignidad* ("alîkarîya birûmet") û **Juana Azurduy** bê belav kirin. (3)

Heke em xeleka çalakvanîyê wek xêzeke ku meyla bilindbûnê lê ye binirxînin –tecrubeya dîrokî em fêr kirine ku ew meyl piştî heyamekê digihe hevsengîyekê, û paşê, bere bere dadikeve–, em dibînin ku xisleta sefheya pêşî, an jî sefheya hilbûnê, ew e ku tê de sektorên civakî her zêdetir digihine hev, bernameyeke berfireh û giştî tê saz kirin û li ba tex û çînên "nizim", vîn û meyleke rêkxistî û berçav ji bo bidestxistina desthilatê durist dibe.

Hevsengkirin û îstiqrara bizavê di xala herî berz a xêzikê de, hem beramberî heyama cîbicîkirina yekemîn armancên gerdûnî ye, hem beramberî berxwedaneke bihêztir a komên civakî ye ku pişygirtîyê hêza neolîberal a berê dikin: Bêîstiqrar kirin, hewlên kûdetayê, hereketên cudaxwaz, û hwd. (4) Ev qonaxa "jakoben" a pêvajoyê ku tê de, hereketa civakî ya êdî qalibê hêza dewletî vegirtîye xwe diparêze û bi vî rengî bizav û çalakvanîyên nû û asoyên taze yên gerdûnpareziyê ji bo kiriyarên xwe derdixe holê.

Gelê ku dabeşkîrî ye û ji takekesan pêk tê, bere bere tê û li dora dozeke kolektîf xwe bi rêk dixe

Ji cerga duyemîn dewra desthilata **Morales**, ango ji sala 2010ê û vir ve, em ketine nav qonaxa sêyem a bizavê, qonaxa ku xêzika guherînê berev xwar diçe: Qonaxa alozîyên navxweyî yên bloka civakî-gelperwer, an jî alozîyên di navbera alîyên giştî û arizî de. Derbaskirina vê nakokîyê dê ji bihêzkirina çepera gerdûnî û berfireh a projeya me pêk bê. Heke dawekarîyên komên cuda [qewmî, dînî, hwd.] û şirket û dezgehên yekîtîya şirket û teşebûskaran di vê milmilaneyê de serkeftî derbiçin, jidestdana hêz û şewqa şoreşê dê bibe xala destpêkê ji bo ji nû ve desthilatdarbûna muhafizekaran.

Ev alozîya di navbera dawekarîyên gerdûnî û arizî yên di nav gel de hergav hebûne. Jixwe taybetîyeke şoreşê bi xwe ye: Gelê ku dabeşkîrî ye û ji takekesan pêk tê, bere bere tê û li dora dozeke kolektîf xwe bi rêk dixe. Lê belê, eşkere ye ku sefheyeke nû ya bizav û çalakvanîyê dest pê kiriye, ku jixwe dubendîya dema dawî ya di navbera du fraksîyonên ***Yekîtîya Karkerên Bolîvyayî*** (YKB)(5) de –yek alîgira desthilatê ya din ne– nîşaneya qonaxa navborî ye.

Nîsana 2011ê, mamosteyên dibistanan yên endamên YKByê dest bi mangirtinê kirin ku daxwaza wan a serekî ji vê bizavê zêdekirina meaşan bû. Lê belê, ji cerga sala 2006ê, rêveberîya **Morales** jixwe meaşên karkerên beşên tenduristî û perwerdeyê bi enflasyoneke ji sedî 12ê zêde kirin. Di heman demê de, şaxên din ên îdareya giştî (bo nimûne, wezaretên dewletê) demekê tu meaş nestandin. Meaşên cîgirê serokdewletî, yên wezîr û cîgirên wezîran, ji cerga destpêkirina rêveberîya **Morales** di sala 2006ê de, ji sedî 30 heta ji sedî 60ê hatine daxistin. Kêmkirina meaşê serokdewletî bi xwe hêj zêdetir bû.

Mirov baş têdigihe ku karmendên tenduristî û perwerdeyê doza zêdekirinên nû dikin di meaşên xwe de, lê belê, ev yek bi tenê hingê mumkîn e gava dahatên dewletê bi xwe zêde dibin.

Siyaseta ku serok **Morales** dide ber xwe dixwaze şertên jîyana wan bir û taxên herî lawaz û mexdûr baş bike (6) û dixwaze samanên ji dewletîkirin û ji şirketên dewletî tên di merkezekê de berhev bike. Bername ew e ku di warê hîdrokarbûran, maden, çandinî û kehrebayê de binkeyeke endûstrîyel were durist kirin da ku serweteke xweragir bi dest bikeve û herwiha serkanî û samanên welatî bi rengekî bêne bi kar anîn da ku asta jîyana karkeran, çi li bajaran çi li gundan, baştir bibe.

Gava hikûmet bi erênî bersivê bide dawekarîyên mamosteyan ji bo zêdekirina meaşan, hingê samanên ji dewletîkirinê bidestketî dê tenê ji bo baştirkirina dahatên hindek şaxên sektora xizmetguzarîyan bêne mezaxtin. Bi vî rengî, beşê welatî yê mayî, ango piranîya xelkê welatî, li derveyî planê têne hiştin. Herwiha stratejîya binecihkirina endûstrîyê jî dê bikeve tengasîyan (bo nimûne, kirîna makîneyan an jî avakirina binesazîyan), ku endûstrî ye ya ku dê samanên welatî hilkêşe … û bike ku ew saman û dahatên welatî li gel bêne belav kirin.

Rêveberên sendîkayan, ku heta duhî, ji ber aslê xwe yê civakî, li pêş çavê rojnamevanan biçûk û bêqîmet bûn, bi carekê de bûne stêrkên bernameyên televîzyonî

Bereya rastgir îstifade ji vê alozîya di nav bloka gel de kir û organên xwe yên medyayê bire hawar û alîkarîya xwepêşanderan: Rêveberên sendîkayan, ku heta duhî, ji ber aslê xwe yê civakî, li pêş çavê rojnamevanan biçûk û bêqîmet bûn, bi carekê de bûne stêrkên bernameyên televîzyonî.

Pênc qonaxên veguherandina dewletê, bi nêrîna Alvaro García Linera

Qonaxa yekem (ji 2000ê heta 2003yê) - "Krîza dewletê": Stûnên serdestîya 'edetî diherifin. Nakokîyên qedîmî (dewleta tek-çandî beramber civaka pirneteweyî, dewleta merkezî beramber arezûya ademî-merkezîkirinê ya civakê, û hwd) her ku diçe şedîdtir dibin û di heman demê de nakokîyên nû lê dizên (arizîkirin beramber dewletîkirina samanên xwezayî, hêza siyasî beramber demokrasîya civakî, û hwd).

Qonaxa duyem (ji 2003yê heta 2005ê) - "Lêkdanên bobelatî": Du projeyên civakê li hemberî hev, ji herduyan jî tê bi awayekî berfireh seferber bikin.

Qonaxa sêyem (2005) - Hilbijartina cotyarekî çermesor bo serokatîya Komarê: Ev dabira di rista sembolîk de nayê wê me'nayê ku çînên serdest hêz ji dest dan. Lê belê, digel vê yekê, nakokîyên di navbera çînên civakî de ketine nav sazîya dewletê.

Qonaxa çarem (ji 2005ê heta 2009ê) - "Xala eşkerebûna duriyanan": Dijminatî digihe asta xwe ya herî bilind, ango lêkdan û bihevketinê. Pêvajo bi "serkeftina" bereya Moralesê ku sala 2009ê careke din hate hilbijartin, bi dawî bû.

Qonaxa pêncem (ji 2010ê ve) - Nakokîyên di nav bloka "neteweyî-gelperwer" de: Nirxandina berfireh di gotara li hember de ye.



Fehmî Balayî: **Evîndar III**, Boyaxa rûnî li ser tuwalê, 65 x 50 cm

Em ên ku *"hikûmeta hereketên civakî"* ne, hewldana me ew e ku cudatîyên di nav bloka gelperwer de bi raya giştî bê munaqeşe kirin. Em hewl didin alozîyên di navbera meylên "korporatîst" û "gerdûnî" de bi rêyên demokratîk çareser bikin; ji bo vê yekê, pêşengan (gelên binkî, cotyar, xebatkar, karker û şagird) han didin ku alaya berjewendîya hevbeş û giştî hilgirin, ku ev yek nayê wateya bêrengkirina takekes û berjewendîya taybet, belku tê wateya di nav çarçoveyeke bêtir giştî de tayînkirina hebûna wê ya mentiqî û maqûl.

Nakokîya çarê ya afirîner ji dijatîya di navbera pêdivîya serfkirina madeyên xam (endûstrî) û endîşeya hesasbûna beramber xwezayê, ango "jîyana bi tewazun" dertê. (7)

Gazindan li me dikin ku me nekarîye samanên xwezayî "bi rastî" bikin dewletî û ku me hiştiye şirketên navneteweyî beşek ji saman û dewlemendîyên welatî têxine bin destê xwe. (8) Lê belê, heke em bivê bi yekcarî xwe ji şirketên bîyanî rizgar bikin, divê em bixwe şarezayên wan amraz û teknîkên teknolojîyê bin ku di destê wan de ne: Wek amrazên teknolojîk ên derxistin û serfkirina madeyên xam. Halê heyî, rewş ne wisa ye. Lewma dewletîkirina yekcarî û temamî bêyî derbaskirina qonaxa binecihkirina endûstrîyê çênabe.

Gihiştina bi fealkirina dînamîkeke wisa dê qaseyên dewletê tijî bike, ji ber ku malên îmalkirî û berhemên nîv-çêkirî nirxekî zêdetir ji yê madeyên xam ên neserfkirî, ku em îro îxrac dikin, tîne. Qonaxa binecihkirina endûstrîyê herwiha bi kêrî bilezkirina pêşketinên teknolojîk dike û bireke zanyarîyên zanistî dabîn dike ku tê heye ew paşxaneya zanyarîyan bibe bingehek ji bo kiryar û hewlên nû yên endûstrîyel ku bêtir xwe bispêrine teknolojîyê û keda mirovan.

Kargeheke petrokîmyayê qederê yek mîlyar dolaran e, kargeheke termoelektrîkê ji yekê heta sê mîlyar dolaran biha ye

Ne hêsan e mirov li ser vê rêyê bikudîne. Li rexekî, ji ber ku em di vî warî de ne xwedan tecrûbe ne, ev yek me mecbûr dike di heman demê de hem fêr bibin û hem pê kar bikin. Li destpêkê, modernîzekirina endûstrîyel pêdivî bi veberhênanên qerase heye: Kargeheke petrokîmyayê qederê yek mîlyar dolaran e, kargeheke termoelektrîkê ji yekê heta sê mîlyar dolaran biha ye. Xulase, pêvajoyeke dûr û dirêj e: Destê kêm sê sal lazim in ji bo destbikarbûna binkeyên endûstrîyel ên herî biçûk, pênc û şeş sal ji bo yên weset û herî kêm deh sal ji bo kargehên herî mezin.

Hikûmetê biryar girt ku endûstrîya gaz, lîtyûm, (9) hesin û hindek rezervên avê saz bike. Hindek rewşenbîran ev pêvajoya avakirina şirketên giştî wek derhatina kapîtalîzmeke dewletî nirxandin, ango li dijî binecihbûna vîzyoneke *"cemawerperwer"* û komunîst. (10) Bi dîtina me, kapîtalîzma dewletî ya salên 1950yê, şirketên mezin xistine bin xizmeta zumreyên muşterîyên taybet: Burokrasî, grupên patronan, xwedanên erdên berfireh, û hwd. Lê, bikaranîna zêdeyîyên ji bihêzbûna endûstrîyê, ku *Bolîvya* teşwîq dike, êdî pêşanîyê dide nirxê serfkirinê, ne ku nirxê wê yê ticarî (11): Ango xema qetandina pêdivîyan berî qazancê tê. Bo nimûne xizmetên bingehîn (av, elektrîk, û hwd.) wisa ne, niha wek mafekî mirovî têne dîtin û lewma têne belav kirin, ango lazimbûna wan ji qazanca wan girîngtir e. Herwiha hewla dewletê ya kirîna berhemên çandinîyê jî dîsa ji bo wê hindê ye ku teqez bike ku gel xurekan bi dest dixe û mal û berhem bi bihayekî "maqûl" têne firotin: Biha wisa têne diyar kirin ku berhem ji bo bikarhêneran berdest bin, ango bihayê berheman bi nisbeta erz û telebê naguhure.

Gava xweza hest bi êrişa li ser xwe dike, di dawîyê de benî-adem pê diêşin

Hatinîya zêdeyî ya ku ji endûstrîyê dikeve destê dewletê dihêle ku dewlet mentiqa kapîtalîzmê ya xwedantîya arizî bixe ber lêpirsîne. Lê belê, bidestxistina serwet û dewlemendîyên wisa dibe binasê bireke netîceyên ji bo xwezaya xirab, ji bo erdî, rêl û daristanan û çîyayan. Û gava xweza hest bi êrişa li ser xwe dike, di dawîyê de benî-adem pê diêşin.

Hemû kar û kiryarên endûstrîyel bi xwe re bihayekî ji bo xwezayê tînin. Lê belê, kapîtalîzmê tehekuma xwe li ser hêz û şîyanên xwezayê çêkirin, su-î îstimal kirin; ango, şîyanên xwezayê xistine bin xizmeta destkeftên taybet, bêyî ku bihizirin ku xerîkê tovê berdar ê xwezayê bi xwe dirizîne. Şert e ku em xwe ji wê qedera, ku rêçeke wiha dê me bibeyê, biparêzin.

Şîyanên gundî û cotyaran yên berhemhênanê û etîka pîşeyî ya cotyaran, bi rengekî dijî mentiqa kapîtalîst tesîrê li pêwendîyên me yên digel xwezayê dike. Ew me han didin ku xwezayê wek beşek ji organîzmeke wisa bibînin ku zindî ye, tekmîl e û mirov û civak bi xwe jî parçeyên wê ne. Bi ya vê vîzyonê, bikaranîna şîyanên îmalkirinê yên xwezayê divê di çarçoveya helwêstekê de bêne gerandin ku rêzê li prensîbên temamî û berdarîya xwezayê bigire.

"Mirovîkirina xwezayê û xwezayîkirina mirovî (12)", digot **Karl Marx**. Ev e wateya projeya me: Berê xwe bide zanistê, teknolojîyê û endûstrîyê ji bo hilberîna dewlemendîyan –heke na, çawa dê cadeyan, binkeyên saxlemîyê û dibistanan ava bikin ku hemû jî şert in ji bo tetmînkirina daxwaz û hêvîyên civaka xwe?– lê avanî û şiklê bingehîn yê xwezayê baş biparêze. Ji bo xwe, lê herwiha ji bo neslên paşerojê.

Kronolojî

2000 - Şerê li ser avê, rêkxistin û çalakkirina şênîyên bajarê Cochabambayê ku li dijî arizîkirina xizmeta belavkirina avê radibin. "Şerê avê" sala 2005ê jî dikudîne û şirketa fransî ya pirneteweyî ya avê Suez-Lyonnaise tê qewirandin.

2003 - Şerê gazê, raperîneke ku li dijî projeya teslîmkirina rezervên mezin ên gaza xwezayî li ser konsorsîyomeke bîyanî dest pê kir. Têkoşîna ku li dû xwe 67 mirî û nêzîkî 400 birîndar hiştin, bi ketina serokdewlet Gonzalo Sánchez de Lozada û bi devjêberdana ji projeyê aşt bû.

2005 - Hilbijartin, %53ê ji dengan diçin bo **Evo Morales**, rêveberê cotyar û çermesor, serokê Hereketa ber bi Sosyalîzmê ve -Amrazê Siyasî ji bo Serwerîya Gelan (MAS-IPSP an jî MAS). MASa ku sala 1995ê bi rê ket, meylên dijber ên di nav çepgiran de bi xwe ve digire (sendîkagerîya marksîst, çermesor-perwerî û nasyonalîzma şoreşger).

2006 - Hilbijartina **Meclisa Avaker**, ku di kanûna 2007ê de xebatên xwe diqedîne.

2008 - Serhildana herêma rojhilatî ya **Media Luna** (di bin rêveberîya muxalefetê de). Hewla darbeyê. Morales di referandûma bawerîpêdanê de serkevtî derdikeve. **Qewirandina balyozê amerîkî yê** li Bolîvyayê.

2009 - Pejirandina **Destûra nû** bi referandûmê. Ji nû ve hilbijartina Morales bo serokdewletîyê, bi % 64ê dengan.

Alozîyên afirîner ku bloka gelperwer a desthilatdar li Bolîvyayê xistine ber tesîra xwe, reng û qalibê dînamîkên guherînê jî dîyar dikin: ma ne şoreş bi xwe lehîyên kaotîk ên teşebûsên cemawerî û civakî ne, şewq û hêzên pirtik û parî ku lêk rast dikevin, têne hember hev, li hev zêde dibin û şikil didin hev da ku jinûve dabeş bibin û careke din li hev rast bikevin? Serqise, di vê bareyê de tu tişt ji berê ve dîyarkirî nîne.

* Cîgirê serokdewletê, dewleta pirneteweyî ya Bolîvyayê. Nivîskarê Pour une politique de l'égalité: Communauté et autonomie dans la Bolivie contemporaine, Les Prairies ordinaires, Paris, 2008.

1 Hilbijartinên kanûna 2009ê, li dû heyameke hewlên bêhêzkirina siyasî ji bo hesaskirina serok **Evo Morales** bi rê ve çûn, ku Morales di van hilbijartinan de namzedê xelefîya xwe bû. Hindek ji wan hewlan ev in: Raperîna herêma rojhilatê ***Media Lunayê***, referandûma beqayê, hewla darbeyê, rûbirûbûna digel *Washingtonê*. Tevî vê, Moralesî ji sedî 64ê dengan wergirtin, ku sala 2005ê rêjeya dengên wî sedî 53 bû. Ev têbînîyên di binê rûpelan de yên redaksîyonê ne

2 Îfadeya "hikûmeta hereketên civakî" tê wê wateya ku digel hilbijartina **Morales** êdî hereketên civakî (ku ji serê salên 2000ê ve xerîkî bizav û çalakvanîyê ne) bûne xwedîyên hikûmetê

3 Bi rêzê: Bernameya îmkana perwerdeyê bi rêya belavkirina "kûpon" an *jî voucher*an, ji sala 2006ê ve; xalîkirina alîkarîya darayî bo pîremêr û pîrejinên ji şêst salî mezintir, ji sala 2007ê ve; bernameya têkoşîna li dijî mirina zarokan, ji sala 2009ê ve

4 Li ser vê mijarê bnr. **Hernando Calvo Ospina**, "Petit précis de déstabilisation en Bolivie", *Le Monde diplomatique*, hezîran 2010

5 Yekîtîya sendîkayan a serekî li Bolîvyayê, ku di dema şoreşa 1952yê hatiye ava kirin

6 Bi pêy statîstîkên Komîsyona Aborîyê ya Neteweyên Yekgirtî bo Amerîkaya Latîn û Karayîban (CEBAL), di navbera 2004 û 2007ê de rêjeya feqîrîyê xelkê welatî ji sedî 63.9ê daket bo sedî 54ê (statîstîkên herî dawî yên berdest)

7 Wergera "sumak kawsay" bi zimanê quechua, û "sumak qamaña" bi zimanê aymara, têgehek e ku sala 2009ê di destûra Bolîvyayê de hate nivîsîn

8 Gulana 2006ê, serok Evo Morales "dewletîkirina hîdrokarbûr"an radigihîne. Lê belê ne bi temamî çêdibe: Cextê lê dike ku teknolojîya lazim li ber destê wan nîne da ku bikarin bi bêxemî şirketên taybet ên partner veder bikin. Lewre, dewlet kontrola ji sedî 51ê sermîyanê hemû operatorên li ser axa welatî werdigire. Herwiha jinûve li ser girêbestan guftûgoyan dike da ku ji sedî 82yê dahatan (bac û heqê îstimalê) bistîne

9 Bolîvya xwedana rezervên herî girîng ên vê metalê ye, ku bi taybetî ji bo çêkirina bateriyên elektrîk tê bi kar anîn.

10 Nivîser behsa komeke rewşenbîran dike ku ji raya giştî re manîfestoyek eşkere kirin "Ji bo jinûve bidestxistina pêvajoya guherînê bo gel û bi destê gel", 18ê hezîrana 2011ê

11 Nirxê bikaranînê, bikêrîya berçav a malekê nîşan dide; nirxê ticarî, tê wateya nirxê malekê li bazarê

12 Karl Marx, *Manuscrits de 1844*, Editions sociales, Paris, 1972

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

www.arsivakurdi.org



Îlon 1987

Tirkiye li bazarên Ewropayê

Kurdistan: Pirsgirêkeke bêhempa

Christiane More

Weke Îran û Iraq di şer de, divê Tirkiye jî bi tevgera nû ya veqetînxwazîya kurd re rû bi rû bimîne. Li gel vê yekê jî, ji dema ku ji alîyê Ataturk ve hatiye ava kirin û vir ve, dewlet li ser xeyalsazîya civakeke homojen dijî û qeti'iyen xwe nade ber venasîna mafên xweser ên deh mîlyon kurdan, ku piranîya wan li herêmên herî xizan ê Rojhilat û Başûrê Rojhilata Tirkiyeyê dijîn.

Eger piranîya van ên li herêmên herî paşdexistî dijîn, tenê bi kurdî diaxivin –tevî qedexekirina vî zimanî ji 1924an ve (1), yên din jî, hejmareke mezin li bajarên mezin di dema penaberîya xwe ya aborî an jî siyasî de -sala1985ê bi qasî mîlyonek karkerên kurd li xerîbîyê ne- dibin xwedî hişmendîya nasnameya xwe. Kurdên penaber li welatên ku lê tên pêşwazî kirin, di nav komele an jî dibistanên duzimanî de –weke Swêdê- dibin xwedî derfeta fêrbûna xwendin û nivîsandinê.

Îro hê jî piranîya tirkan vê pirsgirêkê weke pevçûneke basît a navbera eşîran û netewperestîya dewletê dibînin û li gor wan, kurd ji alîyê deshilatîya navendî bêhtir, ji alîyê axayan ve (beg û axa, xwedîyên gund û milkên mezin) tên perçiqandin. Û weke nimûnê gotinê tînin ser derdoreke bijarte ya kurd "tirk" a ku dibe beşdar û destekê dide pêşvebirina jîyana neteweyî di warê wêje, muzîk û siyasetê de. Lê belê ji bo azadîya xweîfadekirinê ya jinûvebidestxistî, hejmarek rojname û kovar pirsgirêkê dinirxînin û balê dikşînin ser daxwazên kurdan û mafê axaftinê didin alîgirên xweserîyê –bêyî ku wêdetir biçin û behsa serxwebûnê bikin.

Piştî derbeya eskerî ya 12ê îlona 1980yê, deshilata eskerî , êrişên jihevxistinê dibe ser rêxistinên kurd ên ku di salên 70yê de ketibûn nav geşedan û pêşveçûneke nû û di heman demê de navûdengê pêşengê serhildana kurd a li Iraqê Mustafa Barzanî jî li her derê belav bûbû. Siyaseteke zextûreptê ya heta radeyekê dişibiya ya piştî serhildana Dêrsimê, dihat meşandin: Girtinên girseyî, birîna cezayên mirinê, surginkirina gelek kesayetîyan… Lê belê, eger piştî Dêrsimê, dewlet karî veqetînxwazîya tevgera kurd hefsar bike, îro, tevger berevajîyê wê demê radîkaltir bûye: Berê kurdan doza venasîna mafên neteweyî dikir, îro ew bi taybetî bi navgîna tevgerên tundrew –ku Partîya Karkerên Kurdistan PKK xwe weke pêşenga vê dozê dibîne– ji bo bigihîjin armanca xwe şerê çekdarî jî tê de hemû rê û rêbazan bi kar tînin.

Ev veguherîn, paralelê raperîna tevgera pêşmergeyên Iraqê û Îranê, di heman demê de bû hawarek ji bo ku hêzên derve yên ku hertim mohra xwe li serhildanên kurd dane, dest di rewşê werdin. Di bîranînên xwe de **Henry Kissinger** dinivîsand ku di 1974ê de "*şah bi destekdayîna serhildana kurd a li nav sînorên Iraqê, rejîma vî welatî tengezar dikir* (2) *"*. Îro jî, Bexda destekê dide kurdên Îranê, Tehran destekê dide yên Iraqê û Enqere jî Sûrîyeyê bi cihdayîna PKKê tewanbar dike.

Gelek tedbîrên ji 1984ê ve ji alîyê hukûmeta tirk ve hatine standin, nîşan didin ku bi biryardarîya PKKê pir paxav tê kirin: Ji alîyê komandoyên hewayî ve operasyonên eskerî yên lêgerîna li gundan, lihevkirina li ser ewlekarîya sînoran (pêşî li gel Iraqê di cotmeha 1984ê de, dûre li gel Îranê -tevî ku ew vê yekê înkar jî dike-, nîhayet li gel Sûrîyeyê di tîrmeha 1987ê de), qanûna sala 1985ê ya afirandina mîlîsan ji bo *"parastina gundan"* (3), qanûna poşmanîyê, qanûna peredayîna ji bo *"nêçîrvanîya serên mirovan"*, di 1986ê de sazkirina tûgaya tîmên taybet ên li dijî terorê yên li Dewletên Yekbûyî hatine perwerde kirin, seranserî sînorê başûr pêkanîna herêmeke valakirî ji mirovan, valakirina gundên li deverên stratejîk –ev tedbîra dawî weke daxwaza bixêrûberkirina wîlayetên rojhilat hat pêşkêş kirin.

Û ev serkeftineke veqetînxwazan e, herçendî di çarçoveyeke aborî de wê dorpêç bikin jî, rayedarên Enqerê îro êdî qebûl dikin ku pirsgirêkeke Anatolîya Rojhilat (binavkirina fermî a Kurdistana Tirkiyeyê) heye.

Li himberî vê vegera bi heybet a pirsgirêkên li *"herêmên rojhilat"*, hukûmet hewl dide giranîyê bide biserûberkirina hin deverên ku heta niha ji alîyê aborî ve pir li paş ketibûn. Avakirina bendavan li ser ava ***Firatê*** (ku yek jê bendava Ataturk e) wê herêmê raguheranda herêmeke bixêrûber û di encamê de "asîmîlasyona çîyayîyên serhişk" jî pêk bihata.

Bi heman bîrbirinê, projeya veguheztina gel a ji şêst û heft wîlayetên welêt tesîr li pêncî û du wîlayetan kir, di despêka sala 1987ê de weke tedbîra ji bo "*rûniştivanên gundên reqûrût li herêmên bixêrûber ên rojava bên bi cih kirin"* ji alîyê wezareta daristanan ve hat pêşkêş kirin. Ji bo çepê tirk û derdorên koçber dibûn, ev plan berî hertiştî dihat wateya jihevbelavkirina gundîyên du sed û sê gundên wîlayeta ***Tuncelî*** *(navê ku piştî perçiqandina serhildana kurd a 1938ê li* ***Dêrsimê*** *hat kirin), "ev wîlayeta ku lê serê her mirovî sê jandarma hene",* berê jî piştî çalakîyên pêşî yên gerîla yên di 1984ê bûbû hedefa tedbîrên wisa. Li gor PKKê, ev operasyona berdewama siyaseta dewletê ye û weke berê îro jî armanca vê cihguhezandina şênîyên kurd û bitenêhiştina rêxistinê ye.

1 Ji bilî tirkî bikaranîna zimanekî din dikare bi 100.000 lîra û ji salekê heta sê salan bi girtinê were ceza kirin

2 Salên bi firtone , Fayard, 1982, rûpel 835

3 Meaşê mîlîsekî du qatî yê karmendekî ye

Wergera ji fransî: Baran Nebar

Arşîva bîra Kurdan

Christiane More Fakulteya Hiquqê ya Grenoble temam kiriye, naskirina wê ya kurdan di 1974ê de gava Barzanî li dijî zagona otonomîyê rawestiyaye, çêbûye. Li INALCOyê li ser kurdan xwendiye û gelek caran çûye herêmên cûrbecûr yên Kurdistanê, bi rêveberên rêxistin û partîyên wan re hevdîtin kiriye. Pirtûkeke wê li ser kurdan bi navê "Kurd Îro, Tevgereke Netewî û Partîyên Politîk" di nav weşanên L'Harmattan de derketiye.

Di nivîsa xwe ya bi navê "Tirkiye li bazarên Ewropayê/Kurdistan: Pirsgirêkeke bêhempa" de Christiane More bal dikişîne ser tevgera dema nû ya têkoşîna kurd û rewşa neder ya Tirkiyeyê ku hîn jî dixwaze kurdan bi darê zorê îdare bike û hemû rêyan diceribîne ku kurdan bê maf bihêle. Di şerê li dijî kurdan de tu rê û tu sazîyên neqanûnî nemane ku neceribandiye, dîsa jî pirs mezintir bûye. Îro nêzîkê mîlyoneke kurd li derveyê welat dijîn, xwe organîze kirine û li hin welatan mafê perwerdeya bi zimanê kurdî wergirtine, bi xwe di nav şîyarbûnekê de ne û Tirkiye hîn jî di wê hizrê de ye ku kurd ji alîyê axa û feodalan ve tên bi rê ve birin, lê ew li doza xwe xwedî derdikevin. Tirkiyeyê demeke dirêj cîranên xwe ku wan jî Kurdistan dagîr kiriye, bi alîkarîya tevgerên kurd tawanbar kiriye û ev yek jî rê li ber lihevhatina wan girtiye, lê feydeya kurdan jî di vê yekê de çêbûye. Di salên dawî de bi hin projeyan Tirkiye dixwaze pêşwazîya pirsa kurd bike, ev yek li hember daxwazên kurdan gelek qels dimînin.

Français Georgeon lêkolînvanekî dîroknas e û li welatên wek Tunis, Tirkiye û yên din di zanîngehan de li ser welatên rojhilat û paşê jî li Fransayê di INALCOyê de kar kiriye. Mijarên wî bi taybetî li ser nasyonalîzm û nasyonalîzma ronakbîrên misilman in. Bi lêkolînên xwe yên li ser Tirkîyeya nûjen tê nasîn.

Di nivîsa xwe ya bi navê "Li qadeke bi şer û pevçûn" de Georgeon rewşa Rojhilata Navîn, rol û daxwazên Tirkîyeyê analîz dike. Tirkîye ku derdora xwe, cîranên xwe hertim wek dijmin dibîne, çavê xwe ji Mûsilê qut nake û di salên dawîyê de têkoşîna kurdan jî zor dide wê, dikeve nav hewldanên erênî bi cîranên xwe re, lê ev yek ewqas hêsan xuya nake, ji ber ku pirsgirêkên Tirkîyeyê bi Sûrîyeyê re ji ber pirsa Hatayê kûr in, pirsa Qibrisê çareser nebûye û Tirkîye dev ji Kerkûk û Mûsilê bernedaye; rewş ber bi tevlîhevîyeke ku dijberî hîn kûrtir dibin ve dimeşe. Tirkîyeyê pîştî avakirina komara xwe pişta xwe daye hêzên derva, mîna DYA û guh nedaye alozîyên herêmê û çareserîyeke daîmî di herêmê de pêk neanîye, pirsgirêk her çûye zêdetir bûne, niha jî dixwaze bi rêya bazirganîyê û bi rêya barajên li ser çemên Dîjle û Feratê pozîsyona xwe ya li hember cîranên xwe xurt bike.

LMdkurdî



Fehmî Balayî: **Avabûn**, Boyaxa rûnî li ser tuwalê, 100 x 80 cm



Li qadeke bi şer û pevçûn

Lêgerîna dîplomasîyeke herêmî

François Georgeon

Encama muzakereyên dewletên hevgirtî li ser parvekirina Rojhilata-Navîn di dema şerê cîhanê yê yekemîn de û têkilîyên nû yên hêzan piştî serkevtinên *kemalîstan* û kesixandina Împaratorîya Osmanî herwiha bûn sedem ku Kurdistan careke din were parve kirin, hejmareke mezin şênîya ereb di nav sînorên Tirkîyeyê de bimîne û gelek tirk jî ji welatê xwe qut bibin. Sînorê nû yê Tirkiyeyê yê zêdetirî 2 200 kîlometre dirêj (ku zêdetirî 1 400 bi Sûrîyeyê re ye) çolter û çîyayan diqelêşe û dibe xetereyeke berdewam ji bo sî hezar eskerên ku li ser sînor weke "mertal" tên bi kar anîn.

Ne tenê kurdên pêşmerge, herwiha her cure kesên derqanûnî, qaçaxçîyên çekfiroş, haşîşfiroş an jî heywanfiroş, weke ku rêya kanîyê be, bi rûkûpêkî sînorê kujer diqelêşin û derbas dibin. Helbet, li ber çavên bi hêrs û matmayî yên rayedarên tirk, herwiha propagandaya pêlên radyoya Tehranê yên di ser sînoran re xwe digihînin Anatolîyê jî, li van çizirînên qaçax zêde dibe. Lê belê divê bê gotin ku ev sînorê ku di bin de çemekî petrolê diherike –bi navgîna xeta lûleya *Kerkûk-Yûmûrtalikê*,- herwiha dibe rêya trafîkeke tund a kamyonên di ser sînorên her du alîyên şerê kendavê bazirganîya petrolê dikin; ha di vê navberê de di demeke nêz de wê xeta lûleya *Ahvaz-Dörtyolê* jî bikeve xizmetê û ev ê jî derfetê bide Îranê ku qismek ji zêrê xwe yê reş îxrac bike û xwe ji xetereya tengava Ormuzê rizgar bike.

Îmaja ku tirk û cîranên xwe ji hev re didin xuya kirin, ji bêbawerî û nefretê ne bêpar e. Ji dema daxwazên xwe yên têkildarî herêma Mûsilê û sancaxa Hatayê (1) û vir ve, tirk ji ber xeyalên xwe yên dagîrkerîyê jî dibin sedemê peydebûna gumanan. Hewldana Tirkiyeyê ya piştî şerê duyemîn ê cîhanê, ji bo ku bibe endama kampa rojava, venasîna wê ya dewleta Îsraîlê, îmzekirina *Pakta Atlantîk* di 1952yê de û di 1955ê de jî îmezkirina *Pakta Bexdayê*, tirk veguherandin hevalbendên bêşertûmerc ên rojava û hevkarên emperyalîzma amerîkî. Ev êdî bû pênasa tirkan a guherandina wê pir dijwar e. Di van bîst salên dawîyê de tevî hemû guherînên ku di siyaseta xwe ya derve de pêk anîn, tirkan nekarîn îmaja xwe biguherînin. Ji ber ku baregehên eskerî yên li Anatolîyê, divê bibin qadên xwelêgirtin û jêfirînê ji bo Hêza amerîkî ya ku kengê bixwaze, karibe bi lezûbez destê xwe têxe nav tevahîya herêmê.

"Pirsgirêka Mûsilê"

Ji alîyê xwe ve, tirkan jî "derba xencera ji paş ve" ya serdema şerê yekemîn ê cîhanê ji bîr nekir. Serhildana ereban li enîya başûr a Împeretorîya Osmanî ya ku li dijî welatên Hevpeyman şer dikir, ji bîra tirkan neçûye. Û ew îro jî nikarin ji tirsa peşkên şoreşê yên ku dikarin ji Îranê berbelav bibin, serê xwe rihet bikin.

Tevî nakokîyên dîrokî û cudahîyên îdeolojîk û siyasî, Tirkiye hewl dide li gel cîranên xwe yên Başûr-Rojhilat bikeve nav danûstandinên baş. Lê belê heta niha jî nekariye vê yekê li gel Sûrîyeyê pêk bîne ji ber ku vê dewletê Hatay ji bîr nekiriye û ew jî ji ber îdîayên cihdayîna pêşmergeyên *Partîya Karkerên Kurdistanê* (PKK), bi awayekî rêkûpêk ji alîyê Enqerê ve tê tewanbar kirin. Lê belê Enqere di nêz de wê serî li navgîneke bi tesîr a zextê bide: Projeyeke dêwane ya bendavên hîdroelektrîk a Başûr-Rojhilatê Anatolîyê ku wê derfetê bide Enqerê dest deyne ser ava çemê Firatê ku ji bo axa Sûrîyeyê pêdivîyeke jîyanî ye.

Îran û Iraq jî di nav çend salên dawîyê de piştî Almanyaya Federal di warê bazirganîyê de bûn duyemîn û sêyemîn partnerên herî mezin ên Tirkiyeyê. Di şerê *Kendavê* de, Enqerê hewl da di navbera alîyên şer de bibe xwedî helwêsteke bidenge û wekhev û di ber re jî di çarçoveya *Rêxistina Konferansa Îslamî* de bû yek ji navbeynkarên rawestandina şer. Lê belê herçendî Enqere bêalîbûna xwe îlan bike jî, dîyar e ku ew ê ji encamên serkeftineke artêşa Îranê pir jî kêfxweş nebe.

Ev siyaseta cîranîya baş beramberî Rojhilata Navîn tê wateya stratejîyeke firehtir. Qeşaya navbera Enqerê û cîranên wê piştî bîst salan dihele. Enqereya di pirsgirêka Qibrisê de, bi tenê hatî hiştin, hewl da desteka ereban wergire, dûre jî piştî du buhranên petrolî yên salên 1973 û 1979ê, Tirkiye –ku xizana hîdrocarburê ye– kete nav hewldana xwenêzîkkirina hilberînerên mezin ên weke Erebistana Suûdî, Lîbya, Iraq û Îranê. Ji dema destpêkirina lîberalîzma aborî ya 1980yê û vir ve, bazarên Rojhilata Navîn –berxwirên herî mezin ên xwurekî û pîşesazîyî– ji bo îxracatên welatên hilberîner rêyeke esasî vekirin.

Tevî daketina fiyeta petrolê û şerê ku dawî lê nayê yê Kendavê, Tirkiye li tevahîya herêmê bû xwedî giranîyeke dezgehî (nexasim di çarçoveya Rêxistina Konferansa Îslamî de), ya aborî û diravî (sê sed fîrmayên ku li wir dixebitin di berdêla qasî 15 milyar dolaran de peyman îmze kirine) û Tirkiye dixwaze vê yekê baş binirxîne da ku ji serlêdana xwe ya endamtîya Civaka Ewropî re jî bibe palpişteke girîng. Xewna qedîm ya Ataturk –azkirina "pirekê" di navbera Ewropa û Derya Spî ya rojhilat de– êdî pala xwe dide bingehên zexim.

Bi vê bîrbirin û bergehê, pevçûnên dawî yên dijwar bi gerîlayan re, li ser sînorên Iraq û Sûrîyeyê gelo dikarin weke tiştekî ji rêzê an jî destpêka têkçûnekê werin nirxandin? Gelo Tirkiye bi vî awayî xwe naxe xetereya kaşbûna nav şer? Êdî ne tiştekî veşartî ye ku ev demek e li hin derdorên Enqerê ***"pirsgirêka Mûsilê"*** careke din tê mazatê: Lihevnekirineke têkildarî xakê li dadgeheke Civata Neteweyan di 1926ê de hatibû çareser kirin û di encamê de ev wîlayeta ji alîyê petrolê ve dewlemend di berdêla tezmînateke diravî de radestî Iraqê hatibû kirin. Li gor hin çavdêran, îro eger Iraq ji alîyê siyasî an jî eskerî ve ji hev bikeve, Tirkiye bi bahaneya pêşîlêgirtina avabûna Kurdistaneke serbixwe li ber derê xwe û ji bo tedarîkkirina pêdivîyên xwe yên petrolê, bi awayek ji awayan wê bikeve nav hewldana dest têwerdana Mûsil û Kerkûkê. Hêzên eskerî yên Enqerê bi xwespartina lihevkirineke bi Bexdayê re heta niha ji bo şervanên kurd gelek caran ketin nav xaka Iraqê. Lê belê gelo macerayeke mezintir wê ne nakokîyeke mezin be ji bo Tirkiyeya ku entegrasyona di nav civaka ewropî de ji xwe re kiriye armanc û ji bo vê yekê bi salane têdikoşe?

1 Xaka ji alîyê kemalîstan ve, di 1920ê de, tevlî nav sînorê Tirkiyeya nû hatibû kirin, piştî şerê yekemîn ê cîhanê ketibû bin destê rêveberîya fransî ya li Sûrîyeyê. Ev xak wê di hezîrana 1939ê de tevî protestoyên netewegirên Sûrîyeyê yên doza wê dikin, de careke din radestî Tirkiyeyê bihata kirin

Wergera ji fransî: Baran Nebar



Fehmî Balayî: **Keçeke kurd**, Boyaxa rûnî li ser tuwalê , 80 x 50 cm

Wênesazê vê hejmarê



Fehmî Balayî

Fehmî Balayî, sala 1963ê li Berwarî ya bi ser Duhokê ji dayik bûye.

Balayî di 1986ê de xwendina xwe li *Enstîtuya Huner a Mûsilê*, beşa wênesazîyê bi dawî anîye. Di navbeyna salên 1992-1995ê de li *Enstîtuya Huner a Duhokê* mamostetî kirîye. Ji sala 1993yê heta 1995ê li Duhokê serokê *Yekîtîya Hunermendên Kurdistanê* bû.

Sala 1995ê hatiye Almanyayê û li Berlînê bi cîh bûye. Ji wê demê û vir ve li Berlînê dijî û xebatên xwe yên hunermendîyê didomîne.

Hunermend Balayî, her çiqas di hin xebatên xwe de ji hêla stîl û teknîkî ve di bin bandora hunermendên ereb de be jî, ji taybetmendîyên kurd tawîzê nade. Ev yek jî wî ji hunermendên ereb cihê dike. Balayî, hewl dide xwe ku bi tesîra tiştên ji wêneya ereb digire, wêneya kurd biafirîne. Ev hewldana wî ne bi tenê di xebatên wî yên wênesazîyê de, di heman demê de di berhemên wî yên nivîskî de jî tê pêşberî me.

Hunermend, di xebatên xwe de ji firçeyê zêdetir spatûlayê bi kar tîne. Ev xebatên bi spatûlayê tên kirin, cihê ye û ji alîyê kûrayî ve jî bi ser ketîye. Hunermend, rengên welatê wendabûyî; lêgerîna xemgînî, jan, bêrî û wendayîyê bi aheng û harmonîya rengan û bi awayekî lihevhatî û ji mubalexayê dûr pêşberî me dike.

Balayî, li Almanyayê, Ewropayê û li Kurdistanê beşdarî gelek pêşangehan bûye û di nav hunermendên ku ji Kurdistanê beşdarî ***Bienala Venedîkê*** ya 2009ê bûne de, cîh girtîye.

Fehmî Balayî, edîtorîya kovara hûnera wêne **Rengîz** ku li Kurdistana Başûr tê weşandin dike û serokê *Enstîtuya Kurdî ya Kölnê* ye.

Bi navên ***Dîroka Hunera Şêwekarî*** û ***Cîhana Rengan*** du pirtûkên hunermend hatine çap kirin.

Ji bo agahîyên zêdetir hûn dikarin li malpera hunermend Fehmî Balayî, www.balayart.de binêrin.

Pirsgirêkeke bi qasî serxwebûnê kevnar

Dij-Ronahiyên îroj

Zeev Sternhell *

Şerrê ku li dijî ramana Ronahiyan tê meşandin, di rojên me de, digel biryardariyeke bi qasî ya du sedsalên berê didome, ji ber ku pirsên mezin ên ku fîlozofên sedsaliya 18emîn dixwest bibersivînin, îroj hê jî pirsên sereke ne: gelo civak bedenek, jînewereke zîndî ye, an jî bi tenê tevahiyeke hemwelatiyan e? Nasnameya neteweyî çi ye? Gelo civateke neteweyî bi têgehên siyasî û hiqûqî, an jî li gor çand û dîrokê tarîf dibe? Wê demê, di çandê de para ol û dînê çiqas e? Di jiyana mirovan de, yê herî girîng çi ye: tiştên ku ew hemû parve dikin, an jî tiştên ku wan ji hev vediqetînin? Wekî din, gelo li derveyî dunyaya heyî, dunyayeke din pêkan dibe? Guherîneke rêgeza civakî ya bicîhbûyî armanceke rewa ye, an jî misogeriya bobelatê ye? Ji xwe, digel bersivên van pirsên bingehîn, feraseteke mirovî jî derdikeve holê. Ji bo fikira siyasî ya ku ji hêla bizava dij-Ronahiyan a xurt û bihêz ve tê parastin, watedariya ferdê bi tenê di civatê de û ji bo civatê pêk tê, ew bi tenê di taybetiya rasteqîn de heye, ne di gerdûniya razber de. Divê tiştên ku mirovan ji hev cuda dikin û vediqetînin bên pêşdexistin: tiştên ku nasnameya wan çêdikin û ji aqilî meztir û xurttir in.

Ev pirsa nasnameyê ku, li Fransayê û deverên din, hîn di rojevê de ye, ji dema Ansîklopediya Diderot û d'Alembert'î ve tu carî ji holê ranebû ; di vê ansîklopediyê de, tarîfeya Ronahiyan a neteweyiyê jî bi vî rengî cîh digirt: *"Hejmareke pir mezin a xelkê, ku li ser firehiyeke welêt dijî, di nav hin hedan de girtî ye, û ji heman hikumetê îtaet dike"*. (1) Şorî dîrok, çand, ziman an dîn nayê kirin: welatî, ji taybetmendiyên xwe rizgarbûyî, weha hat dunyayê. Li ser vê bîngehê, Cihû û koleyên reş di dema Serhildana fransê de azad bûn, ji ber ku, ji bo cara pêşî di dîroka hemdem de, hemû nîştecîhên welatekî yên ku ji heman hikumetê îtaet dikir, bûn hemwelatiyên azad û xwedan heqên hevpar û di bin heman zagonan de dijiyan. Divê bê gotinê ku ev têgeha neteweyê, îfadeya rastiyeke civakî an çandî nebû, ew nîşana hewldana lehengî ya ramyarên Ronahiyan bû, ji bo ku serhişkiyên dîrokê biqulibînin, ferdê ji qederperistiyên dema wê, û bi taybetî ji dînê, rizgar bikin, û xweseriya wê îlan bikin.

Ev boçûna siyasî û hiqûqî ya neteweyê dê derbasî salên pêşî yên Serhildana fransê nebe. Têgeha Johann Gottfried Herder ê dijminê Rousseau û Voltaire'yî, dê wê biqewirîne. Li gor vî ramyarê alman ê mezin, rexnegirê Kant'î û damezrînerê netewparêziya îdeolojîk, netewe diyardeyeke xwezayî ye, jînewereke zîndî ya xwedan giyan û dahiyeke xweser e, ku di zimên de îfade dibin. Weke pêl û şaq bi tenê ji ber heyîniya darî hene, mirov bi tenê ji ber heyîniya neteweyê hene. Li gor wî, ev îtîfaqa yekrengî, nêzî aşîretî, xwedan kesayetî û karaktereke ye, û ev jî sazkirina herî binirx a dîrokê ye.

Netewparêzî, ku di sedsalên 19emîn û 20emîn de weke tayfûnekê derbas bû, hê jî pir sax e. Pir caran tê gotin ku ew ji Serhildana fransî bi xwe ava bû : tersa wê ye. Serhildan pêkan bû ji ber ku Netewe ji xwe di rastiyê de hebû, û pevguherîna desthilatê dikarî bi awayekî xwezayî pêk were. Lê belê, Dîderot û d'Alembert'î maneyeke siyasî û hiqûqî dan vê rastiyê û ew ber bi tevahiyeke ferdan ve bir, da ku dîrok û çand mirovî di çi qederperistiyê de zeft neke. Ji bo wan, weke ji bo Kant'î, Ronahî pêvajoyeke weha bû ku ferd pê re gihaştî dibe, û rizgarbûna wê ya ji zincîrên dîrokê, giyana Ronahiyan û destpêka hemdemiyê bû. Ji wê pê ve, di fikira Ronahiyan de, başbûna ferdê armanca dawîn a hemû kiryarên siyasî û civakî ye. Lê ji bo dij-Ronahiyên sedsalên 19emîn û 20emîn, civat ji ferdê mezintir e û ferd berî her tiştî mîrasdarê paşerojê ye: pêşiyên me bi me re diaxivin, wan em weha çêkirin. Ku, tevî xuyaniyan, Nicolas Sarkozy yê siyasetmedar; Alain Finkielkraut ê ronakbîr; îslamperest; neteweperestên cihû yên oldar li Îsraîl'ê; nû-muhafezekar û hevkarên wan ên evanjelîst li DYA'yê, ji bo heman tiştî têdikoşin, sedem jî ev e ku ew hemû, digel Herder'î, dibêjin ku her ferdek, her civateke dîrokî xwedan "çandeke" xweser e, taybet û bê emsal, û divê ev noqte were pêşdexistin. Eger netewe civateke dîrokî û çandî bibe, wê demê, wesfa fransîbûna "dîrokî" dibe nirxeke teva û wesfa welatîbûna fransî bi tenê nirxeke relatîf e, ji ber ku ew pêşana kategoriyeke hiqûqî ya çêkirî ye. Weha em dikarin bifikirin ku, şêst û pênc salên bi pey zagonên nijadî yên Vichy'yê re (2), welatiya hin kesên "biyanî" ku piştre bûne fransî ji wan bistînin... Mîna George Orwell'î dê bigota, bi saya vê tegehê, dibe ku hin welatî jî, ji nişka ve, bibînin ku ew ji welatiyên din kêmtir wekhev in. Alain Fienkielkraut xwe weke xwedanê mîratekî dîrokî û çandî dibîne, ya ku bi qasî tackirina keyên fransê yên pêşî kevn e (3), lê belê, maurasîparêzekî baş (4) dê hê jî wî weke cihûyeke polonî yê ku bi tesadufî li Fransayê hat dunyayê, tarîf bikira... Ew nuha ji cudakariyan nakişîne - bes ev ne rewşa Ereb û misilmanên din e.

Lê belê, bi awayekî sosret, ev kesên rastgir û çalakvanên misilman ên dorbajaran, hin fikirên girîng par ve dikin. Ew hemû girêdana çandî bi ser her tiştî de dikin, "min" a xwe ya dîrokî diparêzin, nasnameya xwe li ser paşerojeke rastî an efsaneyî ava dikin û pê bawer in ku civata wan a çandî xwedan peyameke taybet e û divê ew, di her demê de, weke xwe bimîne. Di navbera ferasetên wan de cudatî hindik in, lê ferqa navbera wan û Ansîklopedîst mezin e... Li ser pirsa esas a netêkilbûna çandan, îslamperestên tundrew hê jî bi ser rastgirên desthilatdariyê dikevin. Ne weke rastgirî, îslamperestî, mîna xwerûperestiyên din, cihû an xirîstiyan, pêwîstiya tecrîdbûnê binxêz dike. Li vir, divê bi kurtasî heyecana piştmodernîst (post-modernîst) a ji bo pirçandî û cudaparêziya çandî were bibîrxistin, ji ber ku wê di herifîna ramanên gerdûnî de roleke mezin leyist. Claude Levi-Strauss, pêxemberê wê, haydarê hedefa dij-mirovparêz û dij-gerdûnîparêz a cudaparêziya çandî bû, ku ji bo her çandek, reseniyeke ku fêr û teqlîd nabe diparast. Bi rastî, ew şîrove dike, tevî *"armancên exlaqî yên bilind ku ew li ber xwe deyne, têkoşîna li dijî her cûre cudakariyan, parçeyeke vê tevgerê ye ku mirovahiyê ber bi şaristaniyeke dunyayî ve dibe û taybetmendiyên kevn, yanî nirxên estetîk û manewî ku buhayê didin jiyanê, xira dike."* Ku ew naxwaze paşveketineke çandî û manewî bijî, divê mirovahî *"ji nû ve hîn bibe ku ji bo her afirandineke rasteqîn, pêwîstiyeke kerbûna ji banga ramanên din, heta bigre pêwîstiyeke redkirin û înkarkirina wan jî heye. [...] Ku tam gihaştî bibe, danûstandina teva a bi kesê din re, di demeke nêzîk an dûrî de, reseniya afirandina min û ya vî kesî dikuje."* (5)

Ji Herder'î bigre heta pişt-hemdemparêz û her cûre xwerûperestan, ev her axaftina ramyarên dij-Ronahiyan bû. Ne xewceyî gotinê ye ku ev redkirina gerdûnîparêzî û mirovparêzî, digel hemû şiklên civatparêzî û nû-muhafezekarî, nemaze ya amerîkî, tê.

Ji bo Daniel Bell'î, bîrdozvanê herî mezin ê nû-muhafezekarên dema nuha, gotina *"Xwedê mir tê wateya civak miriye"*. Lê, çanda "hemdemparêz" a Ronahiyan, ku *"navenda hikumdariyê ji dînê ber bi laîkiyê ve bir"*, nikare *"komeke bilindtirîn nirxên teva, an jî razîbûnên di jiyana rojane de"* pêşkêş bike. Tiştek nikare şûna dînê ya weke wijdana civakê bigre: ku "sermayederiya nû", ji exlaq an jî bilindbûnê bê par, dij-çanda hedonîst, ku nirxên amerîkî tê de winda dibin, karî ji holê derkevin, ev jî ji ber lawazbûna exlaqa protestantî ye. (6)

Herçî îdeologê siyasî yê tevgerê, Irving Kristol, ku di îlona 2009'ê de mir, ew weke manîfestoyeke îslamperest an neteweperest û dîndarê îsraîlî diaxive û bi bîr dixe ku, bê aliyê dînî, muhafezekarî bê naverok e û ku laîkî dijminê wê ye: têrî nake ku mirov bibêje ku dunyayeke baştir ne mumkun e, an jî ku derdên vê dunyayê pêwîst in, divê ew bizanibe ka li hemberî van derdan çawa tev bigere. Di bîra Krîstol'î de, mezinahiya nû-muhafezekarî ji xwe ev e: wan bi piraniya Amerîkiyan da qebûlkirin ku bêhaliyên aborî û pirsên civakî, di rastiyê de pirsên exlaqî ne, ku dîn jî bersiva van pirsan e. Bi vî awayî, mirov fêm dike ka çima nû-muhafezekar û muhafezekarên oldar hatin cem hev û bi hev re, muhafezekariya gelperest ava kir... (7) Rastgirên amerîkî, rastgirên netewperest, dîndar û dagirker li Îsraîlê, îslamperestên her derê dunyayê, weha beşdarên bizaveke hevpar in, ku hemdemiyeke cuda piştgirî dike : ew neteweyê weke şikla îdeal a civateke lihevhatî dihesibînin, ku rûyê wê ber bi Xwedê ve ye, heyîniya wê ya objektîf heye û hêzên wê li derveyî vîna ferdî û aqilî dimînin: ji ber ku dîn û binemrî ji mirovan re divê.

Ev ji xwe nihêrineke pêşerojê pêş de dixe ku tam dijbera nihêrîna Ronahiyan e: her vedamezrandinek bi tenê weke guneheke bingehîn tê hesibandin û têkçûna xwe di xwe de vedihewîne. Ji ber vê yekê, nû-muhafezekar, yên fransî jî di nav de, her demî Serhildana fransayê weke diyardeyeke şeytanî dinirxînin, û li hemberî wê, ew mînakên Serhildana îngilîz ya 1688-1689'ê û avabûna DYA'yê didin. Lê belê, her sê serhildan bûyerên damezrîner bûn, ku desthilatên nedîtî bi cîh kirin û Daxuyaniya Serxwebûnê ya amerîkî digel Daxuyaniyên fransî yên mafên mirovan, ji heman rêgezan dertên. Lê wan dixwest navbera Îngîltere û Amerîka, ku li gor wan, guherînên desthilatê yên sade azadiyên îngilîz ên qedîm li wan vegerandin, û Fransayê, ku tê gotin digel serhildaneke li dijî Xwedê û şaristaniyê, şeş sedsaliyên dîrokê xiş kir, mesafeyeke nederbasdar deynin. Ev feraset ku bi dû şerê sar re gihîşt noqteya xwe ya herî bilind, hê jî piştgirî fikira nejirêzêtiya fransî dike : tê gotin ku bi tenê li Fransayê, serhildaneke weha li derveyî riya şahane ya ingilîz-amerîkî çêbû, ku Fransî ne ber bi demoqrasiya lîberal û sermayedariyê ve, lê ber bi demoqrasiya xwerû ve birin, ya ku berê demeke dirêj Renan'î jî jê re digot *"ev demoqrasiya nizm û terorîst."* (8)

Tevî tecrubeya tofanên sedsala 20emîn, ceng di navbera her du adetên siyasî de dewam dike. Parastina gerdûnîparezî û aqilparêzî, îroj jî, karekî weha ye ku bi qasî armancên xwe acîl û kompleks e: ew parastina vî tiştî ye ku neteweyeke welatiyên xweser damezrand.

* Dîroknas, profesorê teqawîtbûyî li Zanîngeha îbranî ya Qudsê, nivîskarê Les anti-Lumières : une tradition du XVIIIe siècle à la guerre froide (Dij-Ronahî : adeteke ji sedsaliya 18'emîn heta şerê sar), Parîs, Gallimard, folio, 2010.

1 *Encyclopédie ou Dictionnaire raisonné des sciences, des arts et des métiers (Ansîklopedî an jî Ferhenga bi aqil a zanyarî, hûner û pîşeyan)*, Lozan, Sociétés typographiques, 1781, cild 44, r. 221

2 Di serdema şerê duyemîn û dagirkirina Fransayê de, hikumeta fransayê ya hevkarê Naziyan (ku paytexta wî li Vichy'ê bû), hin zagonên li ser statuya Cihûyan derxistin, ku van zagonên nijadperest jî Cihû weke beşeke taybet a civakê nîşan dikir. (Têbiniya wergêr)

3 Bnr. nîqaşa wî ya digel filozof Alain Badiou'yî, di kovara *Le Nouvel Observateur*'ê de, berfanbar 2009

4 Maurasîparêzî ji bîrdoza Charles Maurras'î (1868-1952) tê, ku ew li dijî encamên Serhildana franssayê derdiket û wî vegera welatparêziyê diparast. (Têbiniya wergêr)

5 Claude Lévi-Strauss, *Le Regard éloigné (Nihêrîna ji dûr ve)*, Parîs, Plon, 1971, r. 47. Binihêrin jî *Race and History (Nijad û dîrok)* di pirtûkeke hevpar de ya ku ji hêla UNESCO'yê ve di 1956'ê de hat weşandin, *The Race Question in Modern Science (Pirsa nijadê di zanistiya hemdem de)*, r. 125-132

6 Daniel Bell, *The Cultural Contradictions of Capitalism (Nakokiyên çandî yên sermayedariyê)*, New York, Basic Books, 1978, r. XXVII, 155 -158, XXIV, 85, 69-79

7 *Ibid.*, r. 377-383

8 Ernest Renan, *La Réforme intellectuelle et morale (Reforma rewşenbîrî û exlaqî)*, di *Oeuvres complètes (Berhemên teva)* de, Parîs, Calmann-Levy, 1929, r. 133

Wergera ji fransî: Simko Destan

Redaksiyona gotarê: Îbrahîm Seydo Aydogan



Fehmî Balayî: **Leylîxan û Hesen Axa**, Boyaxa rûnî li ser tuwalê, 100 x 80 cm

Perwerdeya ewropayî ya di serdema qabiliyetan de

Nico Hirtt *

Ramanên li ser perwerdeyê yên Androulla Vassiliou'yê, Komîsera Yekîtiya Ewropayê ya ji bo perwerdeyê, bi çend hevokan diyar dibin: *"xurtkirina qabiliyetan û şertên wergirtina perwerdeyê ya bi rêya lêhaybûna pêwîstiyên bazaran"*, *"piştgiriya ji bo Ewropayê da ku ew têkeve reqabeta dunyayê"*, *"amadekirina ciwanan a ji bo bazara xebatê ya îroj"* û *"bersivdayîna encamên krîza aborî"*. (1) Bi van gotinên xwe re, ew têgihên birêvebirên ewropayî baş aşkere dike, yên ku ji panzdeh salan ve ye peywira yekem a dibistanê weke piştgiriya ji bo bazaran dibînin û weha bawer in ku çareseriya pirsgirêkên bêkarî û nebûna wekheviyê, di hevpariyeke bêhtir a navbera perwerde û "pêwîstiyên" aborî de ye.

Ji bo salên pêşerojê, Navenda ewropayî ya ji bo pêşdexistina fêrkirina pîşeyan (Cedefop), digel zêdebûneke xebatên pisportiya bilind, *"zêdebûneke girîng a hejmara xebatên di çeqê xizmetê de, bi taybetî di warê firotina taybet û belavkirinê de û ji bo pîşeyên din ên pir sade, ku pêwîstiya wan bi dîplomayên resmî tune ye"* (2) pêş dibîne. Ajansa Ewropayê vê diyardeyê weke "Qutubbûyîna xwestina qabiliyetan" bi nav dike.

Ev meyl li DYA'yê jî peyda dibe. Ji çil xebatên ku li gor hejmara xebatkaran herî zêde pêş dikevin, bi tenê ji heşt xebatan re astayeke gellek bilind a xwendinê (bi qasî çar salên xwendina bilind an pirtir) pêwîst e, lê belê fêrbûyîneke kin û li ser kar ji xwe têrî bîst ji van xebatan dike. (3) Hin nivîskarên îngilîz û amerîkî vê qutubbûyînê bi dijberiya "îşên nanozikî" û "îşên teknolojîkî" salox didin. Li gor aborînasên David H. Autor, Lawrence F. Katz û Melissa S. Kearney, *"ji salên 1990'î û vir de, bazara xebatê her ku diçe zêdetir qutub dibe, wateya wê jî ev e ku xebatên gellek pispor herî zêde pêş dikevin, xebatên asayî herî kêm pêş dikevin û xebatên ne pispor hinekî pêş dikevin."* (4)

Ev guherînên bazara xebatê, ku ji axaftinên daîmî yên li ser "civaka zanyariyê" hinekî dûr in jî, ji xwe li ser siyasetên perwerdeyî bi xurtî bi bandor in. Rêxistina hevkarî û pêşketina aborî (OCDE) jî bê çare dimîne ku bi îstîhzayê weha bibêje: *"ne hemî şagirt ê di çeqê pirçalak ê" aboriya nû "de bixebitin; bi rastî, pir ji wan ê tê de nexebitin jî, lewre bernameyên dibistanî nikarin li gor fikira ku" ew ê hemî serkeftî bibin "bên çêkirin"*. (5) Li Fransayê, Claude Thélot, serokê Desteya nîqaşa neteweyî ya li ser pêşeroja dibistanê, di rapora xwe de ya ku wî di sala 2004'ê de teslîmî serokwezîrê Fransayê François Fillon kiriye, heman fikirê parast: *"Bila têgiha serkeftina ji bo hemûyan şaş neyê fahmkirinê. Ew nayê vê wateyê ku armanca dibistanê ev e ku hemî şagirt ê dîplomayên herî bilind bi dest bixin. Têgiheke weha hem ji bo kesên alaqedar leylan e, hem jî di warê civakê de bêwate ye, ji bo ku heke wisa bibûya, dê têkiliya navbera dîploma û tevna xebatan ji binî ve xira bibûya."* (6)

Birêvebirên perwerdekeriyê jî bi vê pirsgirêkê re rû bi rû dimînin: salên navbera 1950'î û 1980'î pergalên perwerdeyî yên giştî li dû xwe hiştin, yên ku şagirt, li gor welatê ku lê dijîn, tê de heşt – deh salên perwerdeya hevpar werdigrin. Di dîrokê de, ev pergal hane ji ber hêviya samandarî û pêşketina xurt û mayînde ya kapîtalîzmê derketin holê, ku vê pêşketinê dê her bilindkirina astaya perwerdeyê bixwesta. Lê belê em nuha ketin serdema krîzan û qutubbûyîna pisportiyê. Bi vî halî, muhendîs û karkerên pêşerojê çawa dikarin bîngeheke hevpar a perwerdeyê bistînin?

Bersiva vê pirsê jî di şêwaza xebatên nû yên qaşo "ne pispor" de ye. Ku em baş li ser vê bifikirin, xebatên ne pispor tune ne. Xebatên ku pisportiya wan nayê naskirin hene û ew jî weha tên binavkirin ji ber ku wisa li me tê ku zanyarî, karê destî û helwêstên ku ji wan re pêwîst in, li cem herkesî peyda dibin. Weke mînak, ji destpêka sedsala bîstem û vir de, xwedîtiya astayeke bîngehîn a xwendin û nivîsandinê weke pisportiyê nayê qebûlkirin. Nuha ev rewş ji bo ehliyetê an bikaranîna komputeran jî aynî ye. Ev qabiliyetên ne pispor tu carî nabin mijara muzakereyên giştî û lewre jî, ji bilî şertên asgarî yên hiqûqî, xebatkar xwediyên misogeriyên mehaneyê, şertên xebatê an jî parastina civakî nînin.

Taybetmendiya xebatên "ne pispor" ên îroj jî ev e ku gellek qabiliyet ji wan re pêwîst in, lê astaya van qabiliyetan nizm e. Weke mînak, divê berkarê dezgeha vagona xwarinê ya treneke navneteweyî bikaribe bi çend zimanên cuda tiştên sade bibêje, di serê xwe de baş bihejmêre û divê ew xwediyê çandeke teknolojîk, komputerî û zanyarî ya asgarî bibe da ku alavên cuda (firne, firneya pêlan, germkerê avê, kasaya qeydker, xwînerê kartên krêdiyê, sarinc, pergala daxuyaniyên dengî, lewheyê ceyranê…) bi kar bîne. Digel qabiliyetên civakî û alaqeyî yên ji bo danîna têkiliyan a bi muşteriyên ji hev pit cuda re, divê ew xwediyê feraseteke biryardariyê, têgiheke îradeyê û tewîniyê (ji bo guherandinên seetên trenan) jî bibe.

Lîsteya "qabiliyetên bîngehîn" ên ku ji aliyê Komîsyona Ewropayê ve hatin rêzkirin jî kêm zêde weha ye; ev lîste dê weke mihwerê sereke yê guherandina pergalên perwerdeyê yên dibistana seretayî, dibistana navîn, lîse û sinifên fêrbûyîna pîşeyekê bê bikaranîn: *"Axaftina bi zimanê zikmakî ; axaftina bi zimanên biyanî; qabiliyetên matematîk û qabiliyetên bingehîn ên di warê zanistî û teknolojiyê de; qabiliyetên bi komputeran; fêrbûyîna fêrbûyînê; qabiliyetên civakî û medenî; feraseta biryardarî û îradeyê; haydarî û îfadeya çandî."* (7)

Tê gotin ku sî mîlyon xebatkarên ewropayî ji van qabiliyetan bê par hatin hiştin û lewre jî, li derveyî reqabeta ji bo xebatên "ne pispor" ên nû dimînin. Ji ber vê yekê, kardêr carina mecbûr in ku kar bidin xebatkarên zêde pispor û buhatir. Bi berfirehkirina wergirtina van zanyariyên bîngehîn, Komîsyon li benda kêmbûneke mehaneyan e: *"Ji bo her astayeke xwestinê, ku têkildarê qabiliyetên taybet e, zêdebûna hejmara karkeran dê kêmbûneke mehaneyên rastîn ya ji bo hemî karkerên ku ji xwe xwediyên van qabiliyetan bûn bi xwe re bîne."* (8)

Qabiliyetan dewsa zaniyarî girt û ev jî bersiveke xwestina nuha ya tewînî û guncaviya karkeran e. Tunebûna ewlehiya aborî, digel bikaranîna zêde ya îcadên teknolojîk – an ji bo avakirina bazarên nû, an jî ji bo pêşdexistina berhemdariyê – asoyê pêşdîtinê teng dike. Tu kes nizane ka deh sal bi şûn de dê têkiliyên teknîkî yên berhemdayînê bi çi rengî bibin û lewre jî, tu kes nikare pêwîstiyên taybet ên di warê zanyarî û pisportiyan de pêş bibîne. Lê belê qabiliyetên ku Komîsyon rêz dike weke nirxên ewle tên dîtin, yên ku qabiliyeta guncaviya karkerên pêşerojê mîsoger dikin. Rêxistina OCDE'yê jî vê ferasetê diparêze: *"Di van qabiliyetan de, kardêran nîşanên sereke yên çalakî û tewîniyê dîtin. Hêzeke xebatê ya xwediyê van qabiliyetan her tim dikare li gor xwestinê û pêşketina awayên berhemdayînê xwe biguherîne."* (9)

Tercîha perwerdeyeke bi vî rengî jî tê wateya ferdîkirina rêgehên fêrbûyînê. Êdî armanca perwerdeker ne ev e ku kom an sinifeke xwendekaran bi hev re pêş de bikevin, lê armanc bi tenê ev e ku her kesek bikaribe li gor îmkanên xwe, qabiliyetên xwe rahêne û pêş de bixe. Pêşniyara Komîsyona ewropayî jî weha ye ku *"tecrubeya welatên ku desteyên qabiliyetan bi kar tînin"*, *"tevdîrên ferdî yên nirxandina fêrbûyînê"* û *"îqnakirina elimiyên resmî û ne resmî"* li hemî welatan belav bibin. Bi vî awayî jî, pazarê xebatê dê ji "qeydên mecbûr" yên adeta berê ya dîploma û pisportiyan bifilite.

* Perwerdeker, endamê Banga ji bo dibistaneke demokratîk (Bruksel)

1 http://ec.europa.eu/commission_2010-2014/vassiliou/about/priorities/index_en.htm

2 CEDEFOP. Li Ewrûpayê di paşerojê de jêhatîbûnên pêwist: pêşbîniyên ji bo wa'deyeke navîn. Rapora paşxaneya teknîk, Weşanên buroya Yekîtiya Ewropayê, Bruksel, 2009

3 Douglas Braddock, "projeksiyonên îstîhdama kar ên ji bo 2008 'an", Monthly Labor Review, vol. 122 n°11, mijdar 1999

4 David H. Autor, Lawrence F. Katz, Melissa S. Kearney, Cemserîbûna Bazara Kar a Dewletên Yekbûyî, Lêkolîna Aborî ya Buroya Neteweyî, Paper n° 11986, Cambridge, 2006

5 OCDE, "Ji bo dibistanên me kîjan paşeroj"?, Hûrkolîna li ser Siyaseta Perwerdeyê, Paris, 2001

6 Claude Thélot, Ji bo serkeftina hemû şagirtan. Rapora Komîsyonê ya têkildarî guftugoya neteweyî li ser siberoja Dibistanê, La Documentation française, Paris 2004

7 Jêhatîbûnên diyarker li cîhaneke di nava guherînê de, Bruxelles, le 25.11.2009 COM(2009) 640 final

8 Pêşketina ber bi objektîfên Lîzbonê di perwerde û hîndekariyê de, Commission Staff working Paper, 2005 report. SEC (2005) 419

9 Beatriz Pont et Patrick Werquin, "Zanînên nû: bi rastî?", Çavdêrê OCDE, Paris, nîsan 2001



Fehmî Balayî: **Li qeraxa deryayê**, Boyaxa rûnî li ser tuwalê, 20 x 30 cm

Wergera ji fransî: Simko Destan

Redaksiyona gotarê: Îbrahîm Seydo Aydogan

Hûrkolînek der barê Keskên Alman de

Di laboratuwara ekolo-bûrjûwaziyê de

Olivier Cyran *

Partiya keskên alman demeke dirêj weke ku dixwaze, dûrî parlementoyan, bi awayekî din siyasetê bike, xwe nîşan da. Mîrasgirên protestoyên salên 1960ê, keskên alman li dijî nukleerê têkoşiyan û formên nû yên jiyana kolektîf ceribandin. Rêveberên wan ên ku di hilbijartinan de encamên baş bi destxistin û jê cesaret wergirtin, hewl didin ekolojî, aborî û lîstika dezgehî li hev bînin. Li Hambourgê ev lihevanîn encamên ku mirov pê şaş dibin, derdixe holê.

Taxa herî vekêş a Hamburgê di heman demê de ya herî ekolojîk e jî. Ev yek qet li ber çavan nakeve dema ku mirov li ber lingên *Birca Marco Polo*, birca şazdeh qatî ya xwedî xemleke mîmarîya *avant-gardîst* a ku qatên nanê tostê yên bi şiklekî ne rast li ser hev hatine danîn tîne bîra mirov. Li vê bircê her daîreyeke normal bi buhayê 3.7 mîlyon ewroyan tê firotin. Evîna cîranê wê *Unîlîve* ya ji bo xwezayê jî li ber çavan zêde xuya nake. Wê biryargeha xwe ya nû berî çendekê li vir vekir. Bi 25 hezar metre kare erdê ku daye ber xwe, ev avahîya cîhanî ya mezin, ya berhemên kozmetîk û çandina berhemên xwarinê di heman demê de dibe nimûneya herî girîng a ku ampûlên wê herî hindik elektrîkê serf dikin. Wezîfedarê li ber dergehê bircê, bi quretî dibêje: *"Tevahîya avahîyê seranser li gor pîvanên rêzgirtin û parastina jîngehê hatiye lêkirin"*. Dergevan bi tilîya xwe ya şehadetê banê qirase yê ji camê jî nîşan dide û bi serbilindî vê îzahê dike: Hola qata zemînê bi *"pergala herî pêşketî û dawî ya wergirtina germahîyê"* hatiye bi serûber kirin.

Birca ***Marco Polo*** û navenda ***Unilever*** bûne xeml û xişrên sereke yên *Hafen City*, taxa nû ya karsazên Hambourga ku li kevîyên ***Elbe***yê, ji bo buro û lojmanên luks ên li ser avahîyên bi prîketên sor ên *Speicherstadt* a berê, bi qasî 155 hektar cih veqetandiye. Ev cure avahîya rengbakurî ya *Dubaî* ku tê plan kirin heta sala 2025ê biqede, wê cih bide îstîhdama çil hezar kesan û dozde hezar rûniştevanên, ji qewlê amadekarên projeyê, yên ji *"tebeqeyên civakî yên afirîner tên"*. Elbphilarmonie, odîtoryuma bi îtîbar ya ku bajar bi qasî 251 milyon ewro lê xerc dike, wê bibe wargeha çandî ya karsazîyê. Li vir vînc hê jî di nav liv û tevgerê de ne, lê belê hinekî dûrtir li nav gelek avahîyên din ên temambûyî, ji niha ve gelek kes li eywanan xwarina taylandî tahm dikin û li "barên herî luks" şerabên alelade vedixwin.

Lê belê divê hayê mirov ji pêşhukman hebe: Ev dera ku ji alîyê bankevanan û *'golden boy'an* ve, eynî mîna ***Docklands*** a ***London***ê, di nav hewldana bidestxistina kevîbenderan de hatiye qeyd kirin, nayê maneya ku *"projeya herî bajarîvanî ya ewropî"* ye ku li dijî prensîpên pêşketina dewambar in Berevajî, ew bi vî awayî serkeftina pêşketina dewambar di pratîkê de pêk tîne. **Harald Müller** bi coş wiha dibêje: *"Şofaja geotermîk, alavên avasazîyê yên kêmtir hewayê gemarî dikin, qadên hêşîn, pêyarê û rêyên ji bo bisîklêtan, bi van hemû taymetendîyên xwe ve ew bi rastî jî di warê pêşketina dewambarîyê de taxeke nimûne ye"*. Ev endezyarê 53 salî yê bi coş ê ku li *HafenCityê* dixebite, dema ku li pêşîya wî sênîyek masîyên rînga hene û vê xwarinê ji spesîyalîteya din a restorantê pîlava *Arborio* ya bi kuvarkên Perîgortê *"kêmxemltir lê îştahvekertir"* dinirxîne, xwe nagire û wiha dewam dike: *"Ji 1997ê ve min her tim dengê xwe daye keskan"*. **Müller** dibêje Kesk bavîtîya vê projeyê nakin, lê belê *"wan pir bi dilsozî destek dayê"* û *"bêyî wan, tax wê bi ti awayî nebûya xwedî vî rengûrûyê ekolojîk"*.

Hamburg, "paytextê ewropî yê jîngehê yê sala 2011ê", bi rastî jî bajarekî pirî jîngehparêz e. Keskan du caran li vî bajarî di rêveberîya karûbarên şaredarîyê de cih girtin: ji 1997ê heta 2001ê bi desteka sosyal-demokratên SPDyê, dûre ji 2008ê heta 2010ê li tenişta kevneparêzên CDUyê. Bîlançoya aksîyona wan di dema rêveberîya wan a bajêr de, li tu derê bi qasî HafenCity serkeftî nebûbû. Keskên ku xwestin navên li rêyên gelemperî tên dayîn li gor wekhevîya jin û mêran bin, navên sikak û kolanan jî li gor vê têgehê guherandin. Sekretera giştî ya Keskên Hamburgê **Katharina Fegebank** bi coş taxê wiha rave dike: *"Bêguman, ev taxek ji bo derdorên zêde halxweş e, lê belê avahîyên wê pir nûjen in, ez vê yekê ji bo îmaja bajêr weke tiştekî muhteşem dibînim"*. Parlementera Meclîsa Federal a serdema 2002-2008ê, hevala wê **Anja Hajduk** jî pê re hemfikir e ku ev *"bêhtir serkeftinek e, herçend her tişt zêde buha be jî. Dema em di nav hukûmetê de bûn, ji bo me pir girîng bû ku em ji garantîya ku tax wê ji bo hemû rûniştivanên bajêr vekirî be piştrast bin, da ku ew bikaribin li nav bigerin. Ji bo Birca Unilever, mesela, me wisa kir ku qata wê ya zemînê ji herkesî re vekirî be"*.

"Sentezeke doktrîna şerê tîrêjavêj û ya Meşa Dirêj"

Kompleksa qirase ya avahîya mîlyoneran, lê belê "şîrîn" û ji alîyê enerjîyê ve bi teserûf: Gelo li vir mirov dikare bibe şahidê pêş-destkefteke *"şoreşa"* ekolojîk ya ku niha li keskên ku weke glokeke ronahîyê di 2010ê de xwe li ser lingan girtin, alîyê xwe yê jîngehparêz geş dikin, li Almanyayê berbelav dibe? Edîtoryalîst ji niha ve giranîya xwe didin ser nirxandinên li ser hîpoteza serokwezîrekî kesk ji bo hilbijartinên 2013ê *(malikê bixwînin)*. Divê bê gotin ku bilindbûna hêza Keskan di van mehên dawîyê de gihîşte lûtkeyekê. Li gor henekekê bûye mode ji alîyê kesên ji keskan dihesidin *"sentezeke şerê brûskî û ya Meşa Dirêj"* mijara gotinê ye. Pêşî, tevahiya sala 2010an gelek sondaj/anket hatin pêkanîn ku tesîr li hev kirin û bi vê yekê rêjeya dengê keskên li Berlînê yên ku di kanûna 2009ê de % 19 bû, di cotmeha 2010ê de gihand % 30ê. Çapemenî li hemberî *"mûcîzeya kesk"* dikeve nav coş û heyecanê (*Der Spiegel*): *"Keskên ji hemû deman bêhtir populer bûne "*. (*Die Zeit*), *"Partîya refahê"* (*Stern*), *"Kesk ji niha ve ji bo xwe xeyala bidestxistina serokwezîrîyê dikin"* (*Die Welt*)… Kesk ji balkêşîyeke wisa destekkirî sûdê werdigirin û bi lez û bez dikevin nav qadeke ji alîyê FDPyê vala hiştî. FDP mûcîzeya berê ya jîyana siyasî ya alman bû. Lê piştî ku wezîrê demkin ê parastinê yê hukûmeta **Merkel**, **Karl Theodor** ku kesayetê siyasî ya herî li pêş yê FDPê bû, ji ber karên ne li rê îstîfa kiribû, ev qad vala hiştibû.

Dûre "mucîzeya kesk" dikeve sindoqên hilbijartinê. 27ê adarê, jîngehparêz li ***Baden-Wurttemberg***ê, welatê herî dewlemend û qelebalix ê Almanyayê, ku bi kevneşopîya xwe hertim di destê kevneparêzan de bû, % 24.2yê dengan bi dest dixin. Bi du qat zêdekirina dengên xwe yên hilbijartinên dawîyê (di 2006ê de11.7 %), ew piştî CDUyê dibin duyemîn hêza siyasî, dan pêşiya hevalbendên xwe yên SDPyê û bûne hemanên sereke yên koalisyoneke ku êdî ne "sor û kesk", lê belê ji niha û şûn ve "kesk û sor" e.
Cara yekemîn di dîroka almanî de, jîngehparêzek serokatîya herêmekê bi dest dixe. **Winfried Kretschmann**, şêst salî, zirav, qure, por firçekirî û di koroya dêrê de stranbêjê rojên yekşemê, bi carekê li tevahîya welêt dibe stêrkek û navûdeng dide. Li studyonên televîzyonan, weke *"hilgirê hêvîyê"* û *"bûyera siyasî ya salê"* derdikeve pêş.

Girîngîya bûyerekê ji ber ku bi tesîra wê ya li ser borsayan tê pîvan, wê were dest nîşan kirin ku rojekê piştî serkeftina jîngehparêzan, hîseyên ***E.on*** û yên ***RWE*** –du hilberînerên sereke yên enerjîya nukleer li Almanyayê– pir hindik kêm bûn, eynî mîna yên ***Daimler, BMW*** û ***Volkswagen***ê. Berevajîya vê ***Öko-Dax*** e, ev şirketa ku deh hîsedarên wê yên sereke "kesk" in, hîseyên wê bi carekê deh pûan hilkişiya jor. **Kretschmann** di êvara serkeftina xwe de digot helbet ev nayê wateya şoreşekê, madem ku bazarên kêmtir kesk, di nirxên borsayê yên paşê de ji nû ve hilkişiyan: Kretschman jî di êvara serkeftina xwe de hewl dida wan razî bike û got: *"Em ê bikevin ser rêya sozdayî ya di nav civaka bûrjûwa de"*.

Ne çep ne jî rast: nermîgir û navendgir

Berî bîst salan, tedbîreke wisa belkî bi kêrî tiştekî bihata: Keskên ku wê demê li Almanyaya Rojava çepê radîkal temsîl dikirin, bi awayekî xweber dijminê komunîzmê bûn. Li destpêka salên 1980yê, *CDU*yê nekarî qedexe deyne ser partîya ciwan a kesk a ku bi sempatîzanîya ji bo şerê çekdarî û ramanên dijberî destûra bingehîn dihat sûcdar kirin. "Civaka bûrjûwa" li himberî van ***"Grüne Chaoten"*** (Keskên Hilweşîner) mahdê xwe tirş dikir, ên ku îdîa dikirin ku rasterast ji bo edaleta civakî û parastina jîngehê têkoşînê dimeşînin. Îro tiştekî wisa êdî ne mijara gotinê ye jî: Mirovê xurt ê *Baden-Wurttemberg* îlan dike ku ew *"ne ji çepê û ne jî ji rastê ye"* û li gel Erwîn Teufel, dengê herî xurt ê xwecîhî yê CDUyê re dikeve nav danûstandinên germ û dilsoz û dide zanîn ku pê re bergeha *"nerm û navendgir"* parve dike. (1) Rewşa Hamburg, yekemîn herêma Almanyayê a ku wê koalîsyoneke "reş û kesk" (Li Almanyayê rengê reş sembola rastê ye), nîşan dide ku di hevaltîyeke wisa de ti tiştekî ecêb tine. Serokwezîr **Angela Merkel** bi xwe jî qebûl dike ku divê piştî hilbijartinên 2013ê, hevgirtineke jîngehparêz–xiristîyanan ne li derveyî îhtîmalan be.

Ev senaryoya tevlîhev dikare ji cotmeha bê û pê ve, bi wesîleya "ceribandina" hilbijartinên şaredarîyan li Berlînê bi gewde bibe. Li gor sondajên hûr û kûr, serê lîsteyê **Renate Künast**, seroka koma keskên li parlemena federal, ji niha ve li paytext weke ku hukum dajo xuya dike û xwe ji ber ti hevalbendîya muhtemel nade alî –navend-çep an jî rast, her tişt mumkin e. Eberhard Diepgen, şaredara berê ya CDUyî ya Berlînê, ji niha ve li antîşambra favorîyê erdê dixepêre: *"Em têra xwe xwedî xalên hevpar in ji bona ku bi Keskan re projeya hukûmetekê saz bikin"*. (2) Rojnameya *Süddeutsche Zeitung* (5.11.10) jî bi vê şiroveyê kenê xwe bi wan dike: *"Tayê kesk li sektorên kenveparêzan berbelav dibe. Xwedîyên şirketan û dewlemend dixwazin xwe di çavên keskan de şîrîn bikin"*.

"Tesîra Fukushima", ya ku gelek caran hatiye bi bîr xistin, helbet bûye zemînek ji bo bilindbûna dengê jîngehparêzên ku dawîyê sûdekî mezin werdigirin ji dijberîya li himberî pîşesazîya nukleer a ku ji alîyê piranîya almanan ve tê red kirin. Girtina programkirî ya navendên nukleer helbet bi xêra wan pêk hat. Lê belê çizirînên radyoaktîf ên li Japonyayê rewa nake ku formasyoneke dijber ji qewlî îfadeya xatûn **Jutta Ditfurth** ve, veguhere "*partiya lîberal a bi bisîkletan"* (3), ev hev-avakara keskan, a ku di 1991ê de ji partîyê veqetiya, li ber cazîbeya xurt a ku ji alîyê hevalên wê yên berê ve tê pêk anîn, şaş dimîne: *"Hin şirovevan bi awayekî wisa diaxivin weke ku ew bîst û pênc salan li ser gerstêrka Mars jîyabin. Ew dibêjin: Em binêrin ka kesk wê çi bikin, em bihêlin bila ew pêşî bibin hukûmet. Ev helwesteke ecêb e, lewre Kesk heta niha gelek caran ketine nav hukûmetê"*. Bi rastî jî lîsteya hukûmetkirina keskê têra xwe dirêj e: Heft salan beşdarîya wan a li nav hukûmeta federal a **Gerhard Schröder** (1998-2005), yazdeh salan hev-hukûmeta wan a li Rhénanie ya Bakur -Westphalie (1995-2005 û dîsa ji 2010an ve…), deh salan li Hessenê (1985-87, 1991-1999), neh salan li Schleswig-Holsteinê (1996-2005), şeş salan li Hamburgê (1997-2001, 2008-2010), çar salan li Saksonyaya-Jêrîn (1990-1994), çar salan li Saksonyaya-Anhalt (1994-1998), çar salan li Bremenê (ji 2007an ve), du salan li Saarlandê (ji 2009an ve) û du salan li Berlînê (1989-1990 û 2001-2002). *"Ango, bi tevahî, 59 sal terubeya hukûmetkirinê,* li gor hesabê Ditfurth. *Bêguman medya ji bo berjewendiyên xwe weke ku wê jê tinebe keskan weke partiyeke nû û bêtecrube nîşan dide û nefesa xwe digire ji bo bibîne ka kesk wê çawa tevbigerin, gava bibin desthilatdar.* (…). *Ev 59 salên tecrubeyê tu caran nabin mijara analîzeke rexnegir a hûrûkûr"*.

Mîtolojiya înatkar a jîngehparêzên bakîre di siyasetê de

Li Hambûrgê, dengdaran bi xwe ev analîz pêk anî: Di meha sibata bihurî de wan yên ku di hibijartinan de bi piraniyê bi ser ketin bi rexneyên xwe rast kirin, (CDUyê % 21,9 dengan stand û keskan % 11,2 standin) û di nirxên xwe de ji nû ve deshilatdarîya tam spartin SPDyeke ku ya rastî li deverên din bi giştî di rewşeke ne baş de bû (% 48,3). Ji bilî gerên li HafenCity, jîngehparêz, bi rastî, ne xwedî encameke serkeftî ya hêjayî pesindanê bûn. Li gor peymana koalîsyonê ya li gel rastê di 2008ê de pêk hat, wê tramvay bihata çêkirin, projeyeke navenda karbonê wê bihata betal kirin, û bi guherîneke watedar a perwerdeyî wê dibistaneke seretayî ya "ji bo herkesî" bihata saz kirin. Yek ji wan sozan bi tenê jî nehat bi cî anîn. Tramvay ji ber kêmkirinên butçeyên di dema krîza 2008ê de çênebû, sazkirina navenda karbonê bi biryarên dadgehê hate destek kirin. Guherîna ji bo dibistanan jî ji alîyê hilbijêran ve bi referandumeke tîrmeha 2010ê bi awayekî din hat red kirin. Û jixwe ji ber tengezarîyên hundirîn yên bûn encama vê têkçûnê, piranîya reş û keskan di dawîya dawî de du sal berî temambûna koalîsyona xwe, bi hev ketin.

Gava li pey xwe mêze bikin, jîngehparêz dîsa jî dikarin xwe bipesinînin, ji ber ku li gel baronên xwecîhî yên rastê bîranînên wan ên bi kêf hene. Patronê CDYya Hamburgê **Gregor Jaecke** hevkarîya xwe li gel Keskan bi zimanekî bi coş bi bîr tîne: *"Dema mirov kesk e, xwedî çêj û zewqa jîyanê ye, û tiştên em bi hev re parve dikin nirxek e. Der barê siberojê de em xwedî heman xeman in: Em, di wateya xiristîyanî ya rêzgirtina jîyanê de, ew jî, di wateya nûjentir a pêşketina dewambar de. Ji ber vê yekê pêwistîya siyaseteke aborî ya bi denge ji SPDê bêhtir ji alîyê Keskan ve baştir tê qebûl kirin"*. Peymana koalîsyonê ya 2008ê şahidîyê dike ji bo vê "çêja jîyanê", ya ku bi zimanê kêmtir lîrîk ê ortodoksîya butçeyî hatiye bi navûnîşan kirin. Gava krîza diravî piştî çend mehên din diteqe, kesk û demokratên-xiristîyan li ser kêmkirina lêçûnên gelemperî yekser li hev tên; mesela fiyetên venêrîna li kreşan zêde dikin. Di heman demê de, ew 1.5 mîlyar ewro dixin kaseyên valabûyî yên bankaya HSA Nordbank, diçin bi hawara koma şirketên deryayî *Hapag-Lloyd* ve û ji bo mizdan û kêfxweşkirina sermayedaran tedbîran werdigrin. Jaecke vê yekê diecibîne û bi van gotinan hestên xwe îfade dike: *"Diviyabû hewayekî bawerî bi hevanînê bihata afirandin, keskan jî ev yek pir baş fam kir"*.

Mehê 359 ewro û mecbûrîyeta karkirina hema bêje di berdêleke nêzî belaş de

Baş e, tevî vê yekê jî gelo mijarên ku li ser lihev nedikirin qet tinebûn? Siyaseta ewlekarîyê, mesela: Mirov guman dike ku partîyeke ciwan û "seksî" weke ya keskan di mijara hêzên ewlekarîyê de bi giregirên ixtîyar ên CDUyê re ne xwedî heman nêrîn û nirxandinan bin. Na, ev tesbîteke şaş e: Xatûn Fegebang vê yekê wiha îzah dike: *"Mijarên ewlekarîya hundirîn di destê hevalbendên me yên kevneparêz de bûn, lê belê di vî warî de ti pirsgirêk neqewimîn"*. Yekî din ê girîng ê di nav CDUyê de jî bi van gotinan tevlî wê dibe. *"Di warê nîzama gelemperî de em xwedî helwestên pir hişk û dijwar bûn, lê belê piştî tecrubeyê, keskan ew bi temamî qebûl kir"*. Weke ku tê dîtin Jaecke bêyî ku mirovan li ber xwe bigerîne, bi gumaneke qiriktahl be jî, tevî her tiştî, qebûl dike ku *"beşeke dengdarên burjûwa yên ku bingeha CDUyê pêk tînin, îro dengên xwe didin keskan"*.

Taxên xizantir kêmtir dengên xwe didin keskan. Tevî ku di meha sibatê de keskan ji sedî 9.2yê dengên taxa kesên halxweş a Blankenese bi dest xistin. Lê belê li wargehên *Rothenburgsort*, cihên

xizantir ku tê de yek ji du dengdaran hilbijartin boykot kir, tenê ji sedî 6ê dengan wergirtin. Li vê derê, ne rêyên bisîklêtan hene, ne jî daîreyên bi şofaşa geotermîk xemilandî, lê belê qalibên betona gemarî yên bi foelê tên germ kirin û kargehên îflaskirî hene. Bêkarekî 32 salî yê ku li ser kevîrêyê mobîleta xwe tamîr dike, bi zimanekî îsyankarî dibêje: *"Ez û dengê xwe bidim keskan? Ma di çavê we de ez mirovekî ehmeq im?"* Joachim Riepke tenê kesek e ji 6.7 milyon kesên alman ên ji alîyê fona *Hartz IV* ve tên îdare kirin. Ev fon ji yekkirina meaşên bêkarîyê û alîkarîyên civakî pêk tê. *"Mehê 359 ewro. Û mecbûrîyeta karkirina hema bêje di berdêleke nêzî belaş de. Vê gavê, Navenda Kar bela xwe li min nade, lê belê berî du mehan wan gazî min kir ji bo du heftîyan li stargeheke pîrûkalan weke firaxşo bixebitim. Mafê min ê redkirinê tine, an jî ew ê meaşê te bibirin. Û tu radibî ji min dixwazî ku ez dengê xwe bidim wan?"*

Bi *"van"*, ***Riepke*** îşaret bi piranîya SPD-keskan dike, ji ber ku 'van' di 2005ê de pergala ewlehîya bêkarîyê ya herî zordar û dijwar a Ewropayê ava kir. *Hartz IV* li ser bêkaran *"karên di berdêla 1 ewro de"* ferz dike, wan neçar dihêle ku mala xwe bar bikin cihekî kêm-mesreftir, eger mala wan li gor *Hartz IVê* li cihekî bi mesref be, û wan bi karûbarên pir dirêj ên burokratîk re rû bi rû dihêle, an jî ew ê ji çend qurûş pereyên ku distînin jî bêpar bimînin. Rojnameya kevneparêz *Frankfurter Allgemeine Zeitung* di dema pêşkêşkirina tekstê (30yê hezîrana 2004ê) de, ev manşet derxistibû pêş: *"Ji 1949ê ve qutkirina herî zêde ya di alîkarîyên civakî de"*. Reforma ku ji alîyê midûrê wê demê yê çavkanîyên însanî yên koma *Wolkswagen* û dostê serokwezîr Schröder, **Peter Hartz** ve hat amade kirin û navê wî bi xwe lê hat danîn (4), niha dibe modelek ji bo reformatorên ku li Fransayê û deverên din, agir dibarînin ser "asîstanîyê" ji bo li şûna wê meaşgirên bêmeaş bi cih bikin. Lê belê Hartz IV rekoreke ku şikandina wê pir zehmet e, şikand: Amadekarên wê, alîkarîya yek-dest daxist asteke wisa şeperze ku Dadgeha Destûra Bingehîn a Karlsruhe di cotmeha par de ew qismen betal kir û weke sedem jî diyar kir ku malbatên têkildar nikaribûn pêdivîyên bingehîn ên zarokên xwe bi vê alîkarîyê tedarîk bikin.

Ev rêvebirên pragmatîk ku şûr simbêlê wan nabire ji pirsgirêkên civakî dûr in û ji coş û heyecanê bêpar in

Gava behsa *Hartz IV* a keskên Hamburgê tê kirin, mirov carna bersivên ecêb werdigire. Xatûn Fegebangk dipejirîne ku *"ast zêde nizm e, lê belê em hertim difikirin ku lihevgihandina alîkarîyên civakî û meaşê bêkarîyê fikreke baş e, bi taybetî ji bo teşwîqkirina ji nû ve karkirina bêkaran"*. Guftugo dema germ dibe, ciwana hilbijartî argumana xwe ya bingehîn tîne ziman: *"Reformeke wisa, bi her halî, axcax ji alîyê hevgirtina sor û kesk ve dikaribû were dest pê kirin. Eger CDU û FDP insîyatîf standibana, ev ê bibûya destpêkirina şoreşekê!"* Ev yek bi awayeke eşkere vê yekê îfade dike: alîgirên ekolojiya siyasî ya nûjen jî hene.

Keskên Hamburgê yên bi xurtî bawer dikin ku *"aborî û ekolojî ji bo lihevkirinê pêk hatine"* nimûneyên pir berbiçav in ji bo nîşandana guherîna di pazdeh salên dawîyê de bi endam û hilbijêrên partîyê re peyde bûye. Qismek ji endamên kevin ên "Lîsteya kesk û alternatîf" (GAL) a ku demeke dirêj li lîmana çepê rawestiyabû, di 1999ê de bi armanca şermezarkirina biryara hikûmeta federal a erêkirina beşdarîya Almanyayê ji bo şerê Kosovoyê, derî bi hêrs girt û çû. Destberdana ji pasîfîzma berê û qelsîya ku bi xwe re anî, şûna xwe dan nifşekî nû yê mîlîtanên pir baş perwerdekirî, ji alîyê aborî ve pir rihet û pir bi serûber û gihîştî ji bo sazîyan û herwiha ji bo danûstandinên bi derdorên karsaz re. Berdevk Anja Hajduk di şexsê xwe de vê guherînê nîşan dide: Hajduk a ku bi pîşeya xwe psîkolog e, dibêje heta ku wê karta partîyê di 1995ê de wergirt, *"ji bilî dengdana ji bo keskan"* wê ti caran mîlîtanî nekiribû. Piştî ku di 2002yê de ji bo parlemena federal hat hilbijartin, wê jî li gel hevalên xwe yên li parlemanê dengê erê da daxistina bacên ji bo derdorên herî dewlemend, ku rêjeya bacdayîna wan di pêvajoya salên hukûmeta Schröder de ji sedî 53yê daket ji sedî 42yê. Hajdurk wiha dibêje: *"Şemaya çep-rast tu caran bi serê min neketiye û ez pê îkna nebûme. Tiştekî baş e ku kesk berê xwe ji aborîyê re vekin"*.

Norbert Hackbusch, ê ku 16 salan di nav partîya keskan de bû û di 1999ê de jê veqetiya, vê rewşê wiha dinirxîne: *"**Anja Hajduk** nûnereka tîpîk a van Keskên nû ye. Ev keskên nû yên ku li tevahîya welêt serkeftinan bi dest dixin û şûr simbêlên wan nabire û rêveberên pragmatîk in, ji coş û heyecanê bêpar in û ti paxavê bi pirsgirêkên civakî nakin, ango beramberî pirsgirêkên civakî bi temamî sersar û xemsar in"*. **Hackbusch** ê ku îro di nav konseya şaredarîyê de li nav refên ***Die Linke***, ku partîya "çepa çepên" alman de cih digire, gotinên xwe wiha didomîne: *"Hamburg yek ji bajarên herî dewlemend ên welêt e, lê belê ew di heman demê de di nav bajarên herî xizan de jî cih digire. Li vî bajarî ji her pênc zarokan yek jê li bin sînorê xizanîyê dijî, lê belê malbatên xizan dengên xwe bi kar naynin, an jî qet nebe ew dengên xwe nadin keskan"*.

Yek ji gazinên sereke yên ***Hackbusch*** ji hevalên xwe yên berê dike, zexelîya hevalên wî yên berê ya der barê mijara bacê de ye. Li gor sinifandina dawîyê ya kovara *Manager,* ji sêsed sermayedarên herî dewlemend ên alman bîst û şeşê wan rûniştvanên Hambourgê ne û li vî bajarî mîrasa ji dêûbavên wan ji wan re maye qasî 44 milyar ewro ye, ango nîvê hilberîna hundirîn a brut a bajêr e. Hackbusch wekî din dibêje: *"Hamburg dibe ku paytextê ewropî yê jîngehparêzîyê be, lê belê ew paytextê alman ê reva ji bacê ye jî"*. Loma jî hejmara kontrolvanên bacê bi awayekî berbiçav kêm in: Di 2010ê de, ji 627 welatîyên ku hatina xwe ya salane li raserî milyonek ewro diyar kirine, daîreya bacê kariye tenê 31 kesên ji wan kontrol bike. Di vê rewşê de pereyê ku ji bacê tê revandin û qezenc kirin bi sedan mîlyon ewro ye. Hilbijartîyê Partîya Çep serê xwe dihejîne û wiha dewam dike: *"Me xwest ku sed û pênc kontrolvanên din ên bacê li yên heyî bên zêde kirin* (5), *lê belê keskan nexwest ev mijar were rojevê jî"*.

Gelo niha pêwist e ku mirov li bendê be ku sermayedarên mezin ên li ***Birca Marco Polo*** bi cih bûne, di hilbijartinên bên de dengên xwe bidin jîngehparêzan? Di vê mijarê de mirov nikare ew çend piştrast be. Birc li ser nîv-giraveke xwezayî ya ku xwe berdide nav avên benderê hatiye ava kirin û ev yek derfetê dide rûniştivanên wê ku li hatin û çûna keştîyan, li rêwiyan temaşe bikin. Halbûkî xwedîyên vê têgehê detayeke pir balkêş jibîr kiriye: Dûmanên bijehr ên ku ji qesrên li ser avê difirînin derûdorê, ji alîyê bayên xurt ve bi dijwarî berbelavî eywan û paceyên bircê dibin. Li gor lêkolîneke ku ji alîyê *Spiegel*ê ve hatiye kirin, hewayê ku rûniştivanên bircê dikşînin bi qasî toza *"50 hezar kamyonên ku saetê bi leza 130 km diçin, berdidin hewayê ne û divê çendeyeke mezin dîoksîta kukurtê, dîoksîta azotê û hin madeyên din ên kanserojen jî lê bên zêde kirin"*. (6) Ma wê ev jî bibûya, wê multîmîlyoneran li avasazîyên xwe yên luks jehra ku ji gera bi keştîyên luks tê, tenefus bikirana? Wisa xuya ye ku pêşketina dewambar di nav xwe de gelek tiştên nepayî vedişêre.

* Rojnamevan

1 *Tageblatt Online,* 14 nîsan 2011

2 *Der Tagespiegel,* Berlin, 7 mijdar 2010

3 Jutta Ditfurth, *Krieg, Atom, Armut. Was sie reden, was sie tun: die Grünen*, Rotbuch, Berlin, 2011

4 Di çileya 2007ê de, Peter Hartz ji alîyê dadgeha temyîzê ya Braunschweigê ve ji ber pêşkêşkirina bertîl, geryan û fuhûşê ji bo endamên komîteya şirketa Volkswagen, bi 576 hezar ewro û du salên girtîgehê ya paşdexistî hat ceza kirin

5 En Allemagne, le contrôle fiscal est du ressort des Länder. Li Elmanyayê kontrola bacê berpirsiyariya *Länder* (wilayetan/ eyaletan) e

6 "Luxusprobleme in Hamburg", *Der Spiegel,* Hamburg, 5 adar 2010



Fehmî Balayî: **Xecê û Siyamend**, Boyaxa rûnî li ser tuwalê, 100 x 80 cm

Joschka Fischer û "Keskên Zêrîn"

Serkevtinên di hilbijartinên demên dawî de yên keskên alman û anketên encamên wan bicazîbe yên ku kesk bi dest dixin, bûn sedemê spekulasyonên têkildarî namzetîyeke muhtemel a **Joschka Fischer** ji bo hilbijartinên giştî yên 2013ê. Ji bo vî xoşevîstê xwedî giranî yê çapemenîya wêdetirî-Rhinê, ku demeke dirêj weke *"mirovê siyasî yê herî navdar ê welêt"* cih dayê, ku di heman demê de alîkarê serokwezîrê berê û wezîrê karên derve yê serdema **Schröder** bû, derdorên çep xelefîya **Angela Merker** layîq dibînin. Birêz **Fischer** herçendî sond dixwe ku ji bo wî *"vegera li siyasetê bi ti awayî ne mijara gotinê ye"*, berevajî, ev tekzîbên wî dibin sedem ku edîtoryalên rojnameyan zêdetir û bi coşeke mezintir pesnê wî *"rûsipîyê biaqil"* û dildarê xwarina xweş û heyranê şereba bi kalîte bidin. Rojnameyên rastê jî di pesindana wî de, ne yên herî dawî ne. Edîtorîyala rojnameya herî bijarte ya kevneparêz a grûba Sprînger *Die Welt* bi sernavê *"Gelo kesk dikarin serokwezîrekî jî derxin"*, pesinnameyekê dinivîse ji bo *"kalîteyên bêhempa" yên ku Joschka Fischer di dema rêveberîya xwe de îspat kirine*". Nivîs bi van gotinên dawetkar bi dawî dibe: *"Fischer nebe, rizgarî nabe. Lê belê ew naxwaze. Kî dizane, belkî jî ew dixwaze?"*. (1)

Eger jîngehparêzê herî daxwazkirî yê Almanyayê di xwe re nabîne xwe bide ber daxwazeke wisa, ev yek ne tenê ji ber nefsbiçûkî an jî zexelîya wî ye. Sedema vê her weha ew e ku ew çiqasî di siyasetê de xwedî qabîliyetên *"bêhempa"* yên ji bo birêvebirinê ye, di dema xwe ya xanenişîniyê de ewqasî qabîliyetên wî hene ji bo ku li kêfa xwe binêre.

Eynî mîna dostê xwe **Schröder** ê ku hema piştî windakirina di hilbijartinên 2005ê de bû karmendê grûpa şirketên rûs ***Gazprom***ê, Fischer bi karneya adresan ku salên deshilatdarîya xwe de dagirtine niha ji şirketên navneteweyî pereyan didoşe. Şirketa wî ya *"consulting"*, ***Joschka Fischer & Co*** ("co" tê wateya hevkarê wî **Dietmar Huber**, berdevkê grûba keskan a li parlemena federal di navbera 1995 û 2004ê de) xwedîyê mişterîyên weke *BMW, Siemens* an jî *REWE*, dêwa ewropî ya *"hard discount"* e. Ev salek e ku, ev şirket wekî din ketiye nav karûbarê pêşvebirina projeya lûleya gazê ya tevneşirketa ewropî ***Nabucco***, bi taybetî jî li ba rêveberên *Tirkmenistan, Iraq û Tirkiyeyê* – karê taybet ê tam li gor patronê berê yê dîplomasîya alman e.

Gava ji wî tê pirsîn ka navbeynkarîya wî çend milyon ewroyan pê dide qezenç kirin, ev rûçikê nimînende yê tevgera jîngehparêz bi quretî vê bersivê dide: *"Ez ji bilî bacgerîyê, ne mecbûr im hisab bidim ti kesî. Hûn dibînin, alîyê baş ê vê wezîfa min a nû jî ev e"*. (2) Çêtir e **Fischer** hisabên xwe bide **Madeleine Albright**: Kabîneya şêwrê ya ji aliyê wezîra karê derve ya berê ya **William Clinton** ve avakirî, *The Albright Group LLC,* ji sala 2008ê ve ji bo xweşkirina "danûstandina" navbera sermayedaran û gerînendeyên tevahîya cîhanê, bi hemkarê xwe yê alman dişêwire. Li vir dîsa, berdêla xizmetên wî veşartî dimîne, lê belê mirov dikare şert bigire ku perê ji vir distîne, ne kêmî heqdestê serokwezîrekî ye.

Serpêhatîya jîyana vî "qaçax"ê berê yê Frankfûrtê –Fischer ji bo komikeke bi navê ***Têkoşîna Şoreşger*** (RK) di salên 1970yê de mîlîtanî dikir– hevalên wî yên jîngehparêz zêde şaş û metel nahêle. Ji dema ku wan çêja deshilatdarîyê standiye, pratîka xwe dispêre *"bi awayekî din siyasetkirin"*ê, ango bikaranîna CVya xwe ya siyasetê weke kilîteke ku deriyê cihana karsaziyê lê veke, li cem wan êdî bûye adetek. Wezîra keskan a Tendurustîyê di nav hukûmeta **Schröder** de, **Andrea Fischer** (ti têkilîya wê ya xizimtîyê bi **Joschka** re tine) di 2006ê de xwe gihand ajansa ragihandinê *Pleon*, ku bispor e di karûbarên lobîkirina ji bo pîşesazîya dermançêkerîyê de. Ev xatûn îro bûye *"şewirmenda serbixwe"* li cem pîşesazîyên tenduristîyê. Hevalê wê **Norbert Schellberg** çav li wê kir û da ser rêça wê: Ev berdevkê keskan li Berlînê, ji bo berjewendîyên *Federasyona Dermançêkeran (VFA),* dîsa bi awayekî hemwext parêzvanîyê dike ku grupa sereke ya berjewendîgirên ji laboratuvaran e.

Her çi **Michael Vesper** e, ew bi xwe lîstika pokerê ya li ser Înternetê tercîh dike. Di adara sala bihurî de, sekreterê giştî yê berê yê koma keskan a li meclîsa federal û wezîrê Lojmanan yê berê yê li Bakur Ren-Westfalya beşdarîya semînereke "biryarwergirên-sereke" kir ku ji alîyê kovara *Sponsor's* û pîşesazên lîstikên qumarê yên li ser Înternetê ve hatibû organîze kirin. Rojeke bi kêf a hemû mesrefên wê ji alîyê kesên din ve hatî dayîn a li qesra *Girava Sylt* derbaskirî, li nav sosyeteya jet a alman, li gel tenîsvanê navdar ê berê **Boris Becker** û wezîrê aborîyê yê Saksonyaya Jêrîn, lîberalê **Jorg Bode** –na'meteke wisa çawa dikare bê red kirin?

Berbelavbûna alîgirên fişerîzmê –ji qewlê kesên li dijî wan, *"Golden Grünen"*,– ji pîşesazîya çîkolatayê jî bêpar nemane. Grupa amerîkî *Mars Incorporated* rêveberîya beşa xwe ya "tendurustî, xurek û pêşketina dewambar" spart parlementerê berê yê keskan **Mathias Berninger**ê ku heta 2005ê bû sekretera Dewletê ya Parastina berxwiran li nav hukûmeta **Schröder**. Her çi çixarekêş in, ew ê xwe bispêrin parastina ji alîyê **Marianna Tritz** ve: Ev parlementer û berpirsîyara berê ji karûbarên berhevkirina alîkarîyên xêrê û ji têkilîyên li gel şirketan ji bo koma keskan a li nav meclîsê, îro ji bo *Federasyona Alman a Pîşesazên Tûtinê* (DZV) lobîyê dike. Dema wê dest bi vî karî kir, anî ziman ku parastina çixarê dozeke *"super dilbijîner"* e. Lê belê ji bo pirsa ka zewqa wê ya macerayê gelo dikare rojekê wê bavêje himbêza pîşesazîya nukleerê jî, vê mîlîtana jîngehparêz bersiveke jê nedihat payîn da: *"Tiştekî wisa ne mijara gotinê ye."* (3)

Enerjîya nukleer tevî vê yekê ji bo jîngehparêzan êdî ne tabûyek e. Parlementera keskan a sêzdeh salan li parlemana federal, **Margareta Wolf** di 2008an de "personal"a ajansê entegre kir, li nav ajansa ragihandinê *Deekeling Arndt Advisors* û li vê derê ew di der barê fazîletên "şûştina bio" de dersan dide pîşesazên atomê. Promosyona wê pir baş digunciya li gel ya **Rezzo Schauch** digunciya, fîgurê dîrokî yê partîyê û berdevkê berê yê keskên li parlemena federal, ku êdî ji hingê ve xizmetê dide kargeheke girêdayî navendên nukleer ên *EnBW*. Parlementera keskan a sêzdeh salan û bispora pirsgirêkên enerjîyê li "talk-show" ên televîzyona alman, Xatûn Michaele Hustedt bi xwe, vê gavê gîyaneke bi coş dide camekana "enerjîyên dikarin bên venûkirin" ya RWE û hêjayî gotinê ye ku RWE duyemîn hilberînera herî mezin a enerjîya nukleer a Almanyayê ye.

O. C.

1 *Welt am Sonntag,* Berlin, 10 nîsan 2011

2 *Der Tagesspiegel,* Berlin, 30 kanûn 2007

3 Handelsblatt Online, 12 hezîran 2008

Wergera ji fransî: Baran Nebar

www.warsiyaki.org

Hêvî, bergeh û şikestîxeyalên şideta siyasî

Li ser riya dijwarîya têkoşîna çekdarî

Laurent Bonelli

Ji êrişên 11ê îlona 2001ê ve, hêzên rojavayî rahiştin honandina şerê bi giranî stratejîk li dijî terorîzmê, bêyî ku bê zanîn ka ev têgeh tê çi wateyê. Bi rastî jî, di navbera komikên radîkal ên ku salên 1970yê derketine holê, tevnên El-Qaîde û têkoşînên çekdarî yên serxwebûnxwaz de çi tiştê hevpar heye? Şahidîyên mîlîtanan ronahiyê davêjin ser bîrbirinên şideta siyasî.

Îroj, ez li pişt her mirîyekî, kesekî, ferdekî dibînim. Ez van hemû qurbanan, yên ne rasterast jî, di hundirê xwe de dihewînim. Ji ber ku ez yek ji van kesan bûm ku pêşniyar û biryarên mehkûmîyetan dan. Berpirsîyarîya min hiqûqî, siyasî û exlaqî ye. Ez hersiyan jî qebûl dikim". *La Prima Linea* weha diqede. Ev fîlm îlhama xwe ji otobîyografîya **Sergio Segio** werdigire, damezirînerekî koma îtalî ya di dawîya salên 1970yê de têkoşîna çekdarî dida meşandin. (1) Di 2004ê de ji zîndanê derketî, piştî kêşana cezayekî 22 salî, **Segio** lê zêde dike: *"Me digot qey em rast in, bes em xelet bûn. Lê belê, wê demê, me pê nedizanî".* Fîlmên li ser çîrokên fraksîyona *Artêşa Sor* (Rote Armee Fraktion - RAF) a almanî, Çalakîya dîrekt (Action Directe - AD) a fransî, **Îlîch Ramîrez Sanchez** -ku weke "Carlos" tê nasîn- û heta ya Artêşa Sor a japonî jî hatin derhênan. (2) Weşanxane bîranînên kevnemîlîtanan diweşînin an werdigerînin; heta çapemenîya giştî jî êdî pirsa rabihurîya wan li wan dike. Mîna ku rexnegirîya wan a îroyîn li ser serbûr û salên wan ên di zîndanê derbasbûyî de, rê didin, nîşandana hin formên empatîyê yên berê nedihatin qebûl kirin.

Herkes xwedîparê vê nihêrîna bitehamultir nîne. Redkirina Brazîlyayê ya dersînorkirina **Cesare Battîstî** yê kevneendamê *Proleterên Çekdar* ên ji bo *Komunîzmê,* pêleke nerazîbûnê li Îtalyayê da dest pê kirin. Li Fransayê, betalkirina nîv-azadîya **Jean-Marc Rouillan** ê damezrînerekî ADê, piştî hevpeyivîneke di 2008ê de, her weke daxuyanîyên wezîrên karên navxweyî -û yên "bisporên" wan- ên meraqdarîya li ser "vegereke ultraçepê" derdibirin, nîşan didin ku birînên dema bihurî bi temamî nekewiyane.

Dîsa jî, ev baldarîya nûjen a li ser ji nû ve gêşbûna hêza ultraçepê hindik e li gor belavbûna nivîsên li ser "terorîzma îslamperest" a niha mijara sereke yê nîqaşa li ser şideta siyasî ye. 2007ê, **Andrew Silke** yê birêveberê *terorism studies* li Zanîngeha Londraya Rojhilat, dida xuyan ku ji demê bûyerên 11ê îlona 2001ê ve, her şeş seetan pirtûkeke nû li ser vî mijarî li welatên ingilîzîaxêv derdikeve. (3) Anketên rojnamegeran, şahidîyên bawerbar an nebawerbar ên kevneîstixbaratkeran an yên tundrewên misilman ên "îtîrafkar", li bi sedan nivîsar û pirtûkên akademîk zêde dibin. Piranîya wan "terorîzmeke nû" salox didin, ya ku ji şiklên berê yên şideta siyasî gelek cuda ye ku hema bêje tukes mekanîzmayên wan nayîne ber hev.

"Terroristologie" ya nemuhtemel

Encama vê li ser hev kirina kaxizê ne pir baş e. **Silke** derdibire ku % 80yê lêkolîn bi tenê li ser bingeha materyalên destê duyem (pirtûk, kovar, çapemenî) tên çêkirin, ku xwerû % 1ê hevpeyivînan bi kar tînin û ku *tu anketa pergalî* li gel cîhadîyan çênebûye. (4) Ev dûrbûna ji zemîn, şiroveyeke ji hedê xwe zêde ya axaftinên wan ên umûmî bi xwe re tîne, mîna ku sedemên têkoşînê û sedemên têkoşêr bi xwe aynî bin. Lê belê, maneya dubendîyekê (neteweparêzî, dînî, çînî, hwd.) pirî caran piştî pevçûnê xuya dibe, dema ku aktoreke wê şûneke serdestîyê ji xwe re misoger kir û dikare nihêrîna xwe ya li ser pevçûnê rewa bike. Wek mînak, insûrê dînî yê şerê azadîya cezayîrî, piştî serxwebûnê gelekî jê hat birin, tevî ku istîxbaratên fransî di ber şerî re ew weke elemaneke bingehîn dihesiband. (5)

Ji bilî çend bisporên civakên misilman, piranîya lêkolîneran tundrewîya îslamperest weke dîyardeyeke jixweber dihesibînin û wê di paşxana zemînên din ên zanyarîyên civakî de nanirxînin. Bi kincên nû yên "terorîstnasîyê", ev domdarîya "sovyetnasîya" berê ku xwest *Yekîtîya Sovyet* bi riya axaftinên rayedarên partîyê û enterpretasyona bilindbûn an nizmbûna paya wan şirove bike. Lê zehmetîya anketan hertiştî rave nake. Divê bikaranîna zêde ya analîzên bi vî rengî bi taybetmendîyên analîzvanan û şûna wan a li ser sînorê cîhana akademîk, istîxbarat (ji xwe kevneendamên wan in an jî bi wan re di têkilîyên nêzîk de ne), bisporîya giştî (li nav komîsyonên neteweyî an navneteweyî an fikirdankan *(think tank)*) û bi zemînê medyayî ve bê girêdan. Armanc ev e ku biryardayîna siyasî ya li hember tehlûkeyeke ku pir xeternak tê nîşan dan hêsantir bike, û bal zêde li ser dînamîkên pevçûnan neyê kişandin.

Ji bo têgihîştina "şideta siyasî" jixwe, divê pêşî mirov gumanê ji xuyanîbûna yekbûna diyardeyê bike. Têkilîyên dem û dem ên navbera mîlîtanên îtalî û ADê, an jî navbera ***RAF*** û çalakvanên ***Fraksîyona Artêşa Şoreşgerî ya Lubnanî*** (FARL) nayên maneya ku ew bi "tayekî sor", weke ku berê dihat gotin (yanî ji hêla Sovyetan ve kontrolkirî), bi hev ve girêdayî ne û ku li pey heman armancan diçin. Bi aynî rengî, fikira ku şervanên ***Koma Salafîperest*** a ji bo waaz û têkoşînê (GSPC) a cezayîrî û ***Jemaah Îslamîya*** ya endonezî meylên mînareng par ve dikin, absurd e, li gel ku herdu koman jî qebûl kir ku çalakîyên xwe di bin sîwana ***El Qaîdeyê*** de pêk bînin.

Fikira civandina di bin etîketeke hevpar de ya komên çend dehan, heta çend sedên ferdên radîkalbûyî yên grubên weha, û rêxistinên siyasî yên leşkerî û xwedîyên rûniştineke civakî û erdî, weke ***Hamas***a filistînî, ***Hêzên Çekdar û Şoreşger yên Kolombyayê*** (FARC) an ***Partîya Karkerên Kurdistan (PKK)*** li Tirkiyê jî çêkirî ye, tevî ku evên han jî ji hêla Yekîtîya Ewropayê ve weke rêxistinên "terorîst" tên hesibandin. (6)

Alternatîveke baş a ji bo analîzkirina şideta siyasî ev e ku paşxaneyên belavbûna wê, rêxistinên ku wê bi kar tînin û serbûrên mîlîtanên wan bi hev ve bên girêdan. (7) Mînak, "çemberên şidetê" yên li Ewropa û Japonyayê di nava dawîya salên 1960ê û ya salên 1980yê de, berî hertiştî ji lawazkirina tevgerên civakî yên bihêz tê. Lawazbûna wan a gav bi gav hin mîlîtan ber bi têkoşîna çekdarî ve birin. Bi heman rengî, derketina holê a komên cîhadî di salên 1990ê de, bi bêimkanîya hêzên siyasî yên îslamperest a ji bo bidestxistina desthilatê *(bi taybetî li Cezayîrê, li Misrê û li Suûdî Erebistanê)* ve girêdayî ye. (8)

Lê awayên cihê yên vê radîkalîyê hene. Li Îtalyayê, ew di serî de têkildara cîhana karkeran e. Dawîya salên 1960ê, pevçûnên civakî yên xurt kargehan (nemaze **Pîrellî** û Siemens) dihejînin. "Propagandaya çekdarî" li wir çêdibe. Çalakîyên pêşî - xirakirina erebeyên serhosteyan an zeftkirina kadroyan- pêkanîna civakî ya komên çekdarî dide xuyan. Ji 1337 kesên bi endametîya ***Brîgadên Sor*** (Brigate rosse - BR) mehkûmbûyî, % 70 karker, xebatkarên sektora xizmetê û xwendekar in. Şirketa *Prima Linea* bêhtir ji bêkar û xwendekaran pêk dihat, lê ji nav 923 endamên wê yên derketî ber mehkemê, herweha pareke mezin a karkeran jî hebû. (9)

"Ew bi êrişkirinê mijûl bûn"

Li Almanyayê, mîlîtanên ***RAF***ê bêhtir ji nav xwendekar û burjuwazîya nizim û rewşenbîrî derketin. Civaknas **Norbert Elîas** şanî da ku sedema derketina muxalefeteke derparlemanî li dawîya salên 1960ê *"pevçûneke civakî ya nifşan"* bû, li gel dijberîya nav ciwanên baldarên siyasetê lê li derveyî berpirsiyarîyên siyasî hiştî û mezinên wan ên ku ev berpirsiyarî hemî ji xwe re vediqetandin. (10)

Bîst salên bi pey şerê cîhanî yê duyem re, tirsa vegera hikûmetên faşîst li van herdu welatan jî xurt bû û yek ji sedemên peydabûna wir a tevgerên tundrew ji hemû deverên din zêdetir li van her du welatan mezintir bû. *"Li gel bûyera piazza Fontana*, **Mario Morettî** birêveberekî sereke yê BRê şirove dike, *ji bo me tiştekî tenê dîyar bû: Wan dikir êriş bikin".* (11) Li alîyê din, bombeya ku 12ê kanûna 1969ê di banka zîraatê ya Mîlanê de diteqe û dibe sedema mirina 16 kesan û birîndarbûna bi sedên din, ji xwe rîska pêşdeçûneke otorîter a rejîma faşîst bawerbar dike. **Sergio** jî rewşa wê demê weha dinirxîne: *"Ez bi fikira ku ew derbeyan amade dikin, mezin bûm ku ew darbeyeke rengê Yûnanîstan an şîlîyê amade dikin. Û bi fikrê ku wan dê em bikuştana jî. Jixwe dest pê kiribûn".* Di navbera 1969 û 1975ê de, piranîya bûyerên şideta siyasî ji hêla komên rastgir ve tên kirin (% 95 ji 1969ê heta 1973ê, % 85 di 1974ê û % 78 di 1975ê). (12) Çepa tundrew ya leşkerî wê tenê bi pey re çalakîyên xwe xurt bikirana: Di navbera 1978 û 1982ê nêzî % 80 êrişên kujer ên ku tên bawer kirin, bi berpisiyarîya wê qewimîn an jî wê bixwe li ser xwe girt. (13)

Li Almanyayê, nifşên ciwan birêvebirên siyasî weke berpirsên rasterast an nerasterast ên desthilatdarîya **Adolf Hîtler** didîtin û lewre jî li hember wan derdiketin. Fikra wan ev bû, **Elîas** vedibêje ew difikirîn *"ku meyla bikaranîna şideta siyasî ya Komara Weimarê ber bi cihanîna hikûmeteke otokratîk a li ser bingeha quwetê sazkirî ve biribû, dikarî dîsa li Komara Bonnê* [paytexta Almanyaya Rojava] *bibe serdest.* (…) *Pareke mezin a enerjîya wan a reformxwaz an şoreşger ji vê fikirê dihat ku, li pişt rûyê dewleta wan a parlemenerî û pirpartîyî, li gel lîwayên xwe dîktatorekî nû xwe amade dikir û polîsê Komara Federal jî pêşengîya wî dikir ".* (14)

Rewşa Fransayê cuda ye. Bêrîkerên desthilata ***Vichy*** hindik in; tevgerên rastgira tundrew ên ji bo Cezayira fransî têk çûn. Bernameya hevpar a hikûmetê ku *Partîya Sosyalîst, Partîya Komunîst a Fransî* û tundrewên çepê li 1972ê îmze kir, enerjîya reformxwaz aş dike û rê dide veguherînên ferdî. Çepa tundrew di ber zelalbûna gumanên piştbûyerên gulan-hezîrana 1968ê derketî û istiqrarbûna leyistika siyasî re hêza xwe winda dike. **Lîga Komunîst** (Ligue communiste) ku li hezîrana 1973ê, piştî êrişa mîtîngeke rasta tundrew ji hev dibe, dev ji pevçûnên kolanan berdide û bera xwe dide *"xebata di kargehan de".* Bi navê xwe yê nû, **Lîga Komunîst û Şoreşger** (Ligue Communiste Révolutionnaire -LCR), ew bi hêdîka têk dibe û mîlîtanên wê yên herî şidetparêz bêzar dibin. (15) Herçi **Çepa Proleterî** (Gauche prolétarienne) a sala 1970yê qedexekirî, ew li mijdara 1973ê ji hev dibe, piştî dudilîyên li ser peydakirina riyeke radîkaltir -nemaze dema revandina kadroyekî ***Renault*** a li pey mirina mîlîtanekî karker ê maoîst, **Piere Overney**. Berevajîyê rûdanên li Îtalya an Almanyayê, hejmareke pir kêm a mîlîtanên fransî tevlî çalakîyên çekdarî dibe. Hin grubên maoîst derdikevin holê: **Brîgadên Navneteweyî** (Bridages internationales ; 1974-1977) êrişên li dijî çend nûnerên hikûmetên otorîter ên bîyanî (yên Bolîvya, Uruguay, Spanya, Îran an Maurîtanyayê) li ser xwe digrin; ***Dendikên Çekdarî yên ji bo Xweserîya Gelêrî*** (Noyaux armés pour l'autonomie populaire, NAPAP) sala 1977ê rêzeke çalakîyên li hemberî sazîyên giştî an şirketên mezin pêk tînin, mezintirîna wan kuştina **Jean-Antoine Tramonî** yê zêrevanê Renaultê yê Overney kuştibû.

Sala 1979ê, ev tevgera hanê û Komên ***Çalakîya Şoreşgerî yên Navneteweparêz*** (GARI), etîketeke sîwan a ku çalakvanên hemberî frankîzmê yên li herdu alîyên Pîreneyan dicivîne, bi hev ve dibin û AD çêdibe. Hevalekî nêzîk ê **Salvador Puig Antich** ê 1974ê ji hêla dîktatorîya spanî ve hatibû kuştin, **Rouillan** di bîranînên xwe de bi giranî vedibêje: *"Em sî salên gerîlatîyê didomînin, em hê jî tayê zirav ê me bi efsaneyekê ve girêdide dihonin, bi artêşeke pînekirî û pêxwas ve, bi hêvîyeke herfên barûtê û qurşûnê ve".* (16)

Rewatîyeke exlaqî û zîrekîya xebatê di van jenealojîyan re derbasî nifşên nû dibin. Lidarxistina çalakîyeke komandoyê, çêkirina kaxizên sexte, êrişbirina li ser bankan ji bo fînansmana têkoşînê, hemû pratîkên ji tecrubeyê ne. Piranîya çekên BRan ji bermayîyên partîzanên şerê cîhanê yê duyem dihatin (heta yek ji kalaşnîkovên di revandina Aldo Moro yê kevneserokê Desteyê de hat bi kar anîn û neşixûlî); an jî, ji bo ADê, ji çekên komarparêzên spanî yên koçî Fransayê bûyî bi xwe re anîbûn. Herçi cîhadîyên transneteweyî, divê rola têkoşîna li dij Sovyetan li Afganîstanê were bi bîr xistin, ku tevahîya nifşekî mîlîtanan li dor şerî civand û hemû cure malzeme (çek, teqemenî, pere, hwd.) û "qabilîyet" jî dan peyda kirin.

Dîsa jî, ferdên ku çalak dibin kêm in. Em ê di serî de şiroveyên rehet ên bikaranîna şidetê weke "subjektîvîteyeke patolojîk" an "pulsîyoneke mirinê" dinirxînin, red bikin. Fîlozof **Hélène L'Heuillet** weha dibêje *"terorîstên fanatîk an mêjîşûştî, mirina xwe di xizmeta mirinê de pêşkêş dikin ji ber ku, qet nebe gava tevlî dibin, ew bi înkara nîhîlîst bawer dikin; ya ku soza xirakirina dinyayeke jê nefretkirî dide".* (17) Ev îfadeya ha nivîsên dîktatorîya arjantînî tîne bîra mirov, ku sala 1978ê tevgerên berxwedana çekdarî weke *"heyranên mirinê bi îmaja qehremanên trajîk ku helwêstên wan ên civakî"* bi *" evîneke ji bo mirinê re, tev digeriyan"* dinirxandin. (18)

Biryardayîna bikaranîna şidetê berî hertiştî meseleyeke kolektîv e: Ferdê xwe ji dinyayê qutkirî ku xwe bi xwe radîkal dike, doh bi xwendina hin pirtûkan, îroj bi ziyareta forumên Înternetê û ku çalak dibe, pir kêm xuya dibe. Ewqas kêm in ku hin ajanên istîxbaratê ji van re *"dosyayên dînan"* dibêjin.

Civak bi taybetî jî malbat bi roleke girîng radibin. Dema ku şer mayînde bibe, em pir caran dibînin ku nifşên pey hev dikevin riya çalakîya çekdarî, mînak mîlîtanên neteweparêz ên bask an îrlandî, an jî çalakvanên sîkh, kurd an filistînî. **Claude Halfen** ê endamekî ADê tecrubeya xwe weha vedibêje: *"Ez ji malbateke berxwedêran dihatim,* (…) *dapîr û bapîrên min ji welatîyê hatibûn avêtin. Piştî 1927ê dîsa bûn welatî û yekser, 1941ê, ew kirin bêwelat, qaçax. Di mezinbûnê de fikir her bi min re hebû ku li hemberî desthilateke nerewa û şideta wê çekhildan tiştekî bi rûmet bû".* (19) Serbihorîya têkoşînan di nav malbatê de, bi awayekî teşwîqî doza şidetê dike û wê rewa dike.

Têkilîyên dostanîyê jî weha ne. Destbiratîya ciwanên di heman taxê de mezinbûyî carina çîmentoya komê ne, mînak ji bo **Khaled Kelkal** (ê têkildarê bombeteqandinên 1995ê li Fransayê), an jî hin komandoyên **Euskadi Ta Askatasuna** (**ETA**) li Spanyayê û **Irish Republican Army** (**IRA**) li Îrlanda Bakûr. Çemberên hevalbend ên piçûk dikarin radîkalbûneke gav bi gav a ferdan bi xwe re bînin, ji ber ku îmajên hevpar ên rewşa civakê ava dikin. Hevalên berê an zêde bi dozê nebawer, di ber pevgirêdana dendika navendî re jê dûr dibin. (20) Endamên muhtemel bi riya propagandayê ber bi alîyê rêxistinên qaçax ve nayên "kişandin". Sîlke dinivîsîne *"ferd ji ber hewldanên endamgerekî **El Qaîde** radîkal nabin, ev pêvajo bi awayekî ji cîhadîyên heyî hema hema serbixwe çêdibe".* (21) Bombeteqînerên 7ê tîrmeha 2005ê li Londrayê hinekî dûrî dîn bûn û tê gotin ku wan tenê di rojên nêzîkî bicihanîna çalakîyê de ji rayedarên **El Qaîde** destûr xwest.

Lê belê qulibandina di çalakîya bişidet de ya komeke di warê îdeolojîk de radîkalbûyî, ne pergalî û ne hewceyî ye jî. Du insûrên din ên pirî caran pevgirêdayî jî rolekê dileyizin: Kirinên dewletê û qaçaxî. Şideta siyasî hema bêje tu caran ne encama çêkirina grupeke çalakvanan bi tenê ye. Ew têkel e: Siyasetên derve yên ku li hemberî hin welatan tên

www.kurdishglobe.com

meşandin, şiklên şerî, ferzkirinê, heta şiklên îşkencekirinê jî, xurtkirina tedbîrên çavdêriyê, kontrolên ku wek piçûkxistin an cudakarîyê tên hesibandin, bi qasî stratejî û taktîkên rêxistinên tundrew girîng in. Wek mînak, hepskirina belasebeb a nêzî du hezar kesên gumanbarên "terorîzmê" li Îrlanda Bakûr di 1971ê de, bi sedan karkerên ciwan ên neteweparêz teşwîqî tevlîbûna nav ***IRA***yê kirin. (22)

Qaçaxbûna ku gelek caran mirov dixwaze ji ber sucekî biçûk xwe ji polîsan rizgar bike, pêk tê, gaveke pêşdetir e. Ew tevlibûneke timamî ye ku tê maneya guherandina nav û nasnameyê û qutbûna ji hemû nas û dostên berê. *" Di qaçaxbûnê de* **Morettî** vedibêje, *zîndîmayîn têkildara lezgînîya tevgeran û guherandina hergavîn a jîyana mirov. Di dawîyê de,* (…) *hûn ji alîyê heyînîyê dibin weke xeyaletekê. Ne ku hûn xwe xeyalî bihesibînin; heval jî rast in û heta têkilîyên bi wan re jî xurtir in. Lê ji bo kesên din, divê hûn tune bin ."* (23) Şahîdîyên hin hevserên bombeteqînerên 11ê adara 2004ê li Madrîdê, vê pêvajoya gav bi gav a bixwe ve girtina komekê nîşan didin, heta dûrbûna teva ji kes û karên herî nêzîk jî. (24)

Ewlehî dibe elemaneke sereke ya jîyana qaçax û qeydeyên wê yên giran jî hene. Sala 1975ê, anketvan di stareke ***Pavie***yê de destpirtûkeke bi navê *"Qeydeyên ewlehîyê û awayê xebatê"* dîtibû, ku planeke wextê tê de hebû ya her kêlîyeke jîyana rojane ya BRan rêz dikir, ji xwarinê heta cil lixwekirinê, bikaranîna telefonan û têkilîyên zayendî jî. 2006ê, Zêrevanîya Sîvîl a spanî tiştekî mînareng a ji bo ***ETA***yê dît. Lê endam herdemî rêzê ji van qeydeyan re nagrin: Girtinên piştî seruveneke evînî an jî têkilîdanîna li gel dayikeke nexweş pir in. Sala 1971ê, hemû apartmanên veşartî yên ***Tevgera Çep a Şoreşger ya Şîlîyê (MIR)*** kefş bûn dema ku mîlîtanên wê yên serxweş bi erebeyê qeza kir. Di otomobîlê de, jandarmayên li cihê bûyêrê hatî hemû fatûrayên ceyran û gazê yên rê dane kefşkirina wan, bi dest xistin... (25)

Rev, zindan an jî mirin

Dîtina çekan û starên nû, çêkirina kaxizên sexte, bidestxistina perê -nemaze bi şelandina bankan-, kefşkirina cihê operasyona bê û carina, piştî pêleke girtinan ji serî ve destpêkirin: Lez û bez zora stratejîyê dibe. Heta ku hin tercihên taktîk ji hêla sempatîzanan ve jî nayên fêm kirin. Ji têwerdana istîxbaratan bêhtir -ku pirî caran behsa wê tê kirin û carina çêdibe jî-, ev encama mekanîzmayeke weha ye ku jê xilasî ne mumkin e. *"Me pê zanî ku em bê çare mabûn, lê me nedizanî berê xwe bidin ku derê"*, **Morettî** derdibire. Di serî de, serbûra qaçaxîyê, devjêberdana girtîyan nemimkin dike. Çi dilsozî bibe, çi hewceyî bibe, divê êrişî ser zîndanan bikin (mînak zîndana **Rovîgoyê** li Îtalyayê ku mîlîtanên **Prima Linea** li çîleya 1982ê êrişî bir ser), rehîne bên zeft kirin (mesele li 1975ê, li balyoza *Komara Federal a Almanyayê* li Stockholmê, an jî li heman salê jî revandina balafireke ***Lufthansa***yê ji hêla mîlîtanên **RAF**ê ve), an jî kesayetîyên navdar bên revandin *(Moro ji alîyê BRan ve; Hans Martîn Schleyer ê serokê patronên alman ji hêla RAFê ve)*. Domandina têkoşînê jî weke awayekî nermkirina şert û mercên hepsbûna girtîyan tê dîtin, mînak ji bo ETAyê li Spanyayê.

Jixwe, mantiqên xebatê û parastina van koman wan mecbûr dikin ku bi awayekî pir bijare endaman qebûl bikin û ji ber vê yekê, ew nikarin bigihîjin hejmareke girîng a ku dê bikaribûya hevsengiya hêzan saz bikira; ya ku ji bo minaqeşeyên siyasî têrê dike. *"Eger hûn qulekê di enîya dijber de venakin, axaftinên we bê mane dimînin,* Morettî tehlîl dike. *Maneya stratejîya me çi ye eger em êdî nikaribinn tevlî muzakereyên taktîk ên herdemîn bibin û tiştekî bi tiştekî din biguherînin, ji bo kesên ku em temsîla wan dikin jî hin tiştan bi dest bixin?"* Revîn û sertkirina çalakîyan, misilemeyên dij hêzên ewlehîyê, an jî êrişên li ser payebilindên dewletê, rûreşkirina komên qaçax xurt dike û wan dûrî tevgerên civakî dike ; yên ku hêvîya piştgirîyê ji wan dikin. Ev jî bi piranî rê dide zêdekirineke nû ya tadeyan a bi riya zagonên taybet. Heta ku tercihên mîlîtanan tenê ev dimînin: Rev, zîndan an jî mirin.

Komên çekdar ên piçûk hê jî timî dikarin li dewletê bixin -ajanên wê an sembolên wê-, lê ew nikarin dewletê bidin erdê, digel bilindkirina asta şideta kujer jî, weke di bûyerên 11ê îlona 2001ê de xuya bû. Lewre jî, ev awayê çalakîyê bi aynî astengên propagandakirinê ya anarşîstên dawîya sedsala 19ê re rû bi rû dimîne. Derdorên berfireh dikarin bi çavekî baş li êrişa nîşanên desthilatê binihêrin, bes ew tevlî têkoşînê nabin. Lê belê, ev êriş dibin sedema zordestîyeke pir zalimane ku li gor tawanbarên umûmî yên ji bo sûcên mînareng hatin girtin, pir bilind e. **Joëlle Aubrona** mîlîtana ADê ya sala 2004ê ji ber nexweşîyeke cidî ji zîndanê derketî, vê tansîyonê weha rave dike: *"Pir ji me weha difikirîn hêvî ji hemleyeke weha dikirin ku nehat. Hîpoteza me têk çû. Ev dîyar e. (...) Lê belê ez ê xwe înkar nekim. Belkî tenê ji ber ku ev şantaja xweînkarkirinê di van hivdeh salên girtinê de, di nav şert û mercên hepsbûna me de pir hebû*". (26)

1 *La Prima linea* ji Renato De Maria (2009), li pey berhema Sergio Segio, *Miccia corta. Una storia di Prima Linea*, Derive Approdi, Roma, 2005

2 *Bnr. Der Baader Meinhof Komplex* ("Çeteya Baader") ji Uli Edel (2008); *Ni vieux ni traîtres [Ne pîr û ne jî xayîn]*, ji Piere Carles (2005); *Carlos*, ji Olivier Assayas (2010) û *United Red Army*, ji Koji Wakamatsu (2008)

3 *The Guardian*, London, 3 tîrmeh 2007

4 Andrew Silke, " Holy Wariors: Exploring the Psychological Processes of Jihadi Radicalisation" ["Şervanên pîroz: Vedîtina pêvajoyên psîkolojîk ên radîkalbûna cîhadî "], *European Journal of Criminology*, 5(1), 2008

5 *Bnr.* Roger Le Dousal, *Commissaire de police en Algérie (1952-1962) [Komîserê polîsê li Cezayîrê]*, Riveneuve éditions, Parîs, 2011

6 Rojnameya fermî ya Yekîtîya Ewropayê, 12 tîrmeh 2010

7 *Bnr.* Donatella Della Porta, " Mouvements sociaux et violence politique" ["Tevgerên civakî û alozîya siyasî"], *di* Xavier Crettiez û Laurent Mucchielli (birêvebir), *Les violences politiques en Europe. Un état des lieux [Şidetên siyasî li Ewropayê. Rewşa heyî]*, La Découverte, Parîs, 2010; Isabelle Sommier, *La violence révolutionnaire [Şideta şoreşgerî]*, Les Presses de Sciences Po, Parîs 2008

8 *Bnr.* Gilles Kepel, *Jihad: expansion et déclin de l'islamisme [Cîhad: Belavbûn û têkçûna îslamperestîyê]*, Gallimard, Parîs, 2000

9 Hejmarên di Paolo Persichetti û Oreste Scalzone, *La Révolution et l'Etat [Şoreş û dewlet]*, Dagorno, Parîs, 2000

10 Norbert Elias, " Conflits de générations et célébrations nationales: analyse et perspectives" ["Pevçûnên nifşan û pîrozbahîyên neteweyî: Analîz û perspektîv"], *Cultures & Conflits*, Parîs, n° 81-82, 2011

11 Mario Moretti, *Brigate Rosse. Une histoire italienne [Brigate Rosse. Dîrokeke îtalî]*, Amsterdam, Parîs, 2010

12 Donatella Della Porta û Maurizio Rossi, *Cifre crudeli: bilancio dei terrorismi italiani [Hejmarên zalimane: Bilançoya terorîzma îtalî]*, Istituto Cattaneo, Bolonya, 1984

13 Paolo Persichetti û Oreste Scalzone, *La Révolution et l'Etat [Şoreş û dewlet]*, *heman berhem*, r. 96

14 Norbert Elias, "Conflits de générations…", *heman gotar*

15 *Mourir à trente ans [Di sî salîya xwe de mirin]*, ji Romain Goupil (1982), ku serbûra Michel Recanati yê berpirsê sereke yê servîsa ewlehîyê ya Lîga Komunîst heta xwekuştina wî li 1978ê vedibêje, wê bêhêvîtîyê baş dide xuyan

16 Jann-Marc Rouillan, *De mémoire (2). Le deuil de l'innocence: un jour de septembre 1973 à Barcelone [Bîranîn (2). Şîna bêgunehîyê: Rojeke îlona 1973ê li Barselonayê]*, Agone, Marsîlya, 2009

17 Hélène L'Heuillet, *Aux sources du terorisme. De la petite guere aux attentats-suicides [Li serêkaniyên terorîzmê. Ji şerê piçûk heta êrîşên intîharî]*, Fayard, Parîs, 2009

18 Vegotî di Gabriel Rot "La construcción del sinsentido" ["Sazkirina bêmaneyê"], *Le Monde diplomatique en español*, Buenos Aires, gulan 2011

19 Şahîdî di *Ni vieux ni traîtres [Ne pîr û ne jî xayîn]*, ji Piere Carles (2005)

20 Léon Festinger, Hank Riecken û Stanley Schachter, *L'Echec d'une prophétie [Têkçûna pêxemberîyekê]*, Presses universitaires de France, Parîs, 1993

21 Andrew Silke, "Holy Warriors… ", *heman berhem*, r. 111

22 Paddy Hillyard, "The *War on Terror:* Lessons from Ireland" ["Şerê *li dij terorê:* Dersên ji Îrlandayê", *European Civil Liberties Network*, 2005

23 Mario Moretti, *Brigate Rosse*, *heman berhem*

24 *Bnr.* "11-M. El relato", pêveka rojnameya *El País*, Madrîd, 8 tîrmeh 2007

25 Enérico García Concha, *Todos los días de la vida. Recuerdos de un militante del MIR Chileno [Hemû rojên jîyanê. Bîrhatinên mîlîtanekî MIR a Şîlîyê* Cuarto Propio, Santîago, 2010, r. 72

26 *Libération*, Parîs, 28 tebax 2004

Wergera ji fransî: Simko Destan

Trajedîya Osloyê

Wateyên mecazî û teşbîhî yên terorîstekî

Remi Nilsen *

Piştî trajedîya Osloyê, edîtorê versîyona norwêcî ya Le Monde diplomatique Remi Nilsen dipirse: Gelo di nav civaka norwêcî de tu tiştekî "tundrew" heye? Nivîsên Anders Behring Breivik gotinên wehşetnak ên beredayî yên zilamekî dîn nînin. Me ev tişt berê jî bihîstibûn.

Sê sal berîya niha, piştî ku li Fînlandîyayê zilamekî çekdar di dibistanekê de pênc kes kuştin, radyoya dewletê ya Fînladîyayê telefonî min kir. Wan ji min pirsîbû gelo bûyereke weha çima li Fînlandîyayê rû dabû, lê çima ne li Norwêcê, ji ber ku her du welat di warê çand, erdnîgarî û gelheyî de gelek wekî hev in. Wê demê ji bo min gelek dijwar bû ku ez bîra tiştekî weha bikim. Lê belê niha ez xwe di rewşa wan de dibînim û bi qasî wan jî matmayî me: Di civaka norwêcî de tiştekî "tundrew" heye? Gelo Norwêc civakeke sosyal demokrat e, ku gelek baş bi rê ve diçe û bi têgihên bawerî û yeksanî teşe girtiye?

Nûçeyên derbarê terorîstekî -ku êriş bir wekî ku wî xwe di gelek malperên Înternetê de wekî "muhafazakerê çandî" bi nav dikir- ku li pêşîya avahîya serokwezaretîya Norwêcê makîneyeke bombebarkirî teqandibû û li bajarekî nêzî Osloyê yê bi navê *Utøya* êrişî kombûna ciwanan kiribû û 76 kes kuştibûn, ji Norwêcê hatibû û vê nûçeyê Norwêc şok kir û kesî nedixwest bawer bike ku bûyereke weha li welatê wan pêk hatiye. Me tu caran guman nedikir ku tundrewên rastgir amade ne ku ji bo bawerîyên xwe bikevin nav liv û tevgeran. Gelo êrişker bi tenê zilamekî dîn e? Gurekî bi tenê ye, ku xwe bixwe radîkal kiriye? Û çima ciwanên endamê AUF, rêxistina ciwanan a Partîya Kedê ya Çepgir a Navendî ya ne-tundrew, qetl kirin?

Dibe ku em tu caran nikaribin bigihîjin bersiveke vekirî. Di warê tarîfkirinê de, kesekî ku ji mesafeyeke nêzîk de bi xwînsarî zarokan dikuje, psîkopat e. Lê dîsa jî, pirsa ku divê em ji xwe bikin ev e: Nîqaşeke giştî ya agresîf a siyasî, ku her ku diçe bilind dibe, çawa dikare rê li êrişeke weha bêrehm veke? Heger ev mecaz û kînaye bi wateyên xwe yên peyvî werin fam kirin, dê çi biqewime?

Yek ji taybetmendîyên siyaseta Îskandînavyayê, ku wê baş tarîf dike, ew e ku xelk ji pergala sosyal demokrat a heyî ewqas razî ye ku hemû partîyên siyasî jî vê pergalê dipejirînin, ku di nav wan de rastgir jî hene. *(Di destpêka vê salê de rastgiran dîyar kir ku di afirandina vê pergalê de ew jî bi qasî tevgera kedê xwedî risteke navendî ne.)* Rastgirên nîjadperest jî -nemaze yên li Danîmarkayê û herweha yên li Norwêc û Swêdê- ev pergal pejirand û ew, ne-yeksanîya ku her roj zêde dibe û ji alîyê globalîzasyona neolîberal ve hatiye afirandin, yan jî sanayîya malî ya çavbirçî na, lê belê koçberan wekî gefa herî mezin a li hember vê pergalê dibînin. Rastgirên lîberal jî bi îddîaya xwe ya roja qiyametê piştgirîya vê nihêrînê dikin û dibêjin sepandina vê pergalê ne mumkin e. (herçend rastî berevajîyê nîşan didin û hemû anket nîşan didin ku piranîya norwêcîyan razî ne ku pirtir bac bidin da ku pergala refahê ya welat bi rê ve biçe.)

Herçend Partîya Geşedanê jî (bi awayekî mecazî) fikra dagirkerîya misilmanan û komployeke li dij Ewropayê mezin dike jî, divê were gotin ku ew nîsbet bi *Demokratên Swêdê*, ku par di parlamentoya Swêdê de 20 kursî bi dest xistin, nermtir in. Serokê wan Jimmie Åkesson çendîn caran îslam ji *Şerê Cîhanê yê II.* û vir wekî mezintirîn gefa li dij Swêdê nirxand. Ev fikra gefxwarinê yan jî dagîrkerîyê li Danîmarkayê jî ji alîyê Partîya Gel a Danîmarkî ve tê bi lêv kirin. Ev partî, sêyemîn partîya mezin a welêt e (ku di hilbijartinên 2007ê de 13.8 dersedê dengan wergirt) û îddîa dike ku koçberên misilman "mezintirîn karesata neteweyî" ya dehan salan in. Ev partî herweha texsîr nake û bangawazîya ji bo têkoşîna li dij vê gefê dike, wekî tevgera berxwedanê ya danîmarkî ya dema Şerê Cîhanê yê II.

Dijminên sereke yê Breivik- û yên "muhafazakarên çandî" yên din -ne misilman bi xwe ne, ku ew rêz li hesta wan a hêzdar a nasnameyê digirin, lê belê dijminên wan ên sereke "Marksistên çandî" yên qels û "serpîrek" in, ku alîgirên fireçandîbûnê ne. Ev yek nîşan dide ka Breivik çima êrişî Partîya Kedê kir, lê ne mizgeftek yan cih û semboleke îslamî

Ev çend mînakên gelek nerm in ku nîşan didan ka ev gotinên nîjadperest ên aşkere çawa di siyasetên ewropî de bûne "normal": Wezîrên fransiz dibêjin hewce ye ku "nasnameya fransiz" were parastin; serokwezîrên Almanya û Brîtanyayê her du jî di destpêka îsal de diyar kir ku "fireçandîbûn têk çûye". Wan ji îddîaya bêbingeh a dijminên nepenî yên li dij bîyanîyan ku dibêje çandên cuda (an ku misilman û mesîhî) nikarin bi hev re bijîn pê ve tu argumaneke nû pêşkêş nekir. Tevgera Partîya Çay a amerîkî jî teqsîr nake ku Obama wekî Hîtler bi nav bike û teorîyên komployê yên derbarê Obama de belav dike. Di van teorîyên komployê de tê gotin ku Obama sîxurekî misilman e û dixwazin belgeya ji dayîkbûnê ya Obama bibînin. Heger xelk van gotinan, van metaforan wekî wateya wan a peyvî fam bikin, dê çi bibe?

Lê belê pirsîyar her dimîne: Çima Norwêc? Çima êrişeke nefretê ya bi vî rengî li welatekî aştîyane û ewle pêk hat, ku lê tengezarîyên civakî gelekî kêm in, hema bêje bêkarî qet nîne, û lê yeksanî serdest e û li gor raporên Neteweyên Yekgirtî, Norwêc baştirîn welat e ku mirov lê bijî.

Herçend li Norwêcê di warê deramed û çandê de cudahîyên çînî gelek hindik in jî, dîsa jî cudahîyek heye. Di deh yan bîst salên çûyî de çînên civakê guherîn û me dît ku hilbijêrên ji çîna karker dev ji Partîya Kedê ya sosyal demokrat berdan û deng dan Partîya Geşedanê ya populîst û dijminê bîyanîyan.

Sedema vê pevguherînê hîna jî razek e û gelek çepgiran hewl da ku "Koda Partîya Geşedanê" deşîfre bikin. Sedema ku herî zêde tê bi lêv kirin, profesyonelbûna Partîya Kedê an ku siyasetmedarên wan ji gel dûr ketine. Lê li alîyê din, Partîya Geşedanê pirtir "gelêrî" ye û xwe weha dîyar dikin. Populîst û derûdorên Rastgirên lîberal, ji destpêkirina guhnedanên li Danîmarka û piştî wê jî li Norwêcê li dij "zimanekî siyasî yê rêk û pêk" *(political correctness)* yên çepgiran dest bi "şerekî çandî" kir, ku Breivik di "manîfesto"ya xwe de gelek caran behsa vî zimanê siyasî dike. Hemû partîyên mezin ên li Norwecê xwe wekî sosyal demokrat bi nav dikin û herkes ji pergalê ewqas razî ye ku axaftineke dijberî pergalê dikare rê li karesateke hilbijartinan veke. Lê belê rastgirên lîberal û alîyên lîberaltir ên aborî yên Kedkaran hevbîr in ku pergala refahê di wadeyeke dirêj de ne mimkun e ku bi rê ve here. Helbet rastgirên lîberal jî pêşnîyar dikin ku xizmetên giştî werin arizî kirin û rastgirên populîst an ku Partîya Geşedanê sûc diavêje ser koçberan. Bi vî awayî serhevdeya nasnameya "gelêrî" û îzahatên hêsan ên ji bo pirsgirêkên komplîke yên aborî dikare sedema zêdebûna dijminahîya li dij bîyanîyan, ku her ku diçe zêdetir dibe, dîyar bike. Li vê yekê nijadperestîya li dij îslamê, ku piştî 9ê îlonê belav bû, zêde dibe. Lê dîsa jî ev hawîrdora dijminahîya li dij bîyanîyan bi tenê maxsûsê Norwêcê nîne. Dijminên sereke yê Breivik- û yên "muhafazakarên çandî" yên din, ne misilman bi xwe ne, ku ew rêz li hesta wan a hêzdar a nasnameyê digirin, lê belê dijminên wan ên sereke "Marksistên çandî" yên qels û "serpîrek" in, ku alîgirên fireçandîbûnê ne. Ev yek nîşan dide ka Breivik çima êrişî Partîya Kedê kir, lê ne mizgeftek yan cih û semboleke îslamî. Ev arguman ne nû ye û dikare li seranserî Ewropayê were dîtin: Çepgir, ji ber israra xwe ya li ser rabuhurîya emperyalîst a zilamê spî, zilamê spî riswa dikin. Lê yên din îddîa dikin ku rewş berevajî ye û tiştê ku çepgir dikin nîjadperestî ye. Her ji ber vê yekê Breivik bi israr dibêje ku ew li dij nîjadperestîyê ye.

Breivik li dij çepgirên navendî yên Norwêcê nefreteke gelek mezin nîşan dide. Li vê derê dînamîkeke civakî rista xwe dilîze, ku dijwar e bê tarîf kirin: Çima li cem zilamekî wekî wî, ku li rojavayê Osloyê di nav serwetmendîyê de mezin bûye, li dij siyaseta sereke nefreteke weha mezin peyda bibe? Bawer dikim ku di destê me de hîna jî têra xwe agahî nîne ku em bikaribin elementên dêrûnî ji elementên hawîrdora civakî û rewşa siyasî cuda bikin.

Li seranserî Ewropayê, em heman neyartîyê dibînin, ku li paş êrişa Breivik mebesteke siyasî heye

Li vê derê faktora "marksîst" nikare were paşguh kirin. Di çend salên çûyî de, lîberal rasgirên muhafazakar bi awayekî tund sûcên "komunîzm"ê (yên Stalîn û Pol Pot) bin xêz kirin û marksîzm û nazîzm wekî hev bi nav kirin. Argumana wan ew bû ku fikra guherîna civakî bi awayekî bêhemdî rê li rejîmên totalîter vedikin. Ev arguman gelek caran ji bo tawanbarkirina çepgiran hat bi kar anîn ku ew xwedî rojeveke nepenî ne. Mebest ew bû daxwaza çepgiran a ji bo civakeke adiltir û yeksantir were bertaraf kirin. Ev stratejî bû sedema xitimîna gotûbêjên siyasî yên li ser pêşdeçûna sosyo-ekonomîk a civakên me û gotûbêj êdî nema li ser parvekirina serweta neteweyî û anîna mirovan a li cem hev bû, lê belê veguherîn "şerên çandî".

Li seranserî Ewropayê, em heman neyartîyê dibînin, ku li paş êrişa Breivik mebesteke siyasî heye. Dijwar e ku mirov sedema tevgerîna wî ya weha tundrew peyda bike, lê belê di vê merheleya zû de tiştek heye ku em dikarin hîn bibin; ew jî ew e ku di qada giştî de normalîzebûna nîjadperestîyê û gotinên agresîf dikarin kesên bêzar radikalîze bikin. Rastgirên populer û dijiminên bîyanîyan divê ji ber van çalakîyên wehşetnak ên terorîzmê neyên tewanbar kirin. Çalakîyên bi vî rengî bi awayekî nerasterast berpirsîyarîyên me hemûyan dîyar dikin. Mecaz û teşbîh dikarin bi wateyên wan ên peyvî werin fam kirin. Ev yek ne pirsgirêkeke azadîya xwe derbirînê ye, lê belê jidilî û berpirsîyarîya gotarên siyasî ye.

* Edîtorê versîyona norwêcî ya
Le Monde diplomatique

Wergera ji îngilizî: Celîl Kaya

www.kurdishmonde.org

Li Amerîkayê medya, desthilat û pere yekbûyîna xwe temam dikin

Robert W. McChesney û John Nichols *

Li Keyatîya Yekbûyî, skandala ji ber kirinên şirketa Rupert Murdoch derketî, girêdanên nelirê yên navbera rojnamegerî, polîs û siyasetvanan aşkere kir. Li Dewletên Yekbûyî ku mîlyarder lê xwedîyên kanalên televîzyonê yên pir hejmar in, rola kompleks a medyayî-fînansî di jîyana sazûmanî de, piştî biryareke dadgeha bilind a ku sînorê razandinên şirketan ên di kampanyayên hilbijartinan de rakir, hîn zêde bûye.

Du hefteyên berî hilbijartinên nîvwekaletê yên mijdara 2010ê, weke sêhirbazekî *"li mirovê li pişt perdeyê hay nebin"* bibêje, **Karl Rove** yê kevnestratejê **George W. Bush** ê li ***Qesra Spî*** û lobîger, hewl dida ku meseleya esas binixumîne. Piştî ku serokkomar **Barack Obama** şêwirmendên komarxwaz bi jirêderxistina dengdanê mehkûm kiribû, ji ber ku ew ji bo berbijêrên xwe bi sed mîlyon dolaran ji fîrmayên navneteweyî û mîlyardarên muhafezeker distînin, kevneşêwirmend jî ji rojnamevanan re derbirî ku *"Obama yê bi awayekî behsa Odeya bazirganîyê, Ed Gillepsie* (1) *û min dike, hişê xwe xwariye. Jixwe, serokkomar çar hefteyên bihorî yên kampanyaya hilbijartinan ji bo vî tiştê piçûk û bê mane xerc kirine"*. (2)

Lê ev "tiştê piçûk û bê mane", di rastîyê de hêmanê biryardêr bû ji bo hilbijartina nîvwekaletê ya herî biha di dîroka Amerîkayê de, ku bi encama serkevtineke mezin a rastgiran bi dawî hat (3): Zeftkirina jîyana siyasî ya ji hêla sinifeke fînansî û medyayî ku ji hemû partî û berbijêran bi hêztir e. Ev bi tenê beşekî nû ya eşqa bêdawîn a navbera pere û iqtîdarê nîne, ev ji nû ve terîfkirinek siyasetê bi xwe ye ku bi lihevhatina du faktoran pêk hat: Sînorên hîbeyên hilbijartinî ji bo şirketan rabûn û çapemenîyê dev ji çavdêrîya kulîsên kampanyayan berda.

Encama wê jî pergaleke weha ye ku tê de, çembereke piçûk a şêwirmendan mîkdarên dînane kom dikin da ku dengdana xelkê ber bi mişterîyên xwe ve bikişînin. Ev *"kompleksa hilbijartinê ya pereyî-medyayî"* êdî kêm zêde bûye hêzeke nayê şikandin, ku ji çi cureyên rêgezan filitî û ji ber teslimîyeta çapemenîyê ji pêwîstîyên haydarîyê jî rizgar bû, û kanalên televîzyonê yên bazirganî - ku 2010ê 3 mîlyar dolar bi xêra reklamên siyasî wergirtine- bê navber jî dengê wê vedidin. Par, ji pêncî û sisê wîlayetên ku **Rove** û merivên wî tê de fînansmanên *"serbixwe"* yên ji fînansmanên reqîbên wan ên demokrat pir bilindtir, bi ser berbijêrên komarxwaz ên *Meclisa Nûneran* de dan rijandin, muhafezekaran pêncî û yek heb bi dest xistin. Qederê ji çar paran sisiyê komarxwazên ku îsal li Meclisê hatin hilbijartin -hin ji wan jî, berî ku dolar wan bidin nasîn bi temamî nenas bûn- ji wîlayetên weha derketin ku pereyê *Odeya Bazirganîyê* an yê *American crossorads, klûba Rove*, tê de diherikî.

Dengek bi dolarekê

Bi herifîna berxwedana rojnamegerîya serbixwe û rexnegir a demên berê re, hêza siyasî ya pereyan her ku diçe xurtir dibe. Berê, çapemenîyê hewl dida ku nirxandinên dengdaran ronî bike û bi vî rengî jî rîtma kampanyayên hilbijartinê dîyar dikir. Lê niha, aheng ya reklamgeran e. Kanalên televîzyonê hîn rola şefê orkestrayê bi ser xwe digrin, lê belê partîsyona ku ew lêdixin ji hêla elîtên aborî ve -yên ku êdî bi tenê bi alîkarîya encama dengdanê têr nabin, lê herweha dixwazin rûyê siyasetê û heta yê hikûmetê bi xwe jî biguherînin -tê honandin û pere dan. Eger li-hevhatina tevlîbûna pere û medyayan bê piştguhxistin an jî, ji vê jî xirabtir, eger bê xeyal kirin ku hêzên pêşverû wê bi serê we bikevin, rîsk heye ku dîyardeyên dengdana nîvwekaletê di hilbijartina serokkomarî ya 2012ê de hîn berfirehtir bibin.

Biryara *Dadgeha Bilind* a 21ê çîleya 2010ê ya ji bo doza ku komeleya muhafezekar *Citizens united* û Komîsyona hilbijartinê ya federal *(Federal Election Commission, FEC)* anî hember hev, xwedîya roleke esasî bû. Bi mafdardîtina muhafezekarên ku bi hincêta "azadîya derbirînê" dixwest fîlmeke li dij **Hîllary Clînton** biweşînin, dadgeran bi pênc rayan li dij çar, rêgeza ji sedsalekê ve ku riya bikaranîna hemû serkanîyan ji bo tesîrdana encaman li ber fîrmayên mezin digirt, pûç kir. Kesên exlaqî (komele, sendîka, şirketên ferdî, hwd.) niha xwedîyên heman mafê danasîna fikirên xwe yên kesên fîzîkî ne; ew dikarin ji bo derhênan û weşandina fîlm û reklamên siyasî jî hemû serkanîyên xwe bi kar bînin.

Biryara *Dadgeha Bilind* yekser bû sedema bertekên pirhejmar û bi heyecan. **Obama** *"serkevtineke mezin a ji bo şirketên navneteweyî yên petrolê, bankayên **Wall Streetê**, fîrmayên sîgorta yên ferdî û hemû komên berjewendîyên ferdî yên bi awayekî rojane hêzên xwe li Waşîngtonê bi kar tînin da ku dengê gelê amerîkî bifetisînin* (4)*"* tê de dît. Li gor damêzirênerê *National Voting Rights Institute*, **John Bonîfaz**, îmkana bikaranîna bê sînor a malîyeya giştî ji bo belavkirina fikirên wan ên siyasî ya ku ji şirketên navneteweyî re hat dan, wê wan bike *"xwedîyên rasteqîn ên demokrasîya me"*.

Jixwe, derdorên ticarî di cih de vê fersendê bi dest dixin. **Scott Reedê** şêwirmendê komarxwaz ê bi tecrube derdibire: *"Beşên ku pêşî ketine sahaya hilbijartinê, pîşesazîya xizmetên fînansî, pîşesazîya enerjetîk û pîşesazîya sîgortayên ferdî ne* (5)*"*. Kluba wî ya lobîgerîyê, *Commission on Hope*, *Growth and Opportunity,* deh mîlyon dolaran xerc dike da ku reklamên televîzyonê yên dij parlementerên demokrat li eyaletên kilît de bide weşandin. Li gor komeleya ***Media matters action network,*** xezîneya kesekî weke **Reed** dîsa jî li hember tevahîya fînansmanên ferdî *"xurde"* ye: Li cotmeha 2010ê, mehek berê tayfûna hilbijartinê ya komarxwaz, ji şêst komên lobîgerîyê bêhtir ji xwe 4 mîlyar dolar mesref kiribûn, ji bo ku sed û pêncî hezar reklaman bidin weşandin û e-peyamên propagandayê ji dengdaran re bidin hinartin. Ev xerckirina zêde ya serkanîyan ji tarîfên kampanyayê yên hilbijartina 2004ê bilindtir e, tevî ku wê demê li cem dengdanên meclîsî yên adetî (Meclisa Nûnêran û Senato), dengdaneke serokkomarî jî hebû.

Herçi demokrat, ew bi lez û bez ketin pêşbirkê da ku maksîmuma fonan li cem şirketên navneteweyî top bikin. Lê belê lîstik ne adil e. *"2010ê*, bi texmîna *Center for Media and Democracy* a ku li ser girêdanên hevalbend ên nav cîhana bazirganîyê û derdora siyasî radiweste, *hîbeyên komên berjewendîyan ji hilbijartina berê qet nebe pênc qat bilindtir bûn, û komên prokomarxwaz ji reqîbên xwe yên prodemokrat fonên heft caran bilindtir kom kirin"*.

Bi awayekî, ev çîrok bi qasî neteweya amerîkî kevin e. *"Divê xwedîyên welêt û hukumdarên wî yek bin* (6)*"*, Yek ji bavên damezrêner ê destûra bingehîn **John Jay** beriya bi du sed salan pêşniyar dikir.

Têkoşîna ji bo sazkirina pergaleke siyasî ya li ser esasê "serê kesekî dengek " -ne "serê dolarê dengek"- di ber dîroka Dewletên Yekbûyî re derbas dibe. *"Li vî welatî,* yan wê demokrasî hebe, yan jî *sermayeyeke mezin a di destê hindikahiya kesan a pir piçûk de, lê herdu jî bi hev re nabin"*, **Louis Brandeis** ê dadgerê *Dadgeha Bilind* berî şerê cîhanê yê duyemîn derdibirî.

Divê di navbera demokrasî û plutokrasîyê de tercîh bê kirin. Kompleksa pere-medyayî bergeheke hilbijartinê ya ji dawîya sedsala 19ê û vir de bêhtir zeftkirî saz dikin. (7) Bisporan ji xwe "vekêşaneke heyecanê" di hilbijartinên 2010ê de dît. Ma tiştekî ecêb tê de heye? Welatî tê gihîştin ku hîbeyên wan ên piçûk û ferdî û heta rayên wan jî, li hemberî şeteleya 4 mîlyar dolaran ne tiştek in. Lê belê, kesên ku vê pergalê didin meşandin ji sînîzm û tebatîya dengdaran sûdê werdigrin: Rûpela beşdarîya rekor a ciwanan di hilbijartinên 2008ê de -% 51 kesên ji 30 salî ciwantir çûbûn ser sindoqan (2000ê % 40 bû)- çiqas zû bê qulibandin, ew ê evqasî baş bibin, ji ber ku feydaya lawazbûna jîyana welatî ji wan re pir tê û operasyona wan a zeftkirina dewletê hêsan dike.



Fehmî Balayî: **Tofana yekem**, Akril li ser tuwalê, 70 x 50 cm

www.kurdishmedia.org

Berbijêrên ku teslîmî kompleksa hilbijartinê ya nû û medyayî-fînansî nabin, xwe didin ber rîska ne biserketinê. Tu kes ji ber têkçûna namzedên herî dilpaqij an jî bi awayê herî vekirî li dijî bertîlgirtinê di dengdanên mijdara 2010ê de ecêbgirtî nema, mîna senatorê **Wîsconsînê Russel Feingold**, sembolê baskê pêşverû yê partîya demokrat û pêşengê qanûnên sînorkirina xercên hilbijartinê, an jî weke **Michael Castle**, nunêrê Partîya Komarxwaz ê Delawareyê ku **Christine O'Donnell** a rûyê *Tea Party* di pêşhilbijartinan de ew têk biriye. Sala bê jî xweş xuya nake. **Robert Duncan** ê serokê *American crossroads* bi kêfxweşî dide zanîn: *"Me ala xwe di erdê de çikand û em ê bê guman 2012ê roleke mezin bileyizin"*. (8)

Pîşesazîya televîzyonê ji bo şirketên navneteweyî û şêwirmendên wan hevkareke biryardêr e. Sala bihurî, wê bi xêra reklama siyasî, serkanîya xwe ya nû, demsala hilbijartinê ya herî biqezenc a dîroka xwe dît. Jixwe, nêzîkî ji sê paran diduyên pereyê ji bo kampanyaya 2010ê xerckirî ketine bêrîka wê. Di salên 1990ê de, para reklamên siyasî di hatinên ji reklamê yên kanalên bazirganî de % 3 bû; îro, ev rêje gihîşt % 20ê. Rejî dilşa dibin: Li gor*Los Angeles Times*, bihayê herêmî yê reklameke sî saniyeyan ji 2000 dolaran di 2008ê de, gihîşte 5000 dolaran di 2010ê de.

Destûra derewkirinê

Hemû kanalên ticarî ji konsesîyoneke belaş istîfade dikin, ku dewlet li ber soza pêşkêşî wan dike *"xizmetkarîya berjewendîya giştî"* -wek mînak bi ronîkirina biryarên dengdaran. Lê belê, ev sî sal in ku bernameyên televîzyonê yên li ser kampanyayên hilbijartinê berjêr diçin. Li gor navenda lêkolînê **Norman Lear**, di zanîngeha Kalîfornîya başûr de, di sî deqîqeyên bernameyên televîzyonê yên dema hilbijartinan de, reklamên siyasî ji agahîyên siyasî pirtir in (9). "Agahî" jixwe peyveke mezin e, lewre ku rojnamevan pirî caran bi tenê reklamên berbijêran nîqaş dikin...

Xirabûn û nemana rojnamegerîya siyasî ne bi tenê para televîzyona bazirganî ye, herweha çapemenîya nivîskî jî ketiye ber vê boçûn û rewşê. Medyayên serbixwe li ber mirinê ne (10); rojname yek bi yek tên girtin û reporter û xebatkarên çapemenîyê bi deh hezaran bê kar dimînin -ji sisiyan yek rojnamevanê profesyonel ê amerîkî di deh salên dawîn de ji kar hatine avêtin, hejmara wan di sê salên bihurî de tenê, yanzdeh hezar e (11). Weşanên ku hê jî didomin, êdî nikarin toreke nûçegihanan li çarhêlên welêt fînanse bikin û carina jî dezgeheke wan li Waşîngtonê tuneye. Malperên nû yên agahîyê û li ser Înternetê karekî binirx dikin, lê ev ji bo tijîkirina kêmasîyên heyî têrî nake, bi taybetî ji ber ku modeleke aborî tuneye ku bikaribe anketên cidî bide dest pê kirin.

Guherînên mezin ên di warê fînansman û helwêsta medyayî ya kampanyayên hilbijartinê de çêdibin, li ser siyaseta amerîkî ya giştî xwedî bandoreke bi tehlûke ne. Ji teorîyên pirhejmar ên belavbûyî ku dixwazin têkçûna alîyê pêşverû di dengdanên 2010ê de şirove bikin, ecêb e ku hemû rola têkelbûna pere û medyayan a di lîstika hilbijartinê de zêde nagrin ber çavan.

Dîsa jî, tesbîtkirina awayê xebatê yê vê pergalê esas e, ji xeynî ji bo wan kesên weha difikirin ku demokrat jî dikarin hîbedarên bi qasî hevalên mîlyardar ên **Rove** bibînin û bi vî rengî bi ser bikevin. Lê belê eger ew ruhê xwe di ber de nedin, ji wan nayê ku kompleksa medyayî-fînansî bikin hevalbenda xwe: Projeyeke pêşverû ya rasteqîn qet nikare beza dolaran qezenc bike *(li jêr bixwînin)*.

Rove, **Reed** û hevkarên wan - serokê kêmahîya komarxwaz li Senatoyê, **Mitch McConnell**, û hevpîşeyê wî yê serokê Meclisa Nûneran, **John Boehner** jî di nav de - bê navber û dubare dibêjin ku pere ji bo demokrasîyê baş e û reklam jî *"raya giştî perwerde dike"*. Ev zimanê ***orwellî***, eynî fikira bûyî sedema rêzeke dirêj a biryarên muhafezekar li Dadgeha Bilind, ji doza Buckley li dij Valeo li 1976ê (12) heta biryara çîleya 2010ê, diparêze: Li Dewletên Yekbûyî, veqetandina pereyê ji bo armancên siyasî awayekî azadîya îfadeyê ye *("Money is speech")*.

Şîreta li berbijêran tê kirin, naguhere: Herdem fonan top bikin, Tiştekî ku mumkin e dilê hîbedarên muhtemel sil û sar bike, nekin û nebêjin.

Ev nihêrîn daweriviye nav tişta ji ber çapemenîyê mayî û ji ber vê yekê, şûna ku li ser bîlançoyê û bernameyên hilbijartî û berbijêran raweste, ew timî behsa pereyê ji hêla berbijêr, partî û komên berjewendîyan ve topkirî dike -kî li pêş dikeve û kî li paş maye?- Reklam niha bû serkanîya yekemîn a agahîyên siyasî û di rewşa herî baş de, nîqaş li dor nîvrastîyên ji konteksta xwe derxistî digere.

Di reklameke bo piştgirîya **Sharon Angle** ya namzeda komarxwaz a Nevadayê de, jinek senatorê berê Hary Reid bi *"erêkirina bikaranîna bacên welatîyan ji bo fînansmana Viagra, kesên ku li zarokên xwe dixin û cînayetkarên cinsî"* gunehbar dike. Di reklamekê de ku **David Vîtter**ê berbijêrê komarxwaz yê senatoyê li Louîsîanayê "erê kir", **Charles Melancon**ê senatorê demokrat ê berê, bi hêsankirina koçberîya derzagonî û astengkirina girtina bêkaxizan a ji hêla polîsî ve hat gunehbar kirin. Îmaj jî li gotinan zêde dibin: Di têleke sembola sînorê Dewletên Yekbûyî û Meksîkayê de qulek heye û li ser vê qulê, nivîsek diçirise: "ji vir têkevin". Meksîkî tê re dikevin û dema gihîştin erdê amerîkî, muzîk û agirbazî pêşwazîya wan dikin; parêzvanên **Melancon** jî çekeke mezin a pereyan didin wan, ji bo *"hemû bîyanîyên bêkaxiz"* û bi mîqdara bi qasî *"pareke mezin a bacên bacdaran"*. Lê belê, sînorê Louîsîanayê bi Meksîkayê re tuneye...

Ne weke reklamên ticarî, reklamên hilbijartinê dikarin bi awayekî vekirî derewan bikin. Sî sal berê, **Robert Spero**yê serokê ajansa ragihandinê ***Ogilvy & Mather***ê wê demê, ev istîsna weha rewa dikir û digot ku eger li ser namzedan bê ferz kirin ku eynî şert û mercên firoşkarên deterjanê bi cih bînin, Komîsyona Federal a Bazirganîyê ê neçar bimîne ku reklamên siyasî bi sextekarîyê mehkûm bike...

Redkirina "nîqaşên" televîzyonê

Ji ber ku jixwe awayê ragihandina raya giştî standine, di kampanyaya mijdara bihurî de, heta çend namzed jî biryareke weha da ku, weke **Angle**, daxwazên çapemenîyê bê bersiv bihêlin, an jî nîqaşeke bi reqîbê xwe re red bikin. Di demên berê de, berbijêran bi her awayî hewl didan ku digel senatorê berê yê dixwazin bikevin şûna wî, nîqaşekê li dar bixin. Lê aniha, senatorên weke **Alan Grayson**, nûnerê Florîdayê, li pey reqîbên xwe yên dewlemend baz didin. Dema ku **Feingold** rêzeke nîqaşên vekirî ji reqîbê xwe yê komarxwaz, mîlyardar **Ron Johnson**, xwest, ev kesê jixwe nenas û bê tecrubeya siyasî, pêşî dawet red kir –çawa ku daxwazên hevdîtinê jî red dike.

Johnson ji xwe haydar bû û hişt ku Odeya Bazirganîyê, ***American action network*** û rêxistinên din ên zengîn li şûna wî biaxivin û pêleke mezin a reklamên li dij senator **Feingold** pêşkêşî dengdaran bikin. Di dawîyê de, wî qebûl kir ku beşdarî forûmeke minasib ji bo seetên televîzyon herî pir tê temaşe kirin, lê çend kanalên herêmî nedixwestin nîqaşê bi zindî biweşînin. **Ed Garvey** ê kevneberbijêrê têkçûyî yê walîtîya ***Wîsconsîn***ê, vedibêje ka çawa wî televizyona xwe bire ser kanalên kabloyê da ku li vê nîqaşa pir hêvîkirî temaşe bike. Piştî ku bi ser neket, wî telefonî kanaleke herêmî kir û jê re hat gotin ku bila li ser Înternetê lê bigere. *"Weke welatîyekî*, ew dîyar dike, *ez neçar mam ku li reklaman temaşe bikim. Televîzyonê tu agahîyên rasteqîn nedan me. Min digot qey peywira wê xizmetkarîya berjewendîya giştî ye"*.

Ev mînak jî şanî me dide ka êrişa li hember kompleksa pereyî-medyayî divê çawa bê meşandin: Tesbîtkirina berpirsiyarîya aletên mezin ên ragihandinê û hîsedarên wan. Ji ber ku azadîya çapemenîyê di destûrê de parastî ye, dezgehên rêgezîyê peywirdarên parastina berjewendîya raya giştî ne *(*nivîsa *di çarçoveyê de bixwînin)*. Divê Komîsyona Federal a Ragihandinê (Federal Communications Commission, FCC) û FEC dîyar bikin ka çiqas pere xerc bû, kê û ji bo çi ev pere xerc kir û gelo kanalên televîzyonê -yên ku bi weşandina reklamên hilbijartinê pereyên mezin top dikin- li gor pîvanên berjewendîya giştî yên xwedîyên wan (di teorîyê de) bi wan ve girêdayî ne, tev digerin an na.

Eger komîsyonên lêpirsînê yên Senatoyê û Meclisa Nûneran lêpirsînên vekirî li ser kompleksa hilbijartinê ya pereyî-medyayî li dar bixin, **Peter DeFazioyê** nunêrê demokrat ê pir tiştan bibêje. Ev kesayetîya serbixwe ya ***Oregon***ê sala 2010ê bû hedefa kampanyayeke reklamê ya bi xezeb, ku reqîbekî nenas û grûbeke bandorê ya bê nav û deng bi cih anîbû. Weke dijêrişê, wî çend kamera li ziyareteke xanîyê bi luks ê îkameta grubê bû li Waşîngtonê dawet kirin. Bi vî awayî derket holê ku li piştkampanyayê, fîrmayeke razandinê ya bispora fonên spekulasyonê hebû: Ne bi dilê wan bû ku parlementerê demokrat ji *Wall Streetê* hesaban bixwaze.

* Yê pêşî rojnamevan e û yê din profesorê ragihandinê li zanîngeha Îllînois a Urbana Champaignê. Versîyoneke vê nivîsarê di heftaneya amerîkî The Nation (New York) de li 29ê mijdara 2010ê hat weşandin.

1 Gîllepsîe şêwirmendekî Bush bû, herweha damezirênerekî lobîyekê ye

2 Karl Rove, "Ez demokrasîyê naxim xeterê", *The Wall Street Journal*, New York, 14 cotmeh 2010

3 Partîya komarxwaz ji 435 kursîyên Meclisa Nûneran 242 bi dest xistin, yanî 63 bijartîyên ji encama wan a berê zêde

4 "Daxuyanîya Barack Obama", servîsa çapemenîyê ya Qesra Spî, Waşington D.C., 21 çile 2010

5 Vegotî di Peter H. Stone de, "Campaign cash: The independent fundraising gold rush since "Citizens united" ruling" [Pereyê kampanyayê: Beza ber bi zêrî ve ya top-kirina fonên serbixwe ji biryara "Citizens united" û vir de", Center for public integrity, Waşington D.C., cotmeh 2010

6 Ev gotineke wî ya bijarte ye. *Bnr.* William Jay, *The Life of John Jay [Jîyana John Jay]*, J. & J. Harper, New York, 1833

7 Bixwînin Howard Zinn, "Au temps des *barons voleurs*" ["Dema *baronên diz*"], *Le Monde diplomatique*, îlon 2002

8 Jim Rutenberg, "Conservative donor groups lay a base for 2012 elections" ["Komên hîbedarên muhafezekar ji bo hilbijartinên 2012ê bingehan deynin"], *The New York Times*, 31 cotmeh 2010

9 Martin Kaplan û Matthew Hale, "Local TV in the Los Angeles media market: Are stations serving the public interest?" ["Televîzyona herêmî li bazara medyayî ya Los Angelesê: Gelo stasyon xizmeta berjewendîya giştî dikin?"], Norman Lear Center û University of South California Ann Enberg School for Communications & Journalism, 11 adar 2010

10 *Bnr.* "The death and life of great american newspapers" ["Mirin û jîyana rojnameyên amerîkî yên mezin"], *The Nation*, New York, 6 nîsan 2009

11 Bixwînin Rodney Benson, "Trahison au Huffington Post" ["Xiyanet li Huffington Postê"], *Le Monde diplomatique*, gulan 2011

12 Biryara Buckley li dij Valeo, ku Dadgeha bilind bi yekdengî 30ê çîleya 1976ê daye, sînorên piranîya xercên hilbijartinê ya Kongre û serokkomar bi cih kiribûn, radike

Wergera ji fransî: Simko Destan

Pêşniyarên zêde radîkal?

Çare pir in ji bo kontrolkirina bandora pereyê li ser kampanyayên hilbijartinê û jîyana siyasî. ***Komîsyona Federal a Ragihandinê*** (Federal Communications Commission, FCC) dikare ji kanalên televîzyonê bixwaze ku mafê bersivdanê bidin hemû berbijêrên bûyî hedefa peyamên reklamê. Dema ku televîzyon bikeve ber lehîya reklama berpirsekî siyasî, divê her reqîbekî wî jî xwedîyê heman avantajê be. Bi vî awayî, namzedên zengîn wê ji mafê reklamdanê bêpar nemînin, lê êdî dê nikaribin mafên reqîbên xwe bin pê bikin: Eger herkes ji pêla reklaman sûdê werbigre û ew êdî serdestîya zengînan misoger neke, ev pêl wê kêm bibe. Bi xêra vê kêmbûnê, rojnamevan wê bikaribin bêhtir li ser kampanyayê bixwe rawestin. Herweha, divê kanal wextekî antenê yê bi qasî hev bidin hemû berbijêran û nîqaşên wan biweşînin. Gelo ev pêşniyar zêde radîkal xuya dikin? Piranîya wan ji xwe di versîyona pêşî ya zagona ***McCain - Feingold*** a 2002ê de cih digirt.

Ji bo ku li hember biryara Dadgeha Bilind a "***Citizens United*** " *(nivîsara li jor bixwînin)* çareyek bê dîtin, pêşnîyara zagonê ya nûnerê demokrat **Alan Grayson**, ku navê minasib "*Bila derdorên ticarî li karê xwe binihêrin*" lê hat kirin, Vê fikrê derdixe pêş; heke şirket pereyan dibexşînin û ev pere bi kêrî partî yan jî namzedên li ber dilê wan (tercîha wan) tê, hingê divê %500 bac ji vî pereyî were standin.

Grayson herweha pêşniyar dike ku ji hemû şirketan were xwestin ku mesrefên xwe yên ne ji bo danasandina milk an xizmetên xwe îlan bikin. Di dawîyê de, ew sînorkirineke hîbeyên şirketên ferdî yên xwedîyên peymanên dewletî derdixe pêş. Niha baş tê fêm kirin ka lobîyan çima 1.2 mîlyon dolar ji bo kampanyayeke aloz a reklaman li dij parlementerê Florîdayê razandin...

Dîsa jî, ji bo betalkirina biryara *Dadgeha Bilind*, çareya serkeftî ya tenê, guherandina destûrê ye. Stratejîya wê çi dibe bila bibe, lê divê **Barack Obama** û hevkarên wî bandora di zêdebûnê de ya kompleksa medyayî-fînansî li ser siyaseta amerîkî xuya bikin -ne ku çend gotinên şermîn ên eleqedarê hîbeyên şirketên bîyanî bibêjin, lê bi dengekî bilind ji ber xetera li ser demokrasîyê bang bikin. Di dema xwe de, serok **Dwight Eisenhower** weha li dij kompleksa leşkerî-pîşesazî derketibû. Wî weha gazî kiribû: "Divê em tu cara nehêlin ku giranîya vê hevpeymanîyê azadî an jî pêvajoyên demokrasîya me bixin bin talûkeyê". Rast e ku piştre ji ***Qesra Spî*** jî vediqetiya.

J. N. Û R.W. MCC.



Fehmî Balayî: **Perçebûn**, Boyaxa rûnî li ser tuwalê, 65 x 50 cm

Sê krîzên sîstemê

Denis Duclos *

Sê krîzên mezin ên ku dinya hejandin û ku dê tesîra wan kêm nebe, nebin mijarên biçûk ku ji ber çavên mirov wenda bibin: Şerpezebûna mezin a diravî ya di dawîya 2008ê de dest pê kir, qeza nukleer a ***Fukûşîmayê*** ya di 11yê adara 2011ê de pêk hat û krîza rejimê ya li gelek welatên ereb ku gel ji 14ê çileya paşîn a 2011ê vir de serî hildide.

Wiha dîyar e, ne mentiqî ye ku mirov van krîzan li ber hev bigire, ji ber ku ew di warên ji hev pir cuda de pêk hatine. Ya pêşî, ku xuya ye di cîhaneke virtuel (xeyalî) de pêk hatîye, pêwendîya wê bi milyaran dolarên tomarkirî re heye; ya diduyê ji ber qezayeke mezin a teknolojîya ku armanca wê berhênana enerjîyeke pir bû; ya sêyêm bi sedema serîhildaneke gel a bigirseyî li hemberî dîktatorîyên leşkerî derket holê. Li pey hev rêzkirina van felaketên xirab qet ne tiştekî baş e, ji ber ku yek dê bibe sedemê *"biserketina çav birçîtîyê"* (1) û ya din dê bibe encama malwêranîyeke xwezayî ya nepêşbînbar û ya dawî jî bi êşên ku dibin xwedîya maneya –hêvîya me jî ew e– "bihareke gelan".

Bi rastî sê xalên hevbeş ên van krîzan hene. Ew stûnên hesas ên sîstemê lawaz dikin

Lê tevî ku ev bûyer ji hev pir cihê ne jî, ji bo hesabjêpirsîna sîstema kapîtalîst a cîhanî digihên heman armancê. Û ev encam dikare nebe kaoseke giştî ku koroyeke bibandor a lanetxwendîyan, lê bêtir pêşketineke rizgarker, –"zarokanîneke dîrokê" îlan bike, ji bo ku mirov wê metafora klasîk a marksîzmê ji nû ve bigire destê xwe. Bi rastî sê xalên hevbeş ên van krîzan hene. Ew stûnên hesas ên sîstemê lawaz dikin: Bingeha wê ya enerjîk (vejenî), awayê wê yê rê liberxistina renca mirovî ya bi peran, pêdivîya wê ya misêwabûnê ya sîyasî, bi taybetî di derûdora navendên lîberal de lawaz dike. Ew di her yekê ji van qadan de heman şêwazê mubalexekirî nîşan didin ku mirovî dibin ber bi xeterên teknolojîk ên ne qebûlbar, rîskên diravî yên ku nayên kontrol kirin, yan jî giranîya otorîter ku neyê tehemul kirinê. Ew hêza meylên ku rikeberîyê bi parastina xwe re dikin derdixin holê: Dînamîkên xwezayî [hawîrdorî]; berxwedana mirovan ya tevahîya civatê ya ku koletîya wan bixwe ji karên qulopilo re, ji gendelî yan jî desthilatdarên jirêderketî red dike. Di serî de, rêzeşertine lihev yên ku jîyana mekanîzmaya serdest misoger dikin, tên tawanbar kirin: Bicihkirina mirovî û xwezayê di bin kontrolê de û bikaranîna wan li bazarên herî baş, ji bo hatinîya herî baş a mimkun. Bi vî awayî wesayeta diravî ya li ser aborîyê bi tenê derfeta belavbûna spekulasyonê nade: Ew bi mentiqê hatinîya pir, çalakîyên mirovî dixe rêzê. Aborîya vîrtuel wê gavê ji qadeke renca destî ya birêveberîyeke globalbûyî ya ku karibe cîyê kargeh û karkiran biguhere, aborîyên "bi pêşdikevin" ava bike, atolyeyên împaratorî û buroyên parzemînî pêk bîne, dest bavêje hilberîna wan, berxwarinîya giştî pêşbixe û wan bike pêdivîyên dest ji wan nabe, çi bigre ji armanca xwe dûr dikeve.

Her sektorek ber bi bikaranîneke tercîhkirî ve hatiye verê kirin...

Bi gotineke din, armanc diravîkirina bi mebesta îstîxdamkirina kadroyî –ya pir bi malîyet– a aborîyeke cîhanî ye. Ji niha ve, xistina wê ya krîzê di mezinbûna bêpîvan a îflasa birêveberîya giştî ya xebata mirovî di sîstemê de dîskalîfîye dike. Bêyî petrolê –heta ku bihayê wê sê caran bêtir ji yê 2000ê û deh caran bêtir ji yê 1990ê be jî–, me divê ku em hilberîna xwirekî ya cîhanî li çaran par ve bikin. Birêveberîya ku hîn jî enerjîyeke erzan tedarik dike, nikare dev ji tu jêderên xwe yên fosîlî berde; her sektorek ber bi bikaranîneke tercîhkirî ve hatiye verê kirin: Nukleer ber bi berhênana senaîyê ve hatîye şandin, warê serekî yê komira helandî û gazê germkirin e û petrol bi taybetî ji bo guhastina ji mîlyarekê bêtir erebeyan e (2). Li hember enerjîya nukleer derketin (û di destpêka 2022yê de, li Almanyayê dev jê tê berdan) dê ne bi tenê dersek be ji bo teşwîqkirina ji nû ve, berê bi kêmanî ji % 14ê hilberîna elektrîka cîhanî ber bi enerjîa bayî (eolien), tavî yan jî bîyogirseyî ve were dayîn, lê her wiha ew ê bibe êrişeke li hemberî beşekî girîng ê mekanîzmaya giştî ya cîhanî. Welhasil, bêyî binpêkirina azadîyên siyasî yên li hin welatên li dora demokrasîyên bazarê kombûyî yên xwedî wê îdiayê ne, ku dewletên hiqûqî ne, bi sedan mîlyon mirov duçarî cazîbeya bêfrên a bazara kar bûne û ji cîyê xwe yê jîyanê bi dûr ketine; ji ber nakokîyên civakî û ayînî heta îmkana globalbûneke hêmin a danûstendinan jî nemaye.

Van heman demokratan karibûn di saxlembûna rejiman de ku bi awayekî sergirtî weke "nerm" tên hesibandin, dîwarekî li hember nakokîyên cîhanî yên ku koka xwe di barûddanka Rojhilata Navîn de dibînin, pêk bîne. Ji ber vê yekê, xweferzkirinên rewa yên gelên serîhildêr, ne bi tenê derfeta hevkarîyeke jixweber (weke ya li Lîbyayê) derxistin holê, lê her weha jî metirsîyên mezin ên ku pir an hindik bi siyaseta ***li bendê be, tu yê bibînî***, hatine veşartin. Êdî ji bo kesî ne seyr e, ku ev sê krîz sazîyên herî bilind ên navneteweyî tînin ba hev û ku ew ji bo berjewendîyên xwe bi hev re dikevin rikeberîyê. Weke ku bisporê nukleerî yê kalîfornîyayî **Najmedin Meshkati** jî der barê qezaya ***Fukushimayê*** de dibêje: *"Ev yek ji tiştê ku welatek karibe bi rê ve bibe hîn wêdetir e. (...) Ev yek divîya ji alî Konseya Ewlekarîyê ya NY ve bihata gotûbêj kirin"*. (3) Ya diduyê, ev her sê kêmasîyên sîstemî nîşan didin ku her yek xwedî meyleke sîstemî ya ku "zorê" dide beza tiştan e: Zorlêkirina renca mirovî bi hêza diravî, zorlêkirina xwezayê bi hêza teknolojîyên xeternak, zorlêkirina jîyana siyasî bi riya kadrokirina girseyan, ku bi mentiqê taylorî (ku alî û berê sîvîl ê disiplîna leşkerî bû û hê jî wisa ye) hîn nehatine disîplîne kirin. Sektora diravî misogerîya dewletên lîberal bi kar tîne, ji bo ku ji deynên giştî îstifade bike, pêşkêşîya krêdîyê manîpule bike û li ser yên krêdîyê distînin peymanên yekalî, yan jî xefikên nediyar ferz bike. Heke em bên ser rejimên despot, ew xwezaya xwe li ser unîformaya xwe û di **kontrolên li ser riyan de**, di zindanên xwe yên siyasî û "rewşên awarte" de, di pozbilindîya çînên xwe yên xweperest ê çavbirçî de diyar dikin. Di encamê de, senaîya nukleer ji destpêkê de bi çandeke ewleyîyê ya ku çiqasî polîsî be ewinde jî leşkerî ye, dorê li xwe digire da ku tercîhên xwe li ser navê berjewendîyên neteweyî yên stratejîk li ser mirovan ferz bike, han dide. Di her sê rewşan de, dîsa, durûtî cîyê navgîna birêveberîya rojane digire. Piştî serpûşkirina xalên lawaz –nemumkinîya- "transfer"a deynan bêyî betalkirina deynên sîstema diravî, pêdivîya bi berdewamî sarkirina santraleke nukleer, bê îmkanîya rêlibergirtina nelihevîya gelan û hêzên ewlekarîyê–, mezinahîya zirarê bincil dikin.

Bernameya kirîna hiseyên bankayên li *Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê*, ya ku di çirîya pêşîn a 2008ê li kongreyê hatibû qebûl kirin, bi tenê 300 mîlyar dolar (û malîyeta dawîn a 25 milyarî ya mikelefên bacê), li ser hev yek ji dehê kêmtir a zîyana rastîn dike. Felaketa nukleer a *Fukûşîmayê* ji alî operator *Tepco*, karbidestên japonî û navneteweyî ve hate û her tê piçûk kirin, heta piştî ku hate gotin di mistewayê *Çernobilê* de ye jî, wan ev karê piçûkkirinê dewam kir. Bêyî ku em bahsa windakirinan, êşkenceyan, girtin û tahdeyîyên bi her awayî, çavgirtinên medyayî yên li rejimên mîrekî yan dîktatorîyên leşkerî-polîsî ku hîn jî weke "nerm" tên hesibandin, bikin. Ev tund û tûjî êdî sînorên xwe yên hevbeş diyar dikin. Pêşbînî nekirin, tevlîhevî, felcbûn, derketina holê û windabûna tevî piştrastkirinên bêbingeh û di çewtî û şaşîyan de israr kirin berdewam e. Bêkapasîteyîya fikirî ya weke sîyekê ligel van daxwazan tevî hemî astengan nîzamekê ferz dike:

Heke hûn senaîyeke nukleer ava bikin, hûn ê nikaribin berî wê *"amadeyîya xwe û qezayeke mezin"* bikin ku hûn (hisabê îhtîmalan ji bo xurtkirinê) îhtîmala herî piçûk înkar bikin. Bi vî awayî *Fransa û Brîtanya* jî "ceribandinên berxwedanê" yên santralên nukleer ên ewropî li hember êrişên teroristî red kirin. Di cîhana diravî de, heke bawerîya we bi bazarê (ku hûn tê de dijîn) bê, hûn ê nikaribin weke baloneke zorlêkirinê wê "biteqînin" -tevî wê jî piştî krîza mezin çi bigire bi sedsalekê û tam jî weke ku aborînas **John Kenneth Galbraith** texmîn kiribû (4). Heke em bên ser bijareyên dîktatorîyê, xuya ye wan nikaribûye heta deqeya dawîn jî xeyal bikin ku dê gerînekek di bin serayên wan de vebe û îmtiyazên wan, çi bi destê yên kolanê (ku bi çavekî baş li wan nedinêrîn) û çi jî bi cemidandina hebûna wan a bihesasîyet rêkirî derve, karibin ji destên wan biçin. Gava mirov bêtaqetîya çareserkirina pirsan dide ber çavan, wekhevîya krîza nukleer û ya diravî hin eşkeretir derdikeve holê. Weke ku **Paul Jorion** (5) jî dest nîşan dike, krîza diravî dişibe ya *Fukûşîmayê*: Di rewşekê de, mirov bêrawestan avê li navendên santrala qezazede dike ji bo wê sar bike; di ya din de jî, mirov bêhed û hisab pereyan davêje ji bo kuna balonê pîne bike ku piç nebe. Lê, her weke ev yek dê ji bo demeke dirêj zor be ku mirov veşêre û radeya deynkirinê ya ku mirov mecbûrî çêkirina perê pir bi krêdîyê çêdike, kêm bike heta wê ji holê rake, ji ber ku ev windakirin dê di encamê de her roj bi mukelefên bacê bê paqij kirin, dê ji bo demeke dirêj nemimkun be ku mirov belavbûna cîhanî (bi riya hewa, derya û di nav berhemên îxracê de) ya madeyê radyoaktîf ê demdirêj ên weke sezyûm 137, an jî yê pir jahrî, weke plutonîyumê stabîlîze bike; lewra derdikeve holê ku hawizên gelek reaktoran kun bûne. Her wiha mirov êdî nema dikare veşêre ku, ji herêmên valakirî hîn wêdetir, Japonya îro di bin tehdîdeke nû ya xirabûna reaktorên *Fukûşîmayê* de ye. Rewşa santralên din ên bi heman erdhejê hejîyane, radyoaktîvîteya kêm hesibandî ya ketiye nav axê, berhemên kiştûkalî, konteyner, û her wiha bi milyonan kesên din ên ku dê krîza aborî ya mezin tesîrê li wan bike û bêkarîya ji ber wê jî dê tesîra xwe lê bike.



Fehmî Balayî: **Payiza Berlinê**, Boyaxa rûnî li ser tuwalê 70 x 50 cm

Helbet zordarîya diravî, teknolojîk û polîsîye jî dê dom bikin

Helbet zordarîya diravî, teknolojîk û polîsîye jî dê dom bikin. Heta ew ji piştgirîyeke koma cîhanî jî îstifade dikin: Sazîyên nukleer ên li her dera dinyayê weke yên herî biheybet tên zanîn; hêza lobîyên diravî ya ku nahêle desthilata wan a siberojê tayin dike, lawaz bibe; piştgirîya dualî ya rejîmên despot *(mîrên sunî yên bi hev re dengê xwepêşanderên **Bahreynê** dan birîn an yekdestdarîyên leşkerî yên mexrebî ku di bin re piştgirîya mîralay **Muemer Kadafî** dikin)* û pênebawerîya sergirtî ya rojavayî bi ciwanên ereb. Tevî vê jî, stratejîya zorlêker a cîhanî êdî nema kare îdeolojîyeke global ango cîhanî pêk bîne. Ew êdî nema weke pêdivîyeke bêtalih xuya dike û çi be xwe bi wî rengî eşkere dike: Awayekî desthilatê yê keyfî, bixeter û hov ê di xizmeta sê cûre faktorên serdestîyê de, ku zerar in li azadîya xwedî karbûyinê, li îstifadekirina ji xwezayê bêyî xirakirina wê *(li gor matematiknas û bîyoaborînas **Nicholas Georgescu-Roegen**, armanca rastîn a aborîyê divê wiha be),* û li beşdarîya bêyî ku mirov bibe asteng di civaka siyasî ya mirovî de. Di çarîyana her sê krîzan de, ku ev heman alozîyên tund ên diravî, yên teknolojî û desthilatê derdikevin holê, bersiv jî wê gavê dê hêvîyeke bi *"sê rizgarîyan"* be: Ya renca mirovî ku êdî dê ne bi tenê cihguhertin, komkirina karê ya herî zêde û kanalize kirina wê be, lê pirrengkirina di nav mentiqekî xweserîyeke herî mezin de be; ya xwezaya ku êdî hefsar û êşkencê wê lazim nebe ji bo kareke pir mezin jê were bi dest xistin; û di dawîyê de ya beşdarîya azad a jîyana siyasî ya "gelê cîhanî ", ku bi temamî hem li dijî zora rejimên leşkerî (yan jî fetwayên tirsê dixin dilê mirovan yên her ku diçe li alema misilman tên red kirin) ye û hem jî li dijî belavbûna dijminatîya bîyanîyan e ku mirov his dike li Rojavaya ku malbata xwedêgiravî lîberalizmê ye, mezin dibe. Di van waran hemûyan de şerekî harîqulade yê fikrî, bi taybetî li ser tora Înternetê dibe. Ew her weke di warê enerjîyê de, di warê diravî de jî bi dijwarî xwe nîşan dide, ku hemî aktorên serekî divê bi van sirên likarbûna bazarê dest pê bikin, lê têvî vê kêmasîya xwe jî tebeqeyên herî berfireh de pêş dikevin. Pêşhîsa îhtîmaleke jîyana bi awayekî din, hîn hêsantir û hîn azadtir, êdî li hemberî bisporan dikare were parastin bêyî ku yekser weke paşdemayî û nerastbîn mirov henekê xwe bi wan bikin.

* Antropolog û birêveberê lêkolînê li Navenda Neteweyî ya Lêkolîna Zanyarî (CNRS), herwiha nivîskarê *Pourquoi tardons-nous tant à devenir écologistes? / Çima ji bo ku em bibin jîngehparêz ewende dereng dimînin?*, L'Harmattan, Paris, 2010.

1 Joseph Stiglitz, *Le triomphe de la cupidité / Serketina çavbirçîtîyê*, Les Liens qui libèrent, Paris, 2010

2 1,290 mîlyar tirimbêlên taybetî û bazirganî, ango li gor nirxandina Komeleya Carfreeyê ya di wexta xwe de, di çar salan de jimare duqat bûye

3 Kiyoshi Takenaka û Yoko Kubota, "Le Japon se résigne à une longue crise nucléaire / Japonya serê xwe li ber krîzeke nukleer a dirêj ditewîne", Reuters Online, 28ê adarê yê 2011ê

4 John Kenneth Galbraith, *La crise économique de 1929. Anatomie d'une catastrophe financière / Krîza aborî ya 1929ê. Anatomîya felaketeke diravî*, Petite bibliothèque Payot, Paris, 2008 [1955]

5 Li bloga wî ya nûçeyên diravî binêrin: www.pauljorion.com/blog/

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

ÇAND Û HUNER

Arjen Arî:
Dema ku dinivîsim, bêhemdê min çîya û dîmenên çîyayî têne ber çavên min

Çiya Mazî

Min bihîstibû Arjen Arî yekî pordirêj e û ji xwe hez dike. Min bi kêf di kovar û rojnameyan de helbestên wî dixwendin. Ne wêne hebû û ne kesî nivîskar dixwest bê naskirin. Di nîvê salên nodî de, di quncikên tarî û bi dizî me cara ewilî ji hevdû re li Amedê gotibû merheba.



Arjen Arî

Lê îro nivîskarek an helbestvanek an hunerhezek, here Amedê dê wî di quncika hunerê de, li sazî û dezgehên Kurdî bi hêsanî bibîne û lê guhdarî bike. Min xwest çend peyvên wî ên resen û bi melodî ji xwendevanên rojnameyê jî pêşkêş bikim. Min pirsî wî jî bersiv dan.

Birêz Arjen Arî, hûn helbestvaneki Kurd yên salên heyştê yî, ji çend heban yek in. Hema pêşî ez vê bipirsim, gelo tahma helbesta kurdî ya wan salan çawa bû, hê di bîra we de ye an na?

Ez ji çar pênç alîcenaban; Gurdilî, Dilbirîn, Rojen Barnas, Berken Bereh, Mem Ronga, Malmîsanij, yek im. Gurdilî û Dilbirîn di wan deman de 'Cegerxwîn'ên' bakûrî bûn. Bi taybet helbesta Gurdilî, ku helbesteke zexm û berketî bû- bi dengê Xwedajêrazî Şex Mizbeh di kasetê teyban de di nava gel de belav dibû.

Herdu hêjayan jî bi helbestên xwe ên şêwe-klasîk – çarîn û malik- ji hêlekê de êrîş dibirin hêz û dewlêtên ku Kurdistan parçe parçe kirine, li hêla din bi wêneke neteweyî, hişmendiyeke Kurdistanî li dijî bîrdoza çepgir, a Markisî derdiketin! Wekî bîr û bawerî û bîrdozê; wê demê helbesta kurdî ya heyî jî di bin per û baskên helbesta tirkî; helbesta helbestkarên mina Nazim, Hasan Huseyin, Enver Gokçe, Ahmed Arif û hwd. de şêwe digirt. Mayakovskî'yê ku Nazim rakêşabû ber bi siya helbesta xwe ve, çawa tesirekî helbestî li me- bi taybetî li min- helbestkarê kurd nekiribûya?! Dîsa jî, dikarim bêdudilî bibêjim helbesta wê dema helbesta qadan, ya meydanan bû. Sirûdî bû. Yanî qîr bû, hawar bû! Û her hêlên civakî, bi taybetî çîna karker û gundiyên bêmal û milk vedixwend qada şoreşê…

Di wan salan de xwendin û nivîsandina kurdî pir kêm bû, hema hema tunebû jî, heta zimanê Tirkî jî moda bû di nava xwendevanên dibistanan de. Gelo çawa ew hestên kurdewarî bi we re çêbû û çawa modayê hûn jî nexapand?

Karteka pergala pişaftker, wan deman- bi saya bîrdoza çep a kurdî jî- hilkişiyabû asta herî berz. Baş tê bîra min; ji ber xweş, xweşik û rewan-axaftina min a tirkî, hevalên min ji min re digotin, ' kuçuk burjuwa'!

Mafdar bûn. Mafdar bûn; ji ber ku hêj di salên xwendekariya min a liseyê de hilfa min li ser wêjeyê bû. Ê wêje jî wêjeya tirkî bû û di vî zimanê de helbestkarên ku bi hesanî dilê meriv dibijandin hebûn…Yek ji wan Ahmed Arîf bû, ku bi nêrîna min vî cuwanmêrî bi helbesta xwe neqebek, rêbuhêrkek vekir ji kurdên ku dixwestin bi tirkî binivîsin…

Li hêlekê helbesta kurdî a klasîk, li hêla din helbesta tirkî a navdar û ferewar…Min dikarî bi hêsanî di şêweya Nazim de helbestê lêbikim. Jixwe; ev şêwe mîna kirasekî ku tu ji zimanê kurdî re bifesilînî, bidûriyî bû.

Lê piştî gelek ceribandinên şêweyî; newa, ristesazî, hevahangî, harmoniya navxweyî ya di navbera rist û bendan de… dereng be jî min karî bi ser helbesta Arjen Arî ve bim.

Ev biserxwevebûn bû sedemê ku jihevderxistin û bihevvekirinekê derxim ji helbesta klasîk a kurdî û ya xwe. Heke îro hebim; bi nûyitiya xwe ya ku min hilgirtiye helbesta kurdî heme. Jixwe, her helbestkar di vê çarçoveyê de tê helsingandin. Û şopen karekter ên herdu helbestan– helbesta kurdî a kilasîk û a tirkî- biçuk bin jî di helbesta her helbestakarê wê serdemê de tê dîtin…

Helbet wekî gelek kesan, tiştê zanim hûn jî ji Cegerxwîn hez dikin, gelo bandora wî li gor wê demê hê jî tê bîra we?

Havîna 76ê dema ku çûm serdana wî-mala wî li Qamişlokê, li H'ara Xerbî bû- li rê, min bazareke hişk kir: Wî, eyba min, yanî şairtiya min dê eşkere nakira. Ji ber ku; ne cihê şanaziyê cihê fihêtê bû, merivekî mîna min di destpêka hçelbestê de tor û naşî, ji Cegerxwîn re bigota ez jî helbestê lêdikim.

Wê salê, li mala Kazim min dîwana wî 'Kîme ez' dît, û helbesta 'Kime ez' xwend.

Di nivîsa xwe ya bi navê ' Portre, Cegerxwîn: Yê ku peyv ji ezman daxist erdê ' de, min ev dadaş bi şêweçîrokî xist tevna nivîsê.

Ew, Cegerxwîn;hûtê helbesta kurdî bû. Bi qasî helbestakariya xwe rewşenbîr, siyasetgêr, nivîskar, kedkarê wêjeyê, feqîr, lê esilzade bû.

Min ji wî jî, ji helbesta wî jî pir hezkir. Vê hezê, hem bandora wî li ser min kêm kir, hem jî rê li ber helbestkariya min vekir.

Rêç, rêbaz û şêwaza Cegerxwîn li gor ku melayên li dû wî bi heman şêweyî nivîsandine, dişibe ekolekê hûn çi dibêjin? Dixwazim di vî warî de ji we jî tiştekî bibihîzim.

Ya rast, niha, di helbesta kurdî de destpêka şêweyên nû, bi şikenandina rista helbesta klasîk dest pê dike. Ev hewldan hê jî eyan û berdewam e. Lê ev hawe, ji helbesta Cegerxwîn pê ve, di hemû helbestkarên din de vediguhere şêweya 'tinazbixwekirinê'!

Şikestin an jî şikenandina ristê, belavkira peyvê li ruyê kaxizê; heke ne peydakira şêwêyeke xweser û



Çiya Mazî

helbesteke nû be, ew, dubarekirin e an, an jî xwe xapandine.

Helbesta klasîk bi formên mîna çarîn, pêncîne, malik/beyt û hwd… têne nivîsîn û navên wan curehelbestan jî pirayî xazel e, qasîde ye. Xazel û qesîde jî di nava xwe de li gor babetên xwe navinan li xwe dikin.

Helbesta klasîk piştî helbesta gelerî-çi li Rojhilat çi li Rojava- ekola herî temendirêj û kartêker(aktîf) e. Ew, bi qasî ku hildikişe dîwanê û navê 'helbesta dîwanê' li xwe dike; yên mîna Cegerxwîn radibin, wê dikin helbesta qada nû ya herkesî!

Di helbesta we de hertim nişanek Arjen Arî heye û bêhna xwezayê, bêhna çîya hertim xuya ye. Gelek kes jî dibêjin. Herwiha çîrokên we ku wekî mînak min dîtine jî ev xweza heye. Qey hûn pir ji xwezayê bi dûr ketin an we pir hesreta wê kişand?

Ez çîyayî me. Bi qasî dara berûyê çîyayî... û di demsala havînê de stêrên ku xilmaş xilmaş di zikê ezman de diteyisin. Ji lew, min ji çîya, ji hewaya çiyê, newaya çiyê, sihar û êvarên çiyê hez kir. Dema ku dinivîsim, bêhemdê min çîya û dîmenên çîyayî têne ber çavên min: Newal, guher, teht û zinarên biheybet; şunewarên kavil, guvvîna bê, heytîna şivanan, stiranên çivîkan. Her çîya welatek e. Ji ber çîyayîbûna xwe û çîyayên pir li ser vê axê, ez navekî din li vî welatî dikim: Kohistan! Yanî welatê çiyê.

Niha jî li bajarekî li ber keviya çîyayekî, çîyayê Qerejdaxê dijîm. Lê mixabin, dema ku serê xwe derdixim di paceyê re, çîya nabînim, darûdeviyan nabînim, guvîna bayê bakûr nabihizîm… Dibe ku ji ber vê hisretê, û sosretqewimînên ku sih sal e – belkî hezar sal e- rû didin li çîyayên vî welatî, min jî çîya wekî rastiyeke jiyana xwe û ya civatê, û wekî têgeh û sembolekê da rûniştandin di helbest, çîrok û nivîsên xwe de.

Jiyîn li Kurdistanê xweş be, mirin li çiyê xweş e. Çiya, ji tevahiya erda Xweda bêhtir nêzî Xweda ne.

Sifra Silîvî
a romannivîs Sebrî Silêvanî

Mihemed Çelkî *



Bergê pirtûka Sifra Silîvî

Di ser wan hemû astengên li ser ziman û çanda kurdî hatîne çespandin û bi qanûnan hatine muhir kirin jî, nivîskarên kurd bi zîrekî xwe avêtine meydana lîtraturê û tev çeq û bendên wê û bi şakarên afrandinên xwe xemilandine. Di lîteratura kurdî ya nûjen de romanê ciheke heja girtiye û Sebrî Silêvanî yek ji wan nivîskaran e, yên di salên 1998ê û vir ve bi zîrekîyeke yekta, hatiye nav qada lîteratura kurdî û bi taybetî nav şova romanê û yekem berhema wî Ava Mezin e, (li devera Behadînan rûbarê Dicle bi Ava Mezin bi nav dikin) di sala 2004ê ji alîyê Wezareta Rewşenbîrî li Silêmanîyê hatiye belav kirin.) Ava mezin romaneke sosyolojîk û dîrokî ye û serhatîya berxwedan û nexşê buhojandina kurdan ji alîyê desthilatdarên dagîrkerên Îraqê ve ye û bi alfabeya kurdî -latînî hatiye weşandin. Piştî vê romanê nivîskar Sebrî Silêvanî mîna dengekî taybet û sitîleke taybet bi xwe ve diafirîne û çendîn romanên gelek balkêş bi mijarên kêlîyên civakî, polîtîkî, felsefî, derûnî (pîskolojîk), dîrokî, olî, rengê hizir kirina mirovê kurd, çawanîya pêkhatina civaka kurdû rewişt û tîtalên wî, .. û pirsgirêka jinê; ku nivîskar vê pirsgirêkê bi lêgerîneke "li qetê dî" bi nav dike.

Sifra Silîvî navê romana Sebrî Silêvanî ya herî dawî ye. (Sifre, ew amûrê fafonî yê berfireh e yê ku li malan xwarinê li ser datînin).

Sebrî ji yek van nûjdaran e ku hêdî hêdî û bi kefteleft; ne sergermane û bi kurmancîyeke spehî di nav kêşeyan de digere.

Piştî xwendina romana Sifra Silîvî gurzeke pirsîyaran li ba xwendevan peyda dibe; astê hizirkirina wî/wê ya ji bo zanabûnê tîrtir dibe. Pelixandina hîmên wan "pîrozîyên" ku civakê dane me, yan hin mirovan ji xwe re û ji me re kirine "pîroz" , mîna şitlên spîndarên zivistanan şilfî tazî dike. Pirozî di vê romanê de û di gişt romanên Sebrî de, ne ew pîrozî ye ya ku kirêtî, kîndilî, zordarî, pozbilindî, olperestî, melatî, şêxatî, eşîrgerî, axatî.. nexêr belkî bilindragirtina mirovî ye û pêşxistina hizra çakîyê ye û turdana ne qencîyê ye; pîrozî bi tenê bo mirovan e û mirov pîroztirîn bûnewer e û neêşandina mirovî û neberjêrkirina wî, "pîrozîya pîrozîyê" ye û mirov dikare bê dudilî bibêje ku nivîskar Sebrî humanîstekî bijarte ye û keftîye ser rêça humanperestên cîhanî .

Tevna romanê li ser 10 pişkan û dumahîk, wesîyetname, sermedname û hişyarname hatiye parve kirin. Nivîskarî dumahîk xistiye pêşî û afirandinek entîke di warê nivîsînê de kiriye: Dumahîk kiriye kilîta dergehê ya hûnandina tevna romanê. Ev bixwe di warê nivîsînê de afirandineke nuh e, çunkî nivîskar gelek giringîyê didin destpêkê û wê dikin kilîta dergehê mijaran û xwendevanan amade dikin, ku hêdî hêdî mijaran hilişkêve û pirsgirêkan bi rehetî dane ber çavên xwendevanan; lê nivîskarê me kêlîyeke nuh bo vekirina dergehê mijaran ava kir û dibe ku piştî nivîskar Sebrî, ev awa, bibe mîna rêbazeke teze û bikeve ketwarîya nivîskarîya kurdî. Ji bilî vê afirandinê jî bi pirsiyarê dergeha romanê li xwendevanan vedike û bi janeke jandarî dinivîsîne:

"Ez westiyam!"
"Ez jî westiyam!" Rûp.4

Bi vê pirsiyarê dergehê vedike û her bi pirsiyarê dawîyê bi vê romanê tîne dema ku dinivîse:
"Ma ne seyr e ku niha xewa min dihêt? Ma ne seyr e jî ev mergesata navê wê jîyan e? Erê tu çawan tehemula wê dikî?" Rûp 168.

Pirsiyar nîşan e ji bo gumanê û heza lêgerîyanê li cem mirovî peyda dike. Û hingî pirsiyar bimînin, wê lêgerîyana li pey bersivan jî bimîne; bi rengek din nivîskar dixwaze bibêje; her tişt di vê jîyanê de cihê pirsiyarê ye û tiştê, rastîya rehayî tuneye û her pîrozîyek, rewiştek, tîtalek (adet), sincek, pirsên kesî, hêvî û daxwaz, bawerî, ol, kesên navdar ên dîrokî .. û hebûn û nebûn gişt gereke bikevin ber bêjinga pirs û gumanan: Û wê rastî xwe ji nav rih û perasûyên vê guman peydakirinê taze bikişîne.

Yek ji taybeymendîyên Sebrî Silêvanî ji nû ve hûnandina peyvan û ji wan jî afirandina hevokên watedar e. Weha watedar ku pendên pêşîyan, yan gotinên pêşîyan tînin bîra mirovî: Di beşa Sermednameyê de:
"Destbirayekî vekirî baştir e ji welatekî daxistî".
"Dîwarên bilind, dest û pirsiyaran bilind dikin",
"Maçek dikare welatekî ava bike, yan wêran bike",
"Zilam bê jin zarokek e",
"Ez newêrim binivim, çunkî ditirsim êdî hişyar nebim"
"Hêz di bêdengîyê de ye" û
"Ev der zulumata Şerqê ye".

Weke me got, ev roman ji pişkan û ji dûmahîk, sermedname, wesyetname û hişyarname pêk tê. Lehengên sereke yên romanê Hişyar û Sermedin û digel çend kesên din mîna Hemo û kurê Hişyarî Mehemed.

Her çende hejmara lehengên romanê kêm in jî, lê nivîskar Sebrî Silêvanî kariye bi hostatî xwendevanan vegerîne salên 1980yê: Xewn û hêvîyên gencên kurd ku taze pê danîne ser rêka jîyanê; xirecira salên giran û pirî şkestin û karesat. Sebrî Silêvanî pir bi hostatî danûstandin digel vê cirnexweşîya jîyanê kiriye; Çawa pirs û pirsîn dibin mezintirîn gunehên dunyayê û metirsiya ji navçûn û kuştinê jê dizê. Sermed û Hişyar du gencên wî demî ne û serpêhatîya wan serpêhatîya piranîya xortên kurd e. Sebrî Silêvanî tabloyeke wan rojan bi zîrekî reng kiriye; mirovê kurd çawa cîhanê fehm dike; bi kîjan çavan lê dinêre; çawa mirovê kurd li welatê xwe bîyanî ye û çawa "bîyanînane" li kêşe û pirsgirêkên civaka xwe têdigihe. Lê Silêvanî ev lengîya civaka me vegirtî, aniye ber pirs û gotûbêjîyê û bi wêrekî xwe li bilindahîyên pîroz daye û xwestiye em *mîna kurd* li van kêşe û pirsgirêkan bimeyzînîn. Hişyar û Sermed bûne sembolên çaksazîya civaka kurd; Hişyar li "qetê xwe" (li jinê) digere û Sermed bi pirs û gumanên xwe civaka me dişilqîne û mewdayê hizirkirinê asoya wê wêvetir û wêvetir dibe û ta digehe xala ji xwe gumankirinê ku mirovekî qenc e û di pêxemeta qencîyê da ye. Lê ev gumankirin mîna karekî rewa –û ne mîna ji rê derketin- bi me daye pejirandin; GUMAN ji bo têgihiştina rastîyê ye. RASTÎYÊ xwe di nav kevlojanê gumanê de melas daye û divê kesên şareza û mêrxas wê ji nav xirecira şêlo derxin. Mîna Dekart, gumanê serê nivîskarê me xistiye koteleka germ û ji vê kotelê Sifra Silîvî zaye.

* Rexnegirê roman

www.kurdiramani.com

Serbêje û Sercivatên Zargotin û Edebiyata Kurdî

Dengbêjên kurd

Salihê Kevirbirî

Dengbêjên ku em dikarin ji wan re bibêjin 'hozanên gel', hosteyên mezin ên peyvê bûn. Qêrînên trajedîyên ku di erdnîgarîya kurdan de bi têra xwe hene, ragihandin seranserê dinyayê. Êşê, hiznê, şadîyê ji dilekî baldar û çavkanîya hunermendîyeke xwezahî sefandin, ji nû ve afirandin û pêşkêşî dêhn û bala me kirin. Gund bi gund, kanî bi kanî, bajar bi bajar geriyan û peyva xweş a kurd û kurmancî anîn ziman. Geh agir berdan gurçik û kezeban, geh dil û hinav coşandin. Gotinên wan li axa bi bereket a welatê kurdan bûn tovên berxwedan û vejînê. Herçî kilamên ku li ser zimanê van dengbêjan heta îro hatine, bûn mejî û kozikên qesidîn û xweparastinê. Bêguman di van stran, kilam û serpêhatîyên bêhempa de, evîn, xiyanet, biratî, serhildan, sedaqetî, dostanî, gelacî, mêrxasî, tirsonekî, raperîn, serhildan û qetlîam hatin ser zar û zimanan. Di serdemên bê-zimanî û bê-zemanî de gihîştin hawara hêvîşikestîyan, carinan negihan keser û qêrîna wan.

'Kilam siwarîyekî bi bask e, serê sibê li vî welatî ye, berêvarkî li welatekî din!'

'Kilam siwarîyekî bi bask e, serê sibê li vî welatî ye, berêvarkî li welatekî din!' e dibêje, dengbêjê Deşta Xerzan. Car heye dibêje; 'Mêrikê xerîb kor e, siûda kuştîyan tuneye!' Li ku derê heye ev edeb û vegotina efsûnbaz û diltezîn? Serpêhatîyên karesatî, evînên pûr û pak, mêrxasîyên bêpayan, xiyanetên kambax…

Piranîya dengbêjan, dema ku kilamên xwe distrên, destên xwe dibin ber guhên xwe. Gelek kes vê yekê bikin jî, di rastîya xwe de kêm ji wan kesan sedema vê yekê dizanin. Ev teknîkeke dengbêjîyê ye. Destê ku diçe ser guhê dengbêj, peywira monîtoreke tekûz hildigire ser xwe. Bi saya vê teknîkê, kontrola dengê xwe dikin.

Sewta Serî-Sewta Qirikê

Dengbêjekî/a ku bi sewta qirikê kilam û stranan distire, wê piştî demekê ji deng bikeve û heta kilamên ku dibêje ji bîr bike. Lê belê dengbêjên ku bi sewta serî distrên, digel wextên dûredirêj hê jî dikarin dengê xwe biparêzin û tu car kilamên xwe ji bîr nakin. Evdalê Zeynikê, Şêx Silê, Reşo, Kawis Axa, Mihemed Arifê Cizrawî, Hesen Axayê Cizrawî, Karapetê Xaço, Şakiro, Salihê Bênatî, Hiseynoyê Hingilosîyê Muşî, Zahiro û Salihê Qubînê ku bi vê taybetmendîyê kilam û stranên xwe bi cih tînin, her yek bi hunera xwe bûye hostayek.

Taybetmendîyeke din a dengbêjan 'xulxulandin' e. Ev taybetmendî jî piştî banga ku jê re 'hawînî' tê gotin ku piştî bendên kilamekê tê gotin, tê bi kar anîn.

Homerosê Kurdan: Evdalê Zeynikê

Deng û tesîra cografya ango erdnîgarîyê. Bêguman li ser deng, tesîra cografyayê wekî rastîyeke zanistî tê pejirandin. Dengê kesên ji deştan bin, naziktir û nermtir e. Tîzbûna dengê wan zêde tuneye. Lê dengê çîyayîyan tîz û berz e. Bi gotineke din yên çîyayî çavkanî û jêderên girîng ên dengê 'dawûdî' ne.

Heke dengbêjî kevneşopîyek e, helbet dibistan û zanîngeha vê kevneşopîyê xwe dispêre Evdalê Zeynikê. Evdal badilhewa nebûye "Homerosê Kurdan." Em behsa dengekî wisa dikin ku gava tê bihîstin, quling li dorê hildifirin û diçin û tên. Ji ber vê yekê ye ku Bavê Temo û Dengbêjê Surmelî Memed Paşa rêber û rêzanê dengbêjî û kilambêjîya kurdî ye. Ew ne tenê şahînşahê kilambêjîya Serhedê ye, her wiha ew li seranserê welatên ku kurd lê dijîn, bûye dermanê hemû kul û derdan.

Her dengbêj stranbêj e, her stranbêj ne dengbêj e!

Li hêla din her dengbêj dikare bibe stranbêj, lê belê her stranbêj nikare bibe dengbêj. Berhemên hunera dengbêjîyê ne rîtmîk in. Divê xwedî 'lengê' bin. Naveroka perçeya ku tê strandin girîng e; divê li ser qehremanî be û bi şêweya destanî be.

Taybetmendîyeke din a dengbêjan ev e ku hunerên xwe bê amûr pêk tînin. Gelo pêwist e dengbêj kilamên xwe hey hey bê amûr bisitirin? Ev ne pêwistîyeke wisa ye ku em bikarin diyar bikin. Ev li gor tercîha dengbêj bixwe ye. Bes divê ev rastî jî neyê ji bîr kirin ku dengbêjîya bê amûr kevneşopîyek e û girîng e ku ev kevneşopî winda nebe.

Girîngtirîn hîm û kanîya hunera dengbêjîyê herêma Serhedê û mintiqeya Mûş-Melezgîr-Agirî ye. Gelek kurdên ku neçar mane û sirgunî herêma Qefqasyayê ango Êrîvan, Tiflîs, Abovyan, Oktobiryan, Elegez, Talîn, Gelto û Heko heta Moskova û Sibîryaya bûne, ji Serhedê çûne wan deran. Helbet di nav wan kurdan de gelek dengbêj jî hebûn.

Herweha em dikarin dengbêjên ku em ji wan re dibêjên 'dengbêjên xas' bikin du beş: Dengbêjên afirîner û yên dewamker.

Şakiro, Reso, Şeroyê Biro, Mistefayê Xelê Xeyran, Ferzê, Karapêtê Xaço, Hiseynoyê Orginosîyê Mûşî, Zahiro, Salihê Bênatî, Teyîboyê Siertî, Salihê Qubînî û Feyzoyê Rizo çend navên girîng ên şopîner û berdewamkerê kevneşopîya dengbêjîya Evdalê Zeynikê ne.

Jîyan bi kurdî xweş e!


Şakirê Biçûk


Şakiro


Şemdîn


Şeroyê Biro


Arif


Baqîyê Xido


Bekirê Alûtî


Cahîdoyê Hiseynê Mûşî


Cemîl Horo


Ehmedê Bêrtî


Fadilê Kufragî


Hiseynê Farî


Hiseynê Mûşî


Hiseynê Omerî


Karapetê Xaço


Kazo


Mahmûd Qizil


Marûf


Metîn


Mihemed Reşîd


Mihemedê Canşah


Miradko


Necmedînê Dêrikî


Aydîn


Reso


Salihê Qubînî


Seydo


Sidiqê Bozo


Silo Qiz


Zulkufê Qado

Naverok

TEBAX 2011

"Bihara ereban" û Sûrîye
Dr. Kemal Sîdo
▶ R. 1

Berdewamî yan jî veguherîna siyaseta derve ya tirkan?
Dr. Gülistan Gürbey
▶ R. 1

Şantaja li Waşîngtonê
Serge Halimi
▶ R. 2

JI ÇAPEMENÎYÊ
▶ R. 2

Li Sûrîyeyê rojên dijwar
Alain Gresh
▶ R. 5

Peyvên Întîfadaya Sûrîyeyê
Zénobie
▶ R. 6

Kalkûta, xeyala zêdetir çirisînê dike
Cédric Gouverneur
▶ R. 7

Herdû Marakeş
Allan Popelard û Paul Vannier
▶ R. 8

Meseleya Karaçîyê:
"Gendelîya li dilê Komarê"
Roselyne Rochereau
▶ R. 9

Nakokîyên Şoreşa Bolîvyayê
Alvaro García Linera
▶ R. 10

Kurdistan: Pirsgirêkeke bêhempa
Christiane More
▶ R. 12

Lêgerîna dîplomasîyeke herêmî
François Georgeon
▶ R. 13

Dij-Ronahiyên îroj
Zeev Sternhell
▶ R. 14

Perwerdeya ewropayî ya di serdema qabiliyetan de
Nico Hirtt
▶ R. 15

Di laboratuwara ekolo-bûrjûwaziyê de
Olivier Cyran
▶ R. 16

Li ser riya dijwarîya têkoşîna çekdarî
Laurent Bonelli
▶ R. 18

Wateyên mecazî û teşbîhî yên terorîstekî
Remi Nilsen
▶ R. 19

Li Amerîkayê medya, desthilat û pere yekbûyîna xwe temam dikin
Robert W. McChesney û John Nichols
▶ R. 20

Sê krîzên sîstemê
Denis Duclos
▶ R. 22

ÇAND Û HUNER
▶ R. 23

Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê:
Postcode

Bajar:
City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)
Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB